
Şairê Kurda yê Efsanevi

# EVDALÊ ZEYNIKÊ



de Paris

## Ahmet Aras

Weşanên DENG

Institut kurde de Paris

LIV. K.L. 2603
26/06/2017
720 ARA EVD

Institut kurde de Paris

Weşanên DENG

**Weşanên DENG**
**(DENG Yayınları)** **:** 33
**Çapa Yekem**
**(Birinci Baskı)** **:** Çıriya Paşin / KASIM 1996
Istenbol

Institut kurde de Paris

**Navnişan û Ciyê Bırêvebırınê**
**(Yönetim Yeri ve Yazışma Adresi)**
EVİN TURİZM İNŞAAT VE YAYINCILIK
TİCARET LİMİTED ŞİRKETİ
Atatürk Bulvarı Emlak Bankası Apt. B. Blok
No: 146 Kat: 7 Daire: 28 Aksaray-İSTANBUL
**Telefon:** 0 (212) 513 63 25 **Fax:** 0 (212) 513 63 26

**Wêneyê qapaxê û yên hundır** **:** Arif Sevinç
**Çap (Baskı)** **:** Yön Matbaası
**Cıld (Ciltleme)** **:** Umut Ciltevi

Ahmet Aras

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# Şaırê Kurda yê Efsanevi
# EVDALÊ ZEYNIKÊ

Institut kurde de Paris

Weşanên DENG

# Pêşgotına Weşanxanê

Dı jiyana Kurda da, zargotın ciyeki gıring dıgre. Pirê zargotınan ji, eşkereye ku, dengbêj û şaırên Kurda nın. Dı nav van dengbêj û şaıran da yê bı nav û deng ji, bê guman Evdalê Zeynıkê ye û ciyeki wi yê taybeti dı nav lêkolinvan û nıviskaran da heye.

Evdal dı nav Kurda da weki efsaneke ye. Lı çar dorên Kurdıstanê da ew bı şıirên xwe va tê zanin; bı sedan dengbêj şıirên Evdal dıstırên. Tesira wi ya lı ser jiyana Kurda, jı navberê ewqas sal ji bıhuriye, hê ji berdewam e. Bı taybet lı gundan çı şevên Kurda tuneye ku, bê Evdal derbas bıbe... Lê lı ser jiyana Evdal hê ji gelek tıştên jı hev cuda tên gotın; herkesek Evdal bı gor xwe şırove dıke. Her usa, şıirên Evdal jı ber ku dev bı dev geryaye; her yek jı vana lı gor devoka hereman ji guheriye; hınek şıirên wi heta bı 12-13 waryantan ji hatye gotın. Merıv dıkare gotına dirokzanê Rus B. Nikitin, wek nımûne nişan bıde: Nikitin dı kıtêba xwe ya “Kürtler”ê da behsa gelek waryantên şıirên Evdalê Zeynıkê dıke û dıbêje: “12 şıirên Evdalê Zeynıkê dı nav xelkê da dıhat strandın.” Lê ewê ku Nikitin wek 12 şıir behs dıke, rasti ew ji waryantê 2 şıirên Evdal ın.

Lêkolin û xebata berhevkırına dokumentên ev kıtêba, dı sala 1966'a da destpê kırye û jı sala 1966'a heta nıha Ahmet Aras bı dehan dengbêj, nıviskar û şairên Kurda ra xeberdaye û kıtêbên ku behsa Evdal lê hatiye kırın, lêkoliyaye. Nıviskar û lêkolinvan Ahmet Aras dı vê xebata xwe ya keda si salan da, gelek tıştên ku lı ser Evdal nayê zanin, dınıvisine.

Diyar e ku, ev xebata gıranbıha ya Ahmet Aras, bo edebiyata Kurdi hızmeteki mezın e. Merıv dıkare bıbêje ku, Ahmet Aras, bı neslên dawi re xeber daye û nehıştıye ku şaırêki Kurda yeki dın ji wenda bıbe.

Hêviya me ew e ku, ev klasika Kurda dı kıtêbxaneyên me da ciyeki bı qedr bıgre.

*Weşanên Deng / Çıriya Pêşin 1996*

Institut kurde de Paris

# Beşa I

## Ez çawa lê geryam

Dı dema bıçûktiya mın da, dı şevên zıvıstanan da gundi dı odên malmezınên gund da kom dıbûn; dengbêj, çirokbêj û bıllurvan guhdari dıkırın. Dı wan cıvinan da, hemmû çirokbêj û dengbêjan qala Evdalê Zeynıkê dıkır. Mın ji bı hewes ew guhdari dıkırın.

Kılamên Evdalê Zeynıkê yên ku Zıbêtê Emo dıstıran, bıllura Mıhemedê Lûvijen û gotınên çirokbêjên dınêna hela hê dı bira mın da ne. Lê wana bı awayeki usa qala Evdal dıkır, jı merıv wetrê Evdal hezar sal berê hatye dınyayê û çûye. Merıv dıgo qey, wi dı zemanê hût û dêwan da, dı zemanê "padişahên periyan" da jiyana xwe derbas kırye. Ango, ew tıştên ku dı derheqê wi da dıhatın gotın, ew bı xwe weki efsaneyan bû.

Institut kurde de Paris

Paşê ez ku çûnı ciyên dûr û dereke, mın dit ku lı wan deran ji mina hêla me qala Evdal tê kırın. Bı pırsa kurt, herçi ciyên ku Kurd lê hebûn, efsaneyên lı ser navê Evdal ji dıhatın gotın.

Wê çaxê mın ji minani gellek kesan jiyana Evdal meraq dıkır.

Paşê dı payiza 1961'a da lı Erzurumê, ez bı Evdıla Begê Suleyman Begê ra hevnas bûm. Evdıla Beg jı gundê Intabê Bado bû û salên wi lı ser heyştêyi bûn. Ew dı mesela 55'an da lı Erzurumê sırgûn bû. Car-cara ez dıçûm ditına wi û me xeberdıda. Rojeki wi dı nav xeberdana xwe da qala Evdalê Zeynıkê kır. Minani ku merıv qala naseki xwe bıke. Mın jê pırs kır, got: "Apo, tu minani ku qala naseki xwe dıki. Ewê ku tu dıbêji, ew Evdalê Zeynıkê ye?"

Evdıla Begê got: "Belê, hema ew bı xwe ye."

Mın got: "Çawa?"

Ewi got: "Ez 17-18 sali bûm. Evdal hatıbû cem apê mınê Evdılmecit Begê. Salên wi nêziki sedi bûn. Mın pê ra xeberda. Rojeki ez û wi, em bı siyari çûne gundeki, me bı hevra rêwiti ji kır."

Bı wê gotına wi ra êdi wê demê çı hate bira mın, mın jê pırsi û ewi bersiv da. Evla Begê ji minani herkesi, mesela korbûna Evdal û qulıngê wi yê baskşıkesti, leca wi û Şêx Sılê, leca wi û Gula Fılle û dengbêjiya wi ya lı cem Surmeli Memed Paşa bıhistıbû, lê zêdetır tıştek nızanıbû.

Lê Evdıla Begê mıfte dabû destê mın. Lı gor gotına wi, Evdal dı serê sedsala me da mırıbû. Wê demê jı mın ra bawerı çêbû ku, merıvên ku Evdal ditine, dengbejên ku jê kılam guhdari kırıne henın, ez ku pırs kım, lê bıgerım, ezê wana bıbinım û jiyana Evdal derxıme ronkayiyê.

Jı wê rojê şûnda êdi ez ku rasti dengbêjeki, yan ji merıveki bı emır dıhatım, mın pırsa Evdal jê dıkır. Hetani sala

Institut kurde de Paris

1966'a mın vır da-wê da pırs kır, mın jı hınek dengbêjan çend kılamên wi hıldan.

Serê havina 1966'a da ezê derketama gerê. Ezê lı kêşa Elajgırê, Qerekılısê, Intabê, Mılazgırê, Xınûs û Tekmanê bıgeryama; mınê lı wan deran pırsiyari bıkıra. Lı gor salıxê salıxdana, Evdal jiyana xwe lı wan kêşan derbas kırıbû. Ez ku lı hespê xwe siyar bûm, berbe hêla Xınûsê çûm, dı rê da rasti camêreki hatım. Ewi jı mın ra got: "Tu here Çata Mılazgırê cem Melle Şekır. Ewê jı te ra salıx bıde."

Mın rêya xwe guherand, ez çûme Çatê. Melle Şekır merıveki zana û camer bû. Dema ku mın daxwaza xwe jê ra got, ew pır kêfxweş bû. Jı mın ra got: "Tu ser seran ser çavan hatiyi û rast hatiyi. Mın hım Evdal dit û hım jı pê ra cinarti kır, ez û wi, em miratxurê hev ın. Tu were rûnê, apê te yê jı te ra hemmû tışti bêje."

Melle Şekır 77 sali bû. Ez wê şevê lı wır mam û ewi hetani roja dınê dı derheqê Evdal da jı mın ra qıse kır. Melle Şekır got: "Tu here Dıgnûgê û Cemalverdiyê Intabê, Sıloyê Gulê û Bedihê Cemalverdi kılamên wi dızanın, wana bıbine!"

Ez jı wır rabûm, çûme Dıgnûgê û lı medresa Melle Mıhemed Sadıq bûme mêvan. Hevnasya mın û Seyda hebû. Seyda hıneki qıl-qıli û got: "Bıra sedemê hatına te neyê bıhistın, Sofi Sılo bıra sıl nebe, ew bı xwe ku hate cem me, bı nermi jê pırske!"

Wê rojê Sofi Sılo berbe medresê nehat. Em hetani roja dın lı hêvya wi man. Roja dın, pışti danê esrê hat. Melle Mıhemed Sadıq got: "Sofi, ev bıradera hatıye ku jı te kılamên Evdalê Zeynıkê hılde, jı kerema xwe, tu zaninên xwe jê ra bêje!"

Sofi Sılo xwe avête nezanyê, lı ber me asê bû, me kır û nekır kelimek jı devê wi dernexıst. Sofi Sılo usa vecınıqi bû, usa tırsiya bû, herweki şeytan bı pêsira wi gırtıbû, imana wi

Institut kurde de Paris

jê dıxwast.

Ez jı wır bı rê ketım çûme Qanciya, malên nebyên Evdal lı wır bûn. Nebyê Evdal ê pıçûk Zeynel lı gund bû, mın bı wi ra xeberda. Ewi mexberê kalkê xwe rayi mın da, me fotografên mexber ji kışandın.

Paşê ez jı wır çûm Delielo. Nebyê Evdal yê mezın Emer lı wır bû. Emer kalkê xwe ditıbû û kılam û meqamên wi jê guhdari kırıbûn. Emer wê demê 65 sali bû û bı xwe ji dengbêj bû. Lı gor gotına Emer, kalkê wi saleki, yan ji sal û niveki berya şerê Hemûdunyayê Yekemin mırıbû û sed û deh sal emır kırıbû. Wexta ku kalkê wi mıriye, ew 12-13 sali bûye.

Mın sê seeta bı Emer ra qıse kır. Ewi derheqê kalkê xwe da gellek tışt jı mın ra gotın. Emer kılamên kalkê xwe baş dızanıbû, ewi gelek kılam ji jı mın ra gotın.

Pışti xeberdana mın û Emer, êdi mın dızanıbû ku kılam û meqamên Evdal kijanın, kijan dengbêj wan kılaman dıbêjın, wan dengbêjên ku destanan dıbêjın ki nın.

Ez, jı 1966'an hetani 1968'a lı Serhedê gund bı gund geryam. Ez çûm Elajgırê, mın merıvên mala Surmeli Memed Paşa ditın. Mın nebiki Surmeli Memed Paşa û kurê nebiki wi ditın. Kurê nebyê Memed Paşa Selahattin Beg, reisê Belediya Elajgırê bû. Nebyê Memed Paşa Şakır Beg (Ş. Özmen) 78 sali bû û ewi Evdal ditıbû.

Ez çûme Cemalverdi ji, ew gundê ku Evdal lê hatiye dunê. Gund dı navbera Tutax û Patnosê da, dı nav şaxeke quntara Çiyayê Qetewin da bû. Lı gor salıxan, Bêdihê Cemalvêrdi, hım Evdal ditıbû û hım ji kılam û meqamên xwe jı wi gırtibû. Ew ji dı wexta xwe da dengbêjeki bı nav û deng bûye. Ez, lı Cemalvêrdi bûm mêvanê Koroxli Begê (K. Öztürk). Koroxli Begê merıvek şand, Bedih da anin. Bedih 92 sali bû, çavên wi kor bûn û bı desta dıgırtın, dıgerandın.

Koroxli Begê got: "Bedih axa, ev merıvê me jı rêya dûr

Institut kurde de Paris

hatyê ku kılamên Evdal jı te hılde."

Bedih çavên xwe yên kor zû-zûka qırpandın ser hev, hema bı tırs û lez got: "Na na na... Mın ne Evdal ditiye, ne binaye, ez tışteki nızanım..."

Koroxli Beg xecil bû, pê ra qıse kır, cehdand ku wi qani bıke. Got: "Axa, de te hertım jı me ra qal dıkır, herkes dızane ku tu şagırtê Evdal bûyi. Were xwe nevêje inkaryê, dı vi kari da tışteki talûke ji tune ye, tu zaninên xwe bêje!"

Koroxli û ewên lı wır pê da ketın, kır û nekırın Bedih neanin rê. Ez jı wır ji destvala vegeryam.

Wê demê teypa mın tunebû, mın berê dengbêj guhdari dıkır, paşê ji bı devki pê dıda gotınê û dınıvisand. Pıranya dengbêjan dema ku kaxez û qelem dıditın, xwe dıgırtın, dıtırsiyan û nedıxwastın bêjın.

Dı sala 1964'a da lı Erzurumê bı navê Şêx Muhamed Salıh naseki mın hebû. Ewi rojeki jı mın ra got; "Dengbêjek heye, ew kılamên ku tu lê dıgeri, wana dıbêje. Ez wi jı te ra binım, jê kılaman hılde."

Paşê çû ew merıv ani. Em çûne otêlê, wi merıvi jı me ra sıtra. Pey ra mın qelem hılda, deftera xwe vekır û jê ra got: "De ija tu jı kerema xwe ra devki bêje, ez ji bınıvisım!"

Mın nıhêri ku xwe dıgrê, nabêje, mın carke dınê got: "De kerem ke, devki bêje, ez bınıvisım!"

Camer got: "Welle bawerke na!.."

Mın got: "Çıma na, çı tê da heye?"

Mervê me got: "Welle bawerke nayê hesabê mın."

Şêx Mıhemed Salıh lê hêrs ket, ew ji rabû çû.

Sala 1988'a da ez çûbûm welat. Rojeki lı Qereyazyê em dı dukaneke naseki da rûnıştıbûn, bırayê mınê pıçûk hate cem mın, got: "Kekê naseki teyê kevın lı te dıgere, birya te kırye û dıxwaze te bıbine."

Pırsa wi hê xılas nebıbû, mın nıhêri sê-çar kes ketne hun-

Institut kurde de Paris

dur. Yeki jı wan hat ez hemêz kırım, rûyê mın maç kır û minani dosteki mınê heri pêş lı mın pırsi. Mın camêr nas nedıkır, dı derheqê wi da tıştek ji nedıhat bira mın. Ewi ferq kır ku ez wi nasnakım, deng lı mın kır û awha got: "Efendi tê bira te?.. Lı Erzurumê dı Otêla Emek Palasê da te jı mın ra got tu kılaman devki bêje, ez ji bınıvisım?... Herge mın ku bı ya te bıkıra, ezê ji bı te ra bıhatama gırtigehê, zani!.."

Wê çaxê hate bira mın. Ewa, ewê ku Şêx Mıhemed Salıh bist û çar sal berê, lı Erzurumê anibû cem mın, ew camêr bû. Mın bı wi kari Heci İbrahimê Delıkê naskır.

Ez dırêj nekım, dı dema lêgerinê da ez rasti gellek tıştên balkêş hatım. Bı van minakan va mın xwest rewşa insanê me nişandım û bala xwendevanan bıkşinım ser astengên lêgerinê. Kutasya pırsê, dı wê lêgerinê da mın bı gellek dengbêj û merıvên bı emır ra xeberda û jiyana Evdalê Zeynıkê derxıste rohnkayiyê. Wanên ku mın pê ra xeberda, jı wana sê heb nebyên Evdal bûn, yek kurê nebyê wi bû, çar heb pısmamên wi bûn. Disa jı wana pênç kesi Evdal ditıbûn, kılamên wi guhdari kırıbûn û pê ra xeberdabûn.

Ew xeberdan û kılamên wê lêgerinê mın dı sê defteran da kom kırıbûn. Pıştı 12 Adara 1971'i da ku ez jı welat derketım çûm derva, ew defterana hatıbûn şewıtandın. Paşê ez ku pıştı sala 1978'a jı derveyi welat vegeryam hatım, mın carke dın dest bı lêgerinê kır.

Lê minani berê merıvên bı emır êdi tunebûn, yan ji pır kêm bûn. Vê carê mın rêça kurê nebyên Evdal serast kır, ew ditın û mın bı wana ra xeberda. Mın kurê nebyê Evdal Heyder (H. Berke) dı sala 1967'a lı Qanciya ditıbû, pê kılam dabûn gotınê, Heyder, bı xwe dengbêj bû ji. Lê belê ew zû da jı welat derketıbû û wi pıranya kılamên xwe jıbir kırıbûn.

Dı dema pırskırına vê carê da mın kurê nebyê Surmeli Memed Paşa Dilawer Sarayxanoğlu dit. Bı rasti, Dilawer Begê pır alikarya mın kır.

Institut kurde de Paris

Ew dengbêjên ku kılamên Evdal baş dızanıbûn -heke hındık bûn ji- disa hebûn. Ez lı wan geryam, mın ew ditın.

Dawyê da kılamên Evdal yên ku iro tên zanin, mın ew berhev kırın. Hınek jı wan kılaman 3-4 şax ın. Jı wan şaxan mın yan şaxa (varyanta) hera têkûz hılda, yan ji ew lı hevxıstın. Pışti wexta merıv dıkare wana bı awayê dokumenteri ji bınıvisine. Tenê mın du şaxên kılama "Xozanê" bı hevra hıldane pırtûkê.

Kılamên Evdal, bı serê xwe minani neynıka jiyana wi nın, lê mın pêwendiyên kılaman û jiyana wi ji raber kırın. Dı kijan wextê da, lı kiderê û lı ser kijan bûyerê kılam hatye gotın, mın ew nişandan.

Evdal ne tenê şaıreki bı nav û deng û dengbêjeki tekane bûye, ew dı eyni wextê da destanbêj ji bûye. Bê şık destanên Kurda yên eyan, berya Evdal ji bı kılamki hatıne gotın, lê ewi meqamên nû dane wana û ew lı ser qaide û meqamên xwe sıtrane. Bı sıtrana Evdal va ew destanan pır bı rûmet bûne û gel jı wana bêtır hez kırye. Mın jı wan destanan, yên weki Memê Alan, Siyabendê Sılivi, Kerr û Kulık, Dewreşê Evdi û çend hebên dın ji berhev kırın.

Evdal dı warê dengbêjyê da şopeke nû vekırye. Lı Serhedê ew dengbêjên ku pişti Evdal hatıne, gışka lı gor qaide û meqamên wi sıtrane. Dengbêjên weki Mıstoyê Xellê Heyran, Feqyê Qızqapanê, Ferzê, Emerê Zeynıkê, Resoyê Kopala, Mıhemedê Zıbêt, Pêroya Têxûtê, Zıbêtê Qirka, Mıstefayê Çıftbori, Şeroyê Bıro, Heci Sêvdinê Remedana, Soska Sımo, Zıbêtê Emo, Şakro, Karabêtê Xaço, Kazoyê Garısya, Mıhemedê Canşa, Evdırehmanê Mılazgırê, Zahıro, Sadıqoyê Qırımqayê, Sıdiqo, Mexsûdê Hemzıka û gellekên dın dûajoyên Evdal ın.

Ew kesên ku mın jı gotın û sıtranên wan istıfade kırın ev ın:

*Abdullah Öztürk (Evla Beg), gundê Bado-Tutak.

Institut kurde de Paris

Mın pê ra sala 1961'i û 1966'a da xeberda. Emrê wi lı ser 80'yi bû (1961). Ewi Evdal ditıbû.

*Emerê Zeynıkê (E. Berke), gundê Qanciya-Qereyazi. Nebyê Evdal (Kurê Mıhê). Sala 1966'a da me xeberda. Emer 65 sali bû, ewi kalkê xwe ditıbû. Ew bı xwe ji dengbêj bû.

*Zeynelê Zeynıkê (Zeynel Berke), gundê Qanciya-Qereyazi, nebye Evdal yê pıçûk, 50 sali bû. Mın pê ra sala 1966'a da xeberda.

*İsmailê Zeynıkê (İ. Berke), gundê Qanciya-Qereyazi. Mın, ew sala 1966 da dit. Nebyê Evdal yê ortê, salên wi lı ser 50 bûn.

*Melle Şekır, gundê Çatê-Mılazgır. Mın sala 1966'a da pê ra xeberda, salên wi 77 bûn. Ewi Evdal ditıbû û pısmamê wi bû.

*Şakir Özmen, Elajgır. Nebyê Surmeli Memed Paşa. Mın, ew sala 1967'a da dit. Salên wi 78 bûn û ewi Evdal ditıbû.

*Hıdoya Hespreş (H. Kamış), gundê Hespreş-Qereyazi. Mın sala 1967'a da pê ra xeberda. Salên wê lı dor 100'i bûn û ewê Evdal ditıbû.

*Heyder Berke, gundê Qanciya-Qereyazi. Kurê nebyê Evdal (kurê İsmail), ew bı xwe ji dengbêj bû. Mın bı wi ra sala 1967 û 1992'a da xeberda. Nıha mala wi lı Istenbolê ye.

*Heci Beşer Berke, gundê Qanciya-Qereyazi. Kurê nebyê Evdal (kurê İsmail), Mın pê ra sala 1992'a û 1993'a da xeberda. Nıha mala wi lı Menemenê ye.

*Heci Muhyedin Berke, gundê Qanciya-Qereyazi. Kurê nebye Evdal, (kurê İsmail). Mın dı sala 1992'a da pê re xeberda. Nıha mala wi lı Istenbol-Gûlsuyê ye.

*Cezmi Berke, kurê nebyê Evdal (kurê Zeynel). Nıha mala wi lı Istenbol-Gûlsuyê ye.

*Kemal Berke, kurê nebyê Evdal (kurê Zeynel). Mala wi lı Istenbolê ye.

Institut kurde de Paris

*Giyasettin Berke, kurê nebyê Evdal (kurê İsmail)- Mala wi lı Istenbolê ye.

*Muhammet Şakir Berke, kurê nebyê Evdal (kurê Emer)-Mala wi lı Istenbolê ye.

*Koroxli Öztürk, gundê Cemalvêrdi-Tutak.

*Qoçeli (Ali Koç), gundê Gomıkê-Mılazgır.

*Hikmet Koç, gundê Gomıkê-Mılazgır.

*Suheyla Koç, gundê Gomıkê-Mılazgır.

*Yusuf Seyidoğlu (Seyd-Usıv)-Gundê Aleqıça-Elajgır.

*Hıdır Aslan-Gundê Ziro-Qerekılis.

*Reşitê Gulo (Reşit Burçak) Gundê Gulo-Qereyazi. Pısmamê Evdal.

*Mıhemedê Qanciya (Mehmet Biliz)-Gundê Qanciya-Qereyazi. Pısmamê Evdal.

*Selahattin Sarayhanoğlu, Elajgır. Kurê nebyê Surmeli Memed Paşa.

*Dilawer Sarayhanoğlu, Elajgır. Kurê nebyê Surmeli Memed Paşa. Mala wi nıha lı Bornova-İzmirê ye.

*Yaşar Kemal, nıviskar-Istenbol.

*Abdullah Varlı, nıviskar-Enqere.

*Dr. Muzaffer Demir, Parlamenê kevın yê Muşê-Bılanıx.

*Münir Binici-Gundê Soylemeza jorin-Qereyazi.

*Tahsin Binici-Gundê Soylemeza Jorin-Avukat-Enqere.

*Enver Taştan, Avukat, gundê Soylemeza jorin-Qereyazi. Mala wi nıha lı İzmirê ye.

* Fexredinê Çawırmê-Tekman

*Haydar Demir-Gundê Kulyê-Qereyazi.

*Heciyê Cındi, nıviskar, "Berhevoka Folklora Kurdi", Erivan-Ermenistan.

*İhsan Çiftçi-Gundê Melleosman-Qereyazi.

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

*Halis Özdemir. gundê Aleqıça-Elajgır.

*Heci Sêvdin-Dengbêj. Gundê Remedana-Elajgır.

*Zıbêtê Emo- Dengbêj. Gundê Ruta-Elajgır.

*Heci Mecitê Bırûki-Çirokbêj. Gundê Mêrgexelê-Qereyazi.

*Resoyê Kopala-Dengbêj. Gundê Kopala-Qereyazi.

*Şakırê Bedih (Şakro)-Dengbêj. Gundê Cemalvêrdi-Tutak. 1996'a da lı İzmirê wefat kır.

*Kazoyê Garısya-Dengbêj. Mala wi lı Xamûrê ye.

*Mexsûdê Hemzıka-Dengbêj. Gundê Hemzıka-Elajgır. Nıha mala wi lı gundê Atburgazê-Sökê ye.

*Mıstoyê Belengaz-Dengbêj-Xoresan.

*Mıhemedê Perê-Dengbêj. Mala vi nıha lı Istenbolê ye.

*Şeroyê Bıro-Dengbêj. Erivan-Ermenistan.

*Mıhemedê Zıbêt-Dengbêj. Gundê Çêrmelyê-Sariqamiş.

*Sıdiqo-Dengbêj. Mala wi lı Mûşê ye.

*Sebriko-Dengbêj. Gundê Xellê-Mılazgır.

*Mıhemedê Canşa-Dengbêj-Gundê Delıkyê-Qereyazi.

*Evdırrehmanê Mılazgırê-Dengbêj.-Mılazgır.

*Karapêtê Xaço-Dengbêj. Erivan-Ermenistan.

*Mıhemed Eli Qızılgûneş. Dengbêj-Mılazgır.

*Zahıro-Dengbêj-Mılazgır.

*Faruk Çamlıbel-Bazid. Lı İzmirê wefat kır.

*Heyder Aras, gundê Orteqelê-Sarıqamiş. (Xalê Mın)

*Zeki Deniz-Dengbêj-Varto. mala wi nıha lı İzmirê ye.

*Savciyê nebye İbrahim Begê Qerxelıxê-Gundê Qerxelıxê-Dutax.

*Ehmedê Mırazi, nıviskar, "Biraninêd mın", Eriwan-Ermenistan.

*İbrahimê Teraş (İ. Burçak), pısmamê Evdal-Gundê Gu-

Institut Kurde de Paris

lo-Qereyazi.

Evdal, emreki dırêj derbas kırye. Lı gor gotına nebyê wi yê mezın Emerê Zeynıkê, Evdal 110 sal emır kırye. Bı gotına kurê nebyê wi H. Beşer, ewi 115 sal, bı gotına kurê nebyê wi yê dın Heyder ji ewi 105 sal emır kırye.

Lı gor salıxdana wan kesên ku Evdal ditıbûn, Evdal jı sed sali zêdetır emır kırye. Ango Evdal dı serê 1800'i da hatye dunê û dı sala 1913'da ji wefat kırye.

Jiyana Evdal, hê dı saxiya wi da dı nav gel da bûye efsane. Pırs û gotınên wi, weki darbımeselan, weki pırsên pêşiyan têne gotın. Weki ku me lı jorê ji got, Evdal lı Qanciya mırye û mexberê wi lı wêderê ye. Lê dı dema lêgerinê da, lı hêla Intabê, gellek merıvan iddıa kırın, gotın ku mexberê wi lı gundê Melle Hesen e. Her wusa lı hêla Mılazgırê ji gellekan dıgotın ku mexberê wi lı Gomıka Mılazgırê ye. Ev gotınan nişandıdın ku Evdal jı yalê gel da pır hatiye hezkırın.


Naveroka kılamên wi, yan serpêhatyên wi nın, yan ji ew bûyeren dıramatik yên ku ew lê bûye şahıd, ew ın.

Merıv dıkare bêje ku lirizma Kurdi bı qaide û meqamên Evdal va gıhiştiye dereca xwe ya hera bılınd.

Jiyana Evdal bı ya Surmeli Memed Paşa ra hatye gırêdan. Ew zemaneki dırêj lı cem Memed Paşa maye, jı ber wê yekê jiyana Memed Paşa û buyerên zemanê wi bı fırehi hatın şırovekırın. Jı bo ku Evdal baş bê nasin, baş bê fehmkırın, şert û mercên dewra wi û rewşa jiyana cıvaki gera bên zanin.

Ev lêgerina bı awayê dokûmenteri hat amadekırın. Bı vi teheri dı pêşerojê da, kesên sosyolox, edebiyatzan, dirokzan û muzisyen dıkarın lı ser bıxebıtın û jê istifade bıkın.

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

# Êla Meman

Êla Meman ji mina êl û eşirên dın, serê bıharê terş û talanê xwe hıldıda dıkete rê, dıhat lı zozanên navbera Çiyayê Sipanê û Çiyayê Qetewin datani. Hetani payizê pez û dewarên xwe lı wan deran dıçêrand, hasıla xwe hıldıda, paşê disa radıbû dıçû Welatê Jêr.

Koçeritiya Êla Meman, bı sed-salan bı wi awayi dom kıriye. Êlê, jiyana xwe, havinan lı Zozanên Serhedê, zıvıstanan ji lı Berri ya Welatê Jêr derbas kırye.

Dı zemanê İsmail Axa yê Zengûzêrin da, saleki dawiya payizê da, berf 15-20 roji berya wextê xwe dıkeve. Barina berfê sê roj û sê şevan lı ser hev dom dıke, newal û kendalan tıji dıke, tê ber çoka merya. Êdi kes nıkare jı ciyê xwe bıleqe.

İsmail Axa ferman dıke, dıbê: "Dewaran şerjê kın, bı hestiyên wan va agır dadın, sitılan lı ser kuçıkan rast kın,

Institut kurde de Paris

goşt bıqelinın!"

Êl radıhêlê, dewaran şerjê dıke, agır dadıde û goştê dewaran dıqeline. Aliki da ji xortên êlê radıhêlın tevr û bêran, erdê dıkolın, jı xwe ra holıkan çêdıkın. Paşê ji tevi pezên xwe dıkevın holıkên bın erdê û wê zıvıstanê derbas dıkın.

Êla Meman ku wê zıvıstanê lı wır dımine, êdi venagere Welatê Jêr, lı wır bı cih dıbe.

Êla Meman çar qebile bûye: Pazûki, Qesıki, Banoki û Pınanşi. Êl bı zeman va lı hev zêde dıbe, êdi lı wê derê naeşıre, pıranya malbatên Memanan jı wır bardıkın, dıçın lı hêla Mılazgırê, Intabê û Elajgırê bı cih dıbın. Dı dema wê koçkırınê da, jı qebila Pazûkan 15-20 mal, dıçın lı gundê Cemalvêrdi bı cih dıbın.

Cemalvêrdi, lı bakûra Çiyayê Qetewin, dı serê şaxeki da hatye avakırın. Erdê gund erdeki xas e. Gundi hım rêncberyê dıkın, hım ji terş û heywan xweyi dıkın. Jı ber ku hemmû gundi jı qebileki bûne ango Pazûki bûne bı hevra baş derbas dıkın.

Rojeki jına Hesenê Pazûki dıçe bı mêrê xwe ra xeberdıde. Dıbê: "Mêrık, waye emrê me derbas bûye, em herdu ji êdi pir ın, tu were em Mıstefayê xwe bızewıcinın, bıra dı dılê me da ew kesera nemine!"

Hesen dıbê: "Hay-hay jınık... Jı Xûdê daxwaza mın ji ew e. Mıstefayê mın kê dıxwaze?"

Jına wi dıbê: "Zeynê dıxwaze."

Hesenê pazûki dıçe bı bavê Zeynê ra xeberdıde û Zeynê jı kurê xwe ra dıxwaze.

Zeynê qizeke baş û baqıl bûye, jêhati û malkır bûye. Deweta Mıstafa û Zeynê dıbe, saleki pışt ra Zeynê radızê, jê ra kurek dıbe. Navê wi Evdal datinın. Evdal hıneki mezın dıbe, ku du salê xwe qut dıke, dıkeve sala sısya, bavê wi dımıre, Zeynê bi dımine.

Pışti mırına Mıstefa ra gellek kes xwezginyê xwe dışinın,


Institut Kurde de Paris

**Evdal û Diya wi.**
**Bavê Evdal dımıre, ew ji êtım dımine.**

Zeynê dıxwazın. Zeynê naxwaze carke dın mêr ke. Dıbê: "Xudê qedera mın ha lêxıstye, ez mêr nakım, ezê lı ser hêlina xwe bıminım û êtimê xwe xweyikım, mezınkım."

Zeynê, êdi mêla xwe dıde ser mala xwe, emrê xwe dıde ber lıngê kurkê xwe. Zeynê kar û barê mala xwe weki mêreki bı xwe dıke. Gundi-cinar jı wê jêhatibûn û dılovanya Zeynê ra heyran û hezmekar dıminın. Herkes jı yalê xwe da alikarya wê dıke. Bı wi awayi Zeynê dıbe hezkırya hemmû cinaran. Bı wê hezkırınê va gundi-cinar êdi jê ra nabêjın Zeynê, dıbên Zeynıkê. Cinar hurmeteke mezın nişani Zeynıkê dıdın û ew û Evdal dıbın delalyên gund.

Zeynık, êdi jı kurê xwe ra hım dê, hım ji bavtiyê dıke, wi mezın dıke. Evdal ku mezın dıbe tê dema xortanyê, ew ji weki xortên dın bı şıxul û emelê xwe û bı kar û barê mala xwe ra mıjûl dıbe. Lê xorteki bê deng û bê hıs bûye.

Weki hemmû deverên Kurdıstanê, lı gundê Cemalvêrdi ji, hemmû gundi êvaran lı mala malmezınê gund kom dıbın, dı wan şevên payizan yên dırêj da jı rispi û dengbêjan kılam û destanên Kurda guhdari dıkın. Gellek caran jı ciyên dereke dengbêj û çirokbêjên bı nav û deng tên, lı gund dıbın mêvan, çend şevan lı ser hev dıstırên û çirok û destanan dıbêjın. Evdal ji hertım dıçe wan cıvinan, bı meraq hewes wana guhdari dıke.

Hetani ku salên wi neziki siyi dıbın, Evdal kılam-mılaman nabêje. Evdal dızewıce, bı jın û zar dıbe û ew ji weki gundiyên dın bı kar û emelê xwe va mıjûl dıbe. Lê belê wê demê rewşeke taybeti da bûye. Ew rewşa wi bala cinaran ji dıkşine. Car-cara Evdal dev jı kar û emelê xwe berdıde, dıheyibe, dıçe lı çiya û banya dıgere. Dıçe devê çeman, bı seetan xuşe-xuşa avê temaşe dıke. Dıçe lı mêrg û beyaran dıgere, viçe-viça çıvikan û vıngina mêş û mozan guhdari dıke. Herweki ew aşıqê tebietê bûye.

Wê çaxê Evdal şeveki xewneki dıbine. Dı xewna xwe da dıkeve nava qalme-qalmên gıran, dunya tevlıhev dıbe, dawyê

Institut kurde de Paris

da Evdal wedıreşe, garısên hûr jı qırıka wi tên xarê. Sıbetırê dıçe cem rispiyê gund, xewna xwe jê ra dıbêje.

Rispi dıbê: "Evdal lawo, Xûdê xewna te bı xêr ke, ezê bı izna Xûdê xewna te awha şirovekım: Heke te ev xewna dı panzde saliya xwe da bıdita, tuyê bıbûyayi alımeki pır mezın ku herkesi dê jı te keramet û merifet hılda. Heke te ev xewna dı bist saliya xwe da bıdita, tuyê bıbûyayi merıveki pır dewlemend. Lê te ku ev xewna dı vê dema emrê xwe da ditiye, bı bawerya mın tuyê bıbi dengbêj û şaıreki pır mezın, nav û dengê te wê lı rû dunyayê bela bıbe, hetani ku dunya avabe, navê teyê dı nav gel da heta-heta wê bê gotın."

Pışti wê xewnê, çendeki şûnda Evdal nexweş dıkeve. Nexweşiya wi gıran dıbe û ew nêziki şeş mehan dı nav ci da dımine. Rojeki Eyşoya jına wi ku jı der da tê, bala xwe dıdê ku jı nav ciyê Evdal dengeki xerib tê. Dıçe lı ber serê Evdal dısekıne, hew dıbine ku kale-kala Evdal e û minani sitıleke bulxura lı ser agıreki gurr dıkelıce.

Eyşo zû-zûka dıçe nava gund, gazi cinaran dıke, dıbê: "Evdal dengê xwe hıldaye, dı nav ci da kale-kala wi ye, hela werên mêzekın çıka çı pê hatiye!"

Gundi-cinar dıçıne mala Evdal, dınıhêrın ku minani gotına Eyşo, dı nav ci da kale-kala Evdal e, weki sitıla bulxur hema jı hundurê xwe da dıkelıce.

Wê demê her yeki jı wana tışteki dıbêje. Hınek dıbêjın "Ev bayê taê ye, pê gırtiye."

Hınekên dın dıbên, "Na, ev bayê taê nine, sur pê ketye."

Hınek jı wan ji dıbên, "Na welle, ev ne bayê taê ye, ne ji sur e, yeqin Evdal dın bûye."

Dı demeke kurt da xeber lı nav gund bela dıbe, hemmû şênyê gund tên lı mala Evdal kom dıbın, lê guhdari dıkın. Bala xwe dıdınê ku dı nav ci da lûve-lûva Evdal e, jı hundurê xwe da dıkelıce. Dı wê lûvê-lûva xwe da Evdal tu kelime û

Institut kurde de Paris

Evdal xewn dıbine û dıçe xewna xwe jı rispiyê gund ra dıbêje





Evdal, pışti nexweşiya xwe dest bı stranê dıke

Institut kurde de Paris

pırsan nabêje, herweki cur bı cur meqamên cuda dıbêje. Demeki şûnda Evdal dengê xwe dıbıre, hêz dıde xwe, radıbe lı ser nıvina xwe rûdınê, deng lı jına xwe dıke, dıbê: "Eyşo, ez êdi sılamet bûme, zû jı mın ra şerbeteki çêke bine!"

Eyşo jê ra şerbetê tine. Evdal şerbeta xwe veduxe û dest davê peleguha xwe, dest bı sıtranê dıke. Dengê xwe hıldıde, kılaman lı pey hev rêz dıke. Wanên lı wır, gışk pê va şaş û matel dıminın. Dengê Evdal minani ava behrê pêl dıde, lı şax û mesilan bela dıbe, xwe dıghine serê Çiyayê Qetewin, minani lehiya bıharê carke dın paşta dıherıke û tê. Hetani wê çaxê, tu kesi jı tu dengbêji qaide û meqamên wusa xweş guhdari nekırıbûye û dengeki wusa xweş, dengeki usa gumrah û zelal nebıhistibûye.


Evdal hetani êvarê kılaman dıbêje. Paşê herçiyên ku lı wır kombûne bela dıbın dıçın malên xwe.

Jı wê rojê şûnda Evdal êdi dengê xwe nabıre. Bı şev, bı ro kılaman dıbêje. Lı ser zındiyan dıbêje; lı ser mıriyan dıbêje; lı ser rewılên çolê dıbêje; lı ser teyr û tûyan dıbêje; lı ser evina keç û xortan, lı ser mêrxasya mêran, lı ser avên çeman, lı ser dar û beran dıbêje. Xulase çı lı ber çavên Evdal kevc, lı ser kılaman dıbêje. Lı ser erdê mûri jı ku bılıpıte, Evdal kılaman davêje ser.

Dı demeke kurt da nav û dengê Evdal bela dıbe, jı gundên der û doran, jı ciyên dereke merıv têne ditına wi. Dengbêj û şaırên bı nav û deng tên pê ra dıkevın lecê, bı Evdal ra dıstırên, leca wan bı roj û şevan dom dıke. Tu dengbêj lı pêşya wi zêde berxwe nade. Herkes jı dengbêjya wi ra heyran û hezmekar dımine.

Axa û begên bı nav û deng, qasıdên xwe dışinın pey Evdal, wi dıbın dewet û şêhnayiyên xwe. Ew dewet û şêhnayiyên ku Evdal dıçê, dıbın weki mihricanan. Herçiyên ku hatına wi dıbıhizın, dev jı kar û emelên xwe berdıdın dıçıne, dewetê. Kal û pir, keç û xort, jın û zar qefle-qefle dıçıne

Secera Evdalê Zeynıkê




Institut kurde de Paris

guhdariya Evdal.


Gellek axa û begên bı nav û deng dıxwazın ku Evdal bı malti bıbın cem xwe û ew bıbe dengbêjê wan. Evdal daxwaza wana qebûl nake, naxwaze bıkeve bınê bandora tu kesi. Lewra ew dengbêjeki serbıxwe û destûrdayi bûye.

Dı nava çend salan da nav û dengê Evdal ne tenê lı Kurdıstanê, dı nav Kurda da, her wusa dı nav gelên dın da ji bela dıbe, tê bıhistın, dıbe efsane. Lê Evdal guh nade efsaneya ser navê xwe, rewşa xwe naguherine û ew disa bı karê xwe yê rêncberyê ra mıjûl dıbe.

Evdal dı demên havinan da şıxul û karê mala xwe dıke, dı demên bıhar û payizan da ji dıçe dewet û şêhnaniyan.

Dı dawya havinan da ku şuxulê rêncberyê xılas dıbe, gundiyên wan deveran lı hev kom dıbın dıçıne kawranyê. Jı bo piderkırına zexirê yan dıçıne İranê, yan ji dıçıne kêşa Diyarbekır û Musılê. Jı bo pêlazımyên navmalê ji dıçıne Erzurumê. Barbırên wê çaxê ga û hêstır bûne. Merıvên du-sê gundan barbırên xwe dıdın pêşya xwe, bı hevra dıdın ser rê. Rêwitya wana du-sê hefta, hınek caran ji meheki dıkudine.

Institut Kurde de Paris


Institut kurde de Paris

*Gundi barên xwe lı gayên xwe dıkın û dıçın rêwityê*

# Rêwitiya Erzurûmê

Payizeki, pışti xılasya bêderan, Evdal û cinarên wi dıkevın ser rê û dıçıne Erzurumê. Rêya Erzurumê dûr û dırêj e. Kawran ji qeremol e, sı zılam, çıl û çend ga nın. Kawran, jı Cemalvêrdi radıbe, dı deşta Intabê ra, dı Gelyê Berazan ra xwe dıgıhine Textê Bêrexdar, jı wır dadıkeve devê Erez, jı Erez derbas dıbe, dı Çiyayê Ketwanê ra derbasi Deşta Hesenqelê dıbe û dıçe Erzurumê. Gundi, lı Erzurumê pêlazımyên xwe dıstinın, barbırên xwe bar dıkın û vedıgerın. Lı serfêza Mescitliyê ku ew jı ava Erez derbas dıbın, êvar dıkeve ser wana û şıli ji dest pê dıke. Kawran hetani ku xwe dıgıhine Çulyê, wext ji dıbe eşa. Gundi dı nav Çulyê da bela dıbın, dıçın lı derya dıxın, dıkın-nakın kes deri venake û ew dı bınê wê şılyê da perişan dıbın. Evdal jı hevalên xwe ra dıbê: "Olo, jı mın ra hebe sıvder-mıvdereki bıbinın, ewqasi ku mın jı şılyê bıparêze, ezê deng lı gundiyan bıkım, wana jı

Institut kurde de Paris

hundur derxım!"

Hevalên wi lı der û dorên xwe mêze dıkın, sıvdereki dıbinın û Evdal dıkıne bınê sıvderê.

Evdal lı wêderê dengê xwe hıldıde dıke qırin. Evdal demeki dıstırê, çend deqiqa şûnda hemmû şênyê Çulyê tê hıldıșe wıra. Ça ku dıbhizın ewê ku dıstırê Evdalê Zeynıkê ye, Çuliyan hevalên Evdal hıldıdın, dıbın malên xwe, dıkın mêvan. Wê demê dı gund da dewet ji hebûye. Jı bo vê yekê gundi izna wan nadın, dıbên: "Hûnê du-sê roja mêvanê me bın."

Sıbetırê şêni tê lı dora Evdal kom dıbe, pê kılaman dıdıne gotın. Evdal hetani danê nivro dıstırê. Paşê sıfre tê, dest bı xwarına nanê nivro dıkın. Lê gundi fıqaqê nadnê, ısrar dıkın, lı ser sıfrê ji bı Evdal kılaman dıdın gotın. Navroja wan xaşil bûye. Evdal, lı ber sıfrê, lı ser balgiki rûdınê, jı xaşilê kevçiki duxwe, jı kılameki çend rêzan dıbêje, kılamê nivcû dıhêle, carke dın dest bı xwarınê dıke. Bı wi awayi nanxwarına wan dırêj dıbe.

Evdal, bı bejna xwe va hıneki kınık bûye. Dı pıçûktiya xwe da ku nexweşi derbas kırye, rûyê wi bı xuri bûne.

Ew ku hê lı ser sıfrê bûne, qizek tê wır. Keçık qizeke xama û mêrani bûye. Keçık, şêni dıqelêşe tê pêş, tê nêziki Evdal. Deng lı şêni dıke, dıbê: "Hela veçıxın, jı hev veçıxın, dıbên Evdalê Zeynıkê hatye, ez bıbinınım çıka yeki çawa ye!"

Dema ku qizık tê pêş, Evdal dıbine, xeyalşıkesti dıbe û dıbê: "Hewûûû... Evdalê Zeynıkê ev eee!.. Tehe... Xwezi bı navê wi, ne bı ditına wi!.."

Lı ser wê pırsa keçıkê Evdal dev jı nanxwarınê berdıde, kılaman davêje ser keçıkê. Bı sıtrana wi keçık pır şermi dıbe, pê bı pê xwe dıde paş û jı wır derdıkeve dıçe mala xwe.

Wê êvarê deweta malmezınê gund hebûye. Xweyên dewetê tên gazi Evdal dıkın, wi dıbın nav dewetê.

Institut kurde de Paris

Evdal ku dıçe nav dewetê, bala xwe dıdê ku dı meregeke mezın da govenda cergobezi dıgere, def û zurne lê dıxe, dengbêj dıstırên, ew keçıka ku jê ra pırs gotiye, ewê ji destmalek daye destê xwe, ketye sergovendê, bı kêf û eşq jı xwe ra dıreqıse. Evdal ça ku dıkeve govendê, dest pê dıke dıstırê, def û zurne kerr dıbın, ew dengbêjên dın ji dengê xwe dıbırın, wi guhdari dıkın. Demeki şûnda Evdal kılamên edeti dıhêle, dest pê dıke, carke dın kılaman davê ser wê keçıkê. Keçık ji jı sergovendê derdıkeve, xwe pêda-pêda dışıqıtine tê dıkeve destê Evdal. Evdal destê wê dıgıvêşe, dıqurıncine û disa lı ser wê dıstırê. Dawyê da qizık lava dıkê, dıbê: "Ez bextê te da me Evdal, bese êdi bıbıre, te ez rezil kırım!"

Evdal dıbê: "Berê te ez rezil kırım, mın ji heyfa xwe jı te hılda, nıha em bûne weki hev. De here bıra herkes xêrê jı bazara xwe bıbine."

Pey ra Evdal jı bo wê bûyerê kılameki derdıxe:

## Ezê jı Erzurumê hatım bı kawrani (*)

*Heyla lawo, emê jı Ezurmê hatın bı kawrani*
*Emê peyabûne şewıtya Çulyê bı mêvani*
*Qiz û bûkên Çûlyê lı ser kanyê kıras-şo dani*
*Ew qonaxa ku em lê peyabûn bı mêvani*
*jı bo navrojê, jı me ra xaşil dani.*

*Wey can Evdal,*
*Wey can Evdal...*

*Lawo, wezê hatım Çûlya şewti cot-kani ne*
*Gava ku jı bo navrojê sıfra danine*

---

**** Ev kılama jı Emerê Zeynıkê (Nebyê E. Zeynıkê), Kazoyê Garısya û Heyder Berke (Kurê nebyê Evdalê Zeynıkê) hatye gırtın.***



Institut kurde de Paris

*Pêşta hatın qizeke ezep û du hebê bûkine*
*Lı Ewdal nıhêrin, bı tiqe-tiq pê kenine*
*Keçka ezep dıgo ev mêvana yeki kurti kın e*
*Destê wi naghêje sıfrê, texte û nin e*
*Bawer bıkın, ewê iro bırçi bımine.*
*Evdal şermi dıbe û xwe paşta dıkşine,*
*Jı qama nivro heta êvarê bırçi dımine.*
*Bı keder û meraq êvarê ser xwe da tine.*
*Dı dılê xwe da rıca dıke jı rebê jorine*
*Dıbê işev dewetek çêbe, Evdal bıkevê û xwe bıhejine.*

*Hey can Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Dılê Evdal bı kul û wê bı tir e,*
*Qonaxê, Danê êvarê jı Evdal ra dani nan û şir e,*
*Evdal jı derdê xwe ra dıbêje, dılobine û qire-qir e,*
*Ye hate cem, go keremke were dewetâ mala mir e...*

*Hey can Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Dema ku ew xeber hılda Evdalê belqıti*
*Xurc kışanda ortê, lı devê xurcê xebıti*
*Jê derxıst qatek çekê nelıxwekıri-nexebıti*
*Çek ser bejna xwe da berda Evdalê belqıti*
*Derket derva, berbe mala mir berjêr şıqıti.*

*Heycan Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Evdal ku dıkeve govendê xwe dıhejine*
*Jı defçi-zurneçi ra çavê xwe dıqırpine*
*Dıreqıse, dengê xwe hıldıde dıke qirine*

Institut kurde de Paris



**Keçka Çulyê jı der da tê û lı Evdal mêze dıke**

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

*Defçi-zurneçi sekınine, lı hev nıhêrine*
*Dıbên êdi tu kes erbeteka awha nabine.*

*Hey can Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Weyla Evdalo belqıti*
*Govend dı hevda xelıti.*

*Ew keçka ketye ser-govendê xwe dıhejine,*
*Destmalê lı ba dıke, govendê lı pey xwe dıkşine*
*Evdal, lı ser keçkê kılama dıbê û dıke qırine*
*Keçık tê dıkeve destê Evdal û xwe dıbe-tine*
*Dıbê te ez xecil kırım, êdi bese mı ne eşine!*

*Hey can Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Keçık haci xwe tunine,, bışkokê pêsira wê qetyane,*
*Evdal, mêze dıke ku serê memıkê wê xûdane.*

*Hey can Evdal,*
*Hey can Evdal...*

*Evdal jı defçi û zurneçi ra çavê xwe dıqırpine*
*Deweta gıran e, tari ye kes haci kesi tunine*
*Evdal destê keçkê dıgvêşe, çava jê ra dıqırpine*
*Wê dıgrê, dıbe hewliyê, ramûsaneki jê dıstine*
*Dıbê te dıgo destê mêvan nagıhije texte û nin e*
*Evdalê Zeynıkê dı bınê pırsa da namine*
*De tu here, bıra herkes xêrê jı bazara xwe bıbine*

*Wey can Evdal,*
*Wey belqıti..*

Institut kurde de Paris

# Evina Dilberê

Evdal ku jı mala xwe derdıkeve û dıçe dewetan, êdi zû zû venagere. Xweyên dewetan wi jı destê hev dırevının. Herkes dıxwaze ku Evdal bıbe deweta xwe, lewra dengbêjya wi, jı bo wan kesan serfırazi û bextewari bûye. Evdal bı wi awayi lı hemmû deverên Serhedê dıgere.

Evdal ku dıçe hêla Tekmanê, dınhêre ku herkes qala evina Dilberê dıke. Dilber qizıkeke pır bedew bûye. Dılê wê û x teki cinar dıkeve hev. Lê bavê Dilberê wê nade dılketyê wê, bı qelendeki gıran, wê dıde yeki dewlemend ê bı emır. Pevra dılketyê Dilberê jı bı qizeke dın ra dızewıce, lê evina Dilberê jı dılê wi dernakeve û ew lı ser Dilberê bengi dıbe. Evdal ji wê demê lı ser evina wana kılameki derdıxe:

## Dilber (*)

*Gıdi heyran xanyê bavê Dılbera mı lo jı gund tek e,*
*Heylo kewa mı yeke bejn-zırav e lo eni bı deq e*
*Çav û bıryê delalya dılê mı reş e, lo reş-belek e*

---

**** Ev kılama, jı sıtrana Resoyê Kopala, Şakro (Şakırê Bedih), Kazoyê Garısya û Zahıro hatye tevxıstın.***

Institut kurde de Paris

*Herçyê ku derdê dıla ditye, bıra loma jı mın neke*
*Ramûsanê zer-memıkê Kewê jı mın ra teberık e...*

*Hay lê eman hayê lê Dilber...*
*Eman eman dıl bı kulê Dilber...*
*Eman eman te ez helandım lêêê...*

*Gıdi heyran xanyê bavê Dilbera mı lo du qanat e,*
*Dı riya navê Xûdê da be iro mı ne sebre lo ne tebat e*
*Heyla gidi heyran iro mı ne bask e lo ne qanat e*
*Xwezi bıra bıgotana heramê mêrê te nehatye*
*Mınê bıda serê xwe kolosê sıpi, bıhatama ba te...*

*Hay lê eman hay lê Dilber...*
*Eman eman dıl bı kulê Dilber...*
*Eman eman te ez helandım lêêê...*

*Gıdi heyran derê mala bavê Dilbera mı dı qulbe da*
*Kewa mınê iro derketye ser banê xani bulxur tevda*
*Kewê iro kolosê mı bı qaydê kofinga xwe gırêda*
*Xwezi bıra iro jı mın ra xebereke xêrê bıhata*
*Bıgotna heramê mêrê te mırye, kewna jına mı bı serda*
*Jına çê dı destê mêrê heram da ne tê kuştın,*
*/ne tê berdan...*

*Hay lê eman hay lê Dilber...*
*Eman eman dıl bı kulê Dilber...*
*Eman eman te ez helandım lêêê...*

Institut kurde de Paris

# Keçka Dedewêranê

Evdal, bı husnê xwe zılameki kexşe nebûye, lê wexta ku dı şêhnayiyan da sıtraye, jı guhdaran gellek qiz û bûk bûne evindarê wi.

Evdal rojeki dıçe Dedewêrana Xınûsê. Lı wır kılaman pê dıdıne gotın. Mala ku ew lê mêvan bûye, qizeke malkê ya xama û bedew hebûye. Dılê qizkê dıkeve Evdal. Lê Evdal wê demê hım zewıci bûye, hım ji ew xwe jı tıştên wusa dûr dıgrê. Keçık, mınani pezeke gêj, hema wusa sews dıbe, perda şerm û eybê davêje aliki, dıkeve dû Evdal. Evdal kuda dıçê ew jê naqete, dıbê: "İlla tê mın bı xwe ra bırevini bıbi."

Evdal dıke-nake pêsira xwe jê xılas nake, dıbê: "Bıra be, ezê te bırevinım, lê revandın awha lı orta rojê nabe. Tu hazırya xwe bıke, bıra şev bıkeve ser me, herkes ku raza, bı destê sıbê ra emê rabın, ezê te bavêjım terkiya xwe û bıbım."

Evdal bı wi awayi qizkê qani dıke, dıbe êvar herkes dıçe radızê. Evdal xew nake, xwe hazır dıke, pişti razanê dızika dıçe, jı tewlê hespê dıkşine derva, lê siyar dıbe û dajo. Here ku naçi...



Institut kurde de Paris

**Evdal û Gulê bı hevra dıstırên**

# Kawranê Êla Bekıra

Êla Bekıra, lı başura deşta Patnosê û lı quntara Çiyayê Sipan da bı cih bûye. Saleki ku dıbe qulıxayi, nan çê nabe, kawraneki Bekıra dıkeve rê, dıçe jı hêla Diyarbekırê jı xwe ra nan dıkıre. Serkawranê êlê Şêx Roni zılameki mêrxas û jêhati bûye. Pacxurê rêya navbera Sıliva û Diyarbekrê ji berya wexta Sıloyê Omeri bûye. Sılo merıveki pır zalım û zorker bûye. Sılo ku dımıre, qiza wi dıbe serokê elê. Navê wê Nûrê bûye. Nûrê bı zalımtiya xwe hê jı bavê xwe xırabtır bûye.

Dema ku kawranê Bekıra jı Diyarbekrê derdıkeve tê nêziki Sıliva, Nurê pêxasên xwe dışine pêşya kawran. Şêx Roni ji wê çaxê pêşda dıçe û jı kawran dıqete. Pêxasên Nûra Sılo lêdıxın bırayê Şêx Roni û bırazyê wi dıkujın. Dema ku xeberê dıdınê, Şêx Roni, bı lez û bez, bê tevdir dıçe hewarya wana. Nûrê bı bêbexti wi ji dıde kuştınê.

Evdal lı ser kuştına Şêx Roni kılameki derdıxe.

Institut Kurde de Paris

## Şêx Roni (*)

*Were haylo...*
*Şêx Ronyê mı lawo, jı wıra hetani vıra,*
*Ketye ser rê kawranek jı kawranê van Bekıra*
*Pêşya wi kawrani derketye Şıkefta Sılo,*
*Paşi maye lı Diyarbekıri xopan, lı derê*
*/dukanê van zivkera*
*Ezê rabım herım xwe bavêjım ser destê Nûra Sılo,*
*Ezê bêjım heyla Nûrê nemayê*
*Ezê bı te kım, tuyê bı Xûdê ki,*
*De tu were Şêx Roni nede Kuştınê,*
*Sed heyfa vi xweş-mêri,*
*Vi zılami bıdi ber xatırê herçar malê me şêxlera.*

*Heyla hayê, heyla hayê*
*Wezê nemınım lı dunyayê...*

*Were haylo, were hayê*
*Şêx Ronyê mı lawo rabe rayê!..*
*Şêx Roni go heyla lê dayê!*
*Ra û tıvdir bı destê xuda ye*
*Ezê rabım siyar bım,*
*Berê xwe bıdım newala boke-berana ye*
*Ezê iro lı meydanê hıldım heyfa Xalıtê Bıraye...*

*Heyla hayê, heyla hayê*
*Wezê nemınım lı dunyayê...*

*Şêx Ronyê mı lawo,*
*Ezê bı diharê Şıkefta Sılo dıketım wê bı hez e*
*De tu were neçe berxê, tu zavayi, zavayê teze*
*De tu berê xwe nede Newala van Omera!*
*Şêx Roni go heyla lê dayê!*

---

* **Ev kılama bı strana Kazoyê Garısya ye.**

Institut kurde de Paris

*Ezê disa siyar bım fenani cara*
*Ez hetani hılnedım heyfa Xalıtê Bıra*
*Bıra lı mın heram be nıvina bûka teze.*

*Heyla hayê, heyla hayê*
*Wezê nemınım lı dunyayê...*

*Heyla Şêx Ronyê mı lawo,*
*Ezê bı diharê Şıkefta Sılo dıketım bı dar û bin e*
*Pêşi heye lawo, paşya vi kawrani tunine*
*Lı Diyarbekırê, lı derê dukanê zivkera dımine*
*De tu were iro neçe berxê.*
*Nûra Sılo bêbext e*
*Heyla lê Nûrê nemayê*
*De tu bı xayinti derbeki beri bedena Şêx Roni nede!*
*Bıra çend saleka lı ber sebra herçar malê me*
*/şêxlera bımine...*

*Heyla hayê, heyla hayê*
*Wezê nemınım lı dunyayê...*

Institut kurde de Paris

## Lı diharê zozanê sılê

Evdal, tevi gundiyan bı kawrani dıçe kêşa Diyarbekrê ji. Dı wê rêwitiyê da rasti qiz û bûkên bedew tê, jı wan ra kılaman dıbêje. Lı Zozanên Sılê qizeke bedew dıbine û kılameki dawêje ser wê.

### Hayê Lı Mın (*)

*Hayê lı mın, hayê dılo...*
*Mınê lı diharê Zozanê Sılê*
*Şalûr hat bû mêvanê gulê*
*Jı sıbê hetani êvarê tew-tew dıkır,*
*Bı dozde awaza dıgo, lebê-belê*
*Awırê çavê vê teresê, teres-bavê*
*Fenani topek jı topê Kurd Elo paşa*
*Merıv dayne Çiyayê Qerejdaxê*
*Bıgrê bavê Bırca vê Musılê*

***** Ev kılama bı sıtrana Emerê Zeynıkê nebyê Evdal) û Şakro ye.**

Institut kurde de Paris

*Xudê merıva neke tora te sêrbazê, te gawurê*
*Mina bı gulla topê bırindar be*
*Jı sıbê heya êvarê jı ber bırina xwe bıdılê...*

*Heyla hayê lı mın, hayê dılo*
*Heyla hayê lı mın, hayê weylo...*

*Heyla dılo, tu bı şevê-royê dıqiri, çıma qe nawesti*
*Minani qulıngê Serhedê jı refê xwe qetyayi*
*Serê baskê te bı çamûr e, koka baskê te şıkesti*
*Ezê iro dıkım herım zozanê mala bavê muhuba xwe,*
*Geli gundino, ez nezan ım, ez xerib ım,*
*Nızam zozanê mala bavê delalya mı*
*/maye lı kijan ali, kijan desti*

*Heyla hayê lı mın, hayê dılo*
*Heyla hayê lı mın, hayê weylo...*

Institut kurde de Paris

# Evdal û Gulê

Salên Evdal, ku nêziki çılî dıbın, lı wê hêlê tu dengbêj êdi cul'êt nake ku pê ra bıkeve lecê. Gellek dengbêjên bı nav û deng, dest lı ber wi datının.

Lı Kela Elajgırê (Topraqalê) dengbêjeke Surmeli Memed Paşa hebûye, navê wê Gulê bûye. Gulê qiza keşişê Fılla bûye. Ev ji dı dengbêjyê da pır zirek bûye û wê jı kesi ra nav nehiştıbûye. Gulê qizeke ezep bûye. Ewê ehd kırıye, gotiye: "Kê ku dı dengbêjyê da jı mın zêde be, kê ku dı lecê da jı mın bıbe, ezê wi bıstinım."

Evdal methê dengbêjya Gulê dıbihize û nediti dıbe evindarê wê. Evdal dıfıkıre, qerara xwe dıdê ku here bı Gulê ra bıkeve lecê.

Rojeki Evdal xeberê hıldıde ku lı Xamurê dewet heye, Surmeli Memed Paşa û Gulê hatıne wê dewetê. Evdal radıbe, lı hespê xwe siyar dıbê û berê xwe dıde Xamûrê. Xamûr jı Cemalvêrdi gelleki dûr e, rê zêde dıkşine. Evdal pışti esrê xwe dıgıhine Xamûrê, lê hıneki dıweste ji. Dı dılê xwe da dıbê: "Ez qe xwe beyan nekım, iro bısekınım, westa xwe daynım, roja dınê bı Gulê ra bıkevım lecê."

Evdal ku jı derê diwanê da dıkeve hundur, bala xwe dıdê

Institut kurde de Paris

ku diwan tıji ye, Surmeli Memed Paşa tevi gıre-gırên Kurda û Ermenya lı ser doşegên qutni-qumaş runuşti ne û Gulê jı wana ra dıstırê. Evdal ji bê deng dıçe lı bınya diwanê rûdınê. Dema ku yeki xerib, yan ji mêvanek tê diwanê, Gulê bı kılaman merhebatiyê dıdê.

Dıbê:

*"Lo mêvano tu bı xêr hati*
*Jı ku têyi, kuda dıçi*
*Jı bo çı xızmetê hati*
*Tu bı xêr û sılamet bıçi."*

Evdal bê deng, bê hıs jı xwe ra rûdınê, lê rewşa wi bala Gulê dıkşine. Gulê bı wi teheri merhebatyê dıde Evdal ji. Wê demê Evdal êdi xwe nagrê, dıke qirin û bersiva wê dıdê:

Dıbê:

*"Ez şahê dengbêja Evdalê Zeynıkê me*
*Lı Serhedê qesasê serê şaır û dengbêjê xelkê me*
*Ez ku bıqirım, dengê mınê jı vır here erdê Ecem e*
*Ez jı rêya dûr hatıme, Gulê ez iro mêvanê te me."*

Bı wê gotına Evdal va Evdal û Gulê lı wê derê dıkevın pêsira hev, sê ro û sê şevan bı hevra dıstırên. Gundi-şêni tên hıldışıne wır, tıji ber deriyan, ser xaniyan dıbın, wana guhdari dıkın.

**Gulê dıbê:**

*Evdal tu bı xêr hati jı wıra heya vıra*
*Bejna mı dışxûle minani mûm û çıra.*
*Tu were emê bı hevra bıstırên minani xûşk û bıra.*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**

*Lê Gulê ez hatım Xamûrê lo ha lı tıl e*
*Bejna Gulê tak-rıhan e*



Institut kurde de Paris

*Lı ber avê mina pelga şıl e*
*Gulê bı şêst û şeş awazi dıxûne*
*Xudê dızane, hım şalûr e hım bılbıl e*
*Ezê bı heyrana bejna zırav*
*Wi ci û meskenê ku tu lê*

*Hey can Gulê, hey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayo dêro şima lêni*
*Yel pısiko şiman yêli*
*Espandêro İskendêri... (*)*

**Gulê dıbê:**
*Evdal merûmo, çavê mınê reş ın, reş-bela ne*
*Mınê rojê sê cara bı kılê Subhanê kılda ne*
*Gelle dengbêjê mina te, jı bo mı jınê xwe berdane*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Heyla Gulê ez hatım Xamûrê, lê ha lı hember e*
*Mınê bala xwe dayê, Gulê yeke bejn-zırav e, gerden zer e*
*Mınê sond xwarye bı incila İsa, bı Qurana pêxember e*
*Bı serê sıbê ra Gulê wê boxçê xwe hılde bı mı ra were*

*Hey can Gulê, hey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayo dêro şiman lêni*
*Yel pısiko şima yêli*
*Espandêro İskendêri...*

---

*** Evdal vê nakaratê bı Ermenki dıbêje. Dıbê Gulê ez hatım ser te cengê, lê tu pır xweşıki dılê mın kete te.***

Institut kurde de Paris

**Gulê dıbê:**

*Evdal, xanyê keşişê Xamûrê bı qube ye*
*Govendeke gıran tê da dıgere lı dewsa xwe ye*
*Ew pırsa ku tu dıbêji, jı devê heftê bavê te zêde ye*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**

*Gulê ez hatım Xamûrê, xanyê keşiş bı qube ye*
*Kula xwedê têkeve mala bavê Hanoyê Kose ye*
*Zurnê dıqelêşe, defê dıçırrine*
*Gulê ketye serê govendê lı dû xwe dıgerine*
*Dıl-hınavê Evdalê Zeynıkê pêva dıheline.*

*Hey can Gulê, hey can Gulê...*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayo dêra şima lêni*
*Yêl pısiko şiman yêli*
*Espandêro İskendêri...*

**Gulê dıbê:**

*Bes e Evdal, tu zêde nebêje van xebera*
*Şê û şêbıskê mı ketıne ser qolanê van kembera*
*Ezê gazi gede-gûdê mala bavê xwe kım*
*Wê werın te bıdne ber xencera*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kırıbê Evdal ez heyiri te mam...*


**Evdal dıbê:**

*Lê Gulê ez hatım Xamûrê bina bê tê*
*Ez û Gulê bı hevra çûne nav dewetê*
*Gulê destmal hılda kete sergovendê*
*Gulê qizke pır rındıkê, dılê mı ketê*

*Hey can Gulê, hey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*

Institut kurde de Paris

Bı destnıvisa Selahattin Sarayxanoxlu, secera Surmeli Memed Paşaa




Institut kurde de Paris

*Kudayê dêro şima lêni*
*Yêl pısiko şiman yêli*
*Espandêro, İskendêri...*

**Gulê dıbê:**
*Evdal ez hatım Xamûrê, lı ber palê ha bı cade ye*
*Herçar malê Xamûrê dı ser me da dıxûyên, lı hewale ye*
*Geleka salıx dabûn, dıgon Evdal şaır e, jı şaıra ji zêde ye*
*Mınê bala xwe dayê, Evdal yeki huriki bejn-tûle ye*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Lê Gulê ez hatım Xamûrê lı ber ba ye*
*Ez ketım nav govenda axçika û van harsa ye*
*Ez nakevım heyra heneka, laqırdiya û van pırsa ye*
*Bı êvarê ra Gulê bı taxıma sıng û bera jı mı ra*
*/destûr daye*

*Wey can Gulê, wey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayê dêro şima lêni*
*Yêl pısiko şiman yêli*
*Espandêro, İskendêri..*

Institut kurde de Paris

**Gulê dıbê:**
*Evdal ez hatım Xamûrê wê lı pal e*
*Evdalê Zeynıkê dıgere deri-deri, mal bı mal e*
*Heşa hızûra cımetê, dengê wi mina dengê kerê bı fal e*

*Wey can Evdal, wey can Evdal*
*Kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Gulê ez hatım Xamûrê wê lı mıl e*
*Gulê lı pêşya qiz û bûka dıçe, dı mıl-mıle*

*Zerike baş û bedew e, Gula qiza keşişê Fılle*
*Yeqin dıkım ew jı qalça xwe ya çepê hûr dıkule.*
*Wey can Gulê, wey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayê dêro şima lêni*
*Yêl pısiko şiman yêli*
*Espandêro, İskendêri..*

**Gulê dıbê:**
*Evdal bes e, tu nebêje van pırsa ye*
*Ezê gazi kım Fılla û axçiqa û harsa ye*
*Bıra te bıbın gırêdın lı ber deri, dewsa sa ye*
*Wey can Evdal wey can Evdal*
*Kırıbê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Gulê ez hatım Xamûrê ha lı fêrika*
*Ez ketme nav govenda Fılla û harsa hu axçika*
*Ezê bı heyrana bejna zırav, qolê zêrê ber cênûka*
*Gulê bı serê sıbê ra wê bıde mın destûra zer-memıka*
*Wey can Gulê, wey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayê dêro şiman lêni*
*Yêl pısiko şima yêli*
*Espandêro, İskendêri..*

Institut kurde de Paris

**Gulê dıbê:**
*Evdal, nızam bêjım tu mırtıbi lo mırtıb-baz i*
*Ez nızam bêjım tu cazûyi, yan tu sêrbaz i*
*Jı êvar da tu jı Xûdê-pêxember û ewliya dıki gazi*
*Bawer be tucari tu naghiji wê mexsedê, wi mırazi.*
*Wey can Evdal wey can Evdal*
*Kırıbê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Wey can Gulê, lê Gulê canê*

*Heyla xeber-xweşê mı bı heyranê*
*Şemamoka lı nav bostanê*
*Heyla suravêlka lı nav mêrganê*
*Gulê te ez kuştım bı zarê şırin û bı vê xeberdanê.*

*Wey can Gulê, wey can Gulê*
*İma lêni, ima lêni*
*Kudayê dêro şima lêni*
*Yêl pısiko şiman yêli*
*Espandêro, İskendêri..*

**Gulê dıbê:**
*Evdal tu were destê mı bıgrê, emê herın mala me ye*
*Ezê jı te ra daynım orxan û doşegên qedife ye*
*Ezê jı te ra çêkım bırıncê Qerejdaxê bı sûzme ye*
*Ezê jı te ra çêkım cotek gorê Kurmanciyê dizleme ye*
*Tu ku vegeryayi, jı te pırs kırın gotın ikrama Gulê çi ye*
*Bêje ikrama Gulê jı serê heftê û heft bavê mı zêde ye.*

*Way can Evdal, wey can Evdal*
*Heyla kıribê Evdal ez heyiri te mam...*

**Evdal dıbê:**
*Wey can Gulê, wey can Gulê*
*Bejn-zıravê, wek qamişê devê golê*
*Çavê reş ın bı rengê hubrê*
*Poz-bivılnê jı nıkulê kewê*
*Lê dıxe sura Qetewinê*
*Bayê Sipanê, hewa Bılêcanê*

Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

---

*** Ev kılama jı strana Emerê Zeynıkê (Nebyê Evdal), Beşer Berke (Kurê Nebyê Evdal), Kazoyê Garısya, Evdırıhmanê Mılazgırê û Sadıqoyê Qırımqayê hatye hıldan.***

*Awaz bı awaz dıhejinê.*
*Wey can Gulê, lê Gulê canê*
*Heyla xeber xweşê mı bı heyranê*
*Şemamoka lı nav bostanê*
*Suravêlka lı nav mêrganê*
*Gulê te ez kuştıme.*
*Bı zarê şırin û bı vê xeberdanê*
*Wey can Gulê, wey can Gulê, lê Gulê canê...(*)*

Pışti sê ro û sê şeva Gulê dest lı ber Evdal datine, dıbê: "Evdal haza ku tu şaır i û şaıreki bê emsal i. Ez xweyê pırsa xwe me. Te jı mın bır, heke ku tu qebûl bıki, ezê te bıstinım, lê belê ezê disa lı ser dinê xwe bımınım, ez jı dinê xwe venagerım."

Evdal dıbê: "Gulê tu ji şaıreke pır mezın i. Heta nıha tu kesi lı pêşya mın ewqasi berxwe nedaye. Ez mêrkê zewıcime, bı jın û zar ım. Dinê te jı te ra, dinê mın jı mın ra, herkes bıra dı rêya xwe da here. Tu xûşka mın, diya mın i. Here bıra Xudê mırazê te bı dılê te bıke!"

Institut kurde de Paris

# Evdal dıbe dengbêjê Surmeli Memed Paşa

Pıştî leca Evdal û Gulê, Surmeli Memed Paşa dıxwaze ku Evdal bıbe dengbêjê wi. Evdal hıneki xwe dıgrê, naxwaze. Lewra ewi zanıbiye ku Memed Paşa merıveki bı hêrs û ters e, pê ra derbaskırın zor e. Dıbê: “Paşa xweş be, ez merıveki serbıxwe û destûrdayi me, dengbêjya te jı mın ra zehmet e, tu were ez nıkarıbım jı bınê barê te derkevım.”

Lê Memed Paşa ısrar dıke. Dıbê: “Fılankes tu bı dengbêja mın ra keti lecê û te jê bır, tu ku jı iro şûnda heri cem yeki dınê, ewê jı mın ra bıbe qileke mezın. Tu ku bıbi dengbêjê mın, bı we'da Xûdê be, ez têkıli te û karê te nabım, tuyê lı cem mın disa destûrdayi bi, dılê te ça dıxwaze wusa bıke. Ezê te bıkım rispi xwe û gundeki ji bıdıme te.”

Lı ser wi qewli Evdal dıbe dengbêjê Surmeli Memed Paşa û mala xwe bar dıke dıçe Kela Elajgırê. Topraqele gundeki mezıni kevın bû. Dewleta Osmani jı mêj va wır kırıbû navenda idara wê kêşê.

Pıştî ku Evdal mala xwe dıbe Topraqelê, Memed Paşa gazi dıkê, dıbê: “Evdal mın hım tu kıri dengbêjê xwe, hım ji rispiyê xwe. Jı vır şûnda ezê beri herkesi bı te bışêwırım. Pêwist e ku tu dı derheqê mın û malbata mın da her tışti bıza-

Institut kurde de Paris



**Evdal û Manusa Keşiş**

nıbi. Bav û kalên mın, xızmetên pır muhım jı dewleta Osmani ra kırıne."

"Sultanê Osmani Yavuz Selim, dema ku tê-dıçe ser Şahê Ecem, jı kalkê me yê mezın Çolax Evdi Axa ra xeberê dışine, alikarya wi dıxwaze. Evdi Axa zılameki pır mêrxas bûye û dıkeve xızmeta Sultan Selim, dıbe pêşengê leşkerê wi. Sultan, wi bı sêsıd siyari va pêşta dışine,. Nêziki sinorê Ecem, Evdi Axa û leşkerê Şah hema seqe-seq lı hevdû dıqelıbın. Hayê wan jı hev tunebûye. Leşkerê Şah ji leşkereki pır gıran bûye. Evdi Axa aqılê xwe dışxûline, fût û fênda dıke, lê dıxe wi leşkeri bela-belayi dıke û jı Sultan Selim ra rê vedıke. Paşê ji Sultan Selim bı rıheti dıçe, leşkerê Şahê Ecem dışkênine. Lê dı wi şeri da Evdi Axa ji xeder bırindar dıbe. Mılê wi yê rastê, bı derba şûreki va, dı tanga zendê da jêdıbe. Evdi Axa mılê xwe yê bırindar tine xûşi nav sitıla rûnê qıjılandi dıke, kewê dıdê û tıştek pê nabe.

Pışti serketınê, Sultan Selim gazi Evdi Axa dıke ku xelata wi bıdê. Dema ku Evdi Axa dıçe cem Sultan, naxwaze mılê xwe yê qop rayi Sultan bıde. Jı bo ve yekê; ew, mılê xwe yê seqet davê pıştxwe, dema ku Sultan xelata wi dırêj dıkê; ew ji xelatê bı destê xwe yê çepê jı destê Sultan dıgrê. Sultan hım dıxeyire, hım ji pır bı hêrs dıkeve, dıbê: "Ev çı hal e, ev çı qurreti û pozbılındiye ku axaki Kurda lı ber mın waha destê xwe davêje ser qûna xwê?"

We demê wezirê wi hema derdıkeve pêş, dıbê; "Sultanê mın, hal û mesele ev e." Meselê jê ra dıbêje. Dıbê: "Evdi Axa ne jı ber quretyê, jı şermê nexwast ku mılê xwe yê qop nişani te bıde."

"Lı ser pırsa wezir, Sultan Selim pır dılxweş dıbe û rutba paşatyê dıde Çolax Evdi Axa û wi dıke hukumdarê Bazidê. Paşê ferman dıke, zêrkerên wi jı zêr desteki jı Çolax Evdi Paşa ra çêdıkın û bı mılê wi va dıkın."

"Berya vegerandınê, Sultan xeberê hıldıde ku lı kêşa

Meraşê, Beglıga Zulqadriyan lı pêşya dewletê asê bûye. Sultan, disa jı Çolax Evdi Paşa alikaryê dıxwaze. Lı ser daxwaza Sultan, bırayê Çolax Evdi Paşa Eli İskender Beg dıbe serleşkerê wi, tevi bist hezar esker dıçe Meraşê, serhıldanê dıtemırine, hukmê dewletê lı wır carke dın saz dıke."

"Kalkeki me yê dın, Pırbela Memed Beg jı bo dewleta Osmani gellek caran bı Urıs û Ecem ra şer dıke. Du cara jı Ecem ra, careki ji jı Urıs ra hêsir dıkeve û gellek derd û bela dıbine. Jı bo wê yekê jê ra gotıne, 'Pırbela Memed Beg'"

"Kalkê mın İshaq Paşa lı Bazidê serayeki dıde çêkırın. Dı dema hukumdarya malbata me da, Bazid lı Kurdıstana jorin hım bûye navenda siyasi, hım ji bûye navenda çanda Kurdi. Alımên weki Ehmedê Xani, Mele Mehmûdê Bazidi û gellekên dın, dı medresa Bazidê da xwendıne û ders dane.

"Xulase bav û kalên mın, bı muxlısı gellek xızmetên muhim jı dewleta Osmani ra kırıne, lê dewlet tucari bı wan bawer nebûye. Dı zemanê bırayê mın da, karmendên dewletê dıçın jı Sultan ra fesadyê dıkın, dıbêjın: 'Behlûl Paşa hazıryê dıke, wê lı pêşya dewletê seri hılde û bı alikarya Ûrıs û Ecem va dewleteke serbıxwe damezırine.'"

"Pışt ra, sala 1821'i da walyê Erzurmê gazi bırayê mın Behlûl Paşa kır û ew bıre Erzurmê. Bırayê mın ku dıçe wır, walyê Erzurmê bı fermana Sultan wi dıgrê devêje gırtigehê. Paşê ji paşaki dın dı şûna wi da kırın mutesarıf û şandın Bazidê. Kurda jı malbata me pır hez dıkır. Xelkê, wan kırên dewletê qebûl nekır, beri wi paşayi dan û paşta şandın. Gotın 'Em Behlûl Paşa dıxwazın.'"

"Lı ser wê yekê, dewletê leşker şande ser Bazidê. Wê demê Kurda bı tomeri seri hıldan, êriş bırın ser wi leşkeri û ew jı hev bela-belayi kırın. Pıranya wi leşkeri hate qırkırın, herçiyên mayi ji bı zorê xwê avêtın Erzurmê."

"Mın ji rabû, merıvên xwe yên jêhati hıldan û berê xwe da Erzurmê. Pıştì çendeki me êrışi gırtigehê kır, mın bırayê xwe



Institut kurde de Paris

jı wır derxıst û bı rêketın. Dewlet, bı alikarya serokeşirên Hesena, Sipka û Zırka va pey me ket, lê bı me tıştek nekır. Bırayê mın carke dın hat lı ciyê xwe rûnışt. Wê çaxê dı nav Osmaniyan û Ecem da şer derket, leşkerê Osmaniyan şıkest û paşta kışya. Êdi dewlet ji mecbûr ma, hukmê bırayê mın qebûl kır."

"Paşê, sala 1828'a da dı navbera dewleta Osmani û Ûrıs da şer derket û Bazid kete destê Ûrıs, em ji hatın lı Topraqelê bı cih bûn. Pışti şer ku peyman çêkırın û Ûrıs, Bazid paşta da Romê, êdi Sultan nehişt em vegerın Bazidê. Bırayê mın Behlûl Paşa, disa bı rutba Miri-Mirantiyê bû mutesarıfê vê kêşê. Pışti mırına bırayê mın, dewletê rutba paşatyê neda mın, tenê rutba "Begtiyê" da mın. Ro bı ro ji hükmê mın kêm dıke. Lê xelk guh nade gotın û qerara dewletê, disa minani bav û kalên mın, jı mın ra dıbên Surmeli Memed Paşa. Ango ez ne paşayê dewletê me, ez paşayê xelkê me."

Evdal jı bo wê bûyerê kılama "Lo Miro" derdıxe.

## Lo Miro (*)

*Hayde bavo...*
*Axayo de siyar be*
*Mirê mı siyar be*
*Jı siyara siyareki rındi karibar be*
*Dı ser dêlbujyê Erebi hur da xar be (**)*
*Dı wêrana Deveboynê da xar be*
*Şa-yol lı mılê teyi rastê ye, nêzik e*
*Lêxe, dı Sinega Ezdiya ra*
*Dı Çemçê ra, dı warê Husên Begê da xar be*
*Lı ber derê Guli Cewer Axa*

* ***Ev kılama bı sıtrana Heci Sêvdinê Remedana ye.***

** ***Ereb, navê hespê Memed Paşa ye.***

Institut kurde de Paris

*Axayê Toruna Kose û Husên Begê Çok-Deve* **peya be**
*Fincanek qawe wexwe*
*Bıra lı can û bedena te bela be*
*Bıra jı bona kekê mı zewq û şıfa be*

*Bavo bajo!*
*Axayê mı bajo!*
*Mirê mı bajo!*
*Konaxa kekê mı İran e bajo!..*

*Hay de bavo...*
*Heyla lo miro mı nızanbû dunya ha ye*
*Bego mı nızanbû dunya ha ye*
*Tıli-pêçyê Bavê Evla Begê, Mirê Zırav (*)*
*Temami gı mûm e, gı şıma ye*
*Şane-şûnê Surmeli Memed Paşa pır gellek ın*
*Ajotye Kela Aqısqayê*
*Şûrek avêtye lı devê topa gawır daye*

*Bavo de bajo!*
*Axayê mı bajo!*
*Mirê mı bajo!*
*Konaxa kekê mı İran e bajo!..*

*Heyla lo Miro, Erzurma şewti bı kevır e*
*Wêrana Deveboynê bışewıte lo bı kevır e*
*İro sê ro û sê şevê dûbıryê Ereb temam bû*
*Bınê Bavê Evla Begê Mirê Zırav da şev-xûn lêketye*
*Zin û pûsata weldıgerine*
*Dıkım-nakım teng û bera qe nagıre.*
*Evla Begê bı sê denga kıre gazi*
*Go Surmeli Memed Paşa bavo!*
*Wê jı hal û hewalê me çawa be?*
*Lı kêleka me ya rastê eskerê Romê ye*

---

*** Evla Beg, kurê Memed Paşa yê mezın e.**

Institut kurde de Paris

*Lı paşya me eskerê Heci Usıv Paşa yê Sipıki*
*Sofi Paşayê Heseni, Temo yê Cıbri ye*
*Wê jı hal û hewalê me çawa be?*
*Surmeli Memed Paşa dıgo Evla Beg lawo tu bajo!*
*Ez bavê te me, kılê çavê Eyşan Xanımê me*
*Ez xwedanê şanzde agırê me, lawo tu bajo!*
*Bavê teyê şev-xûnê lı Ereb xe*
*Dı warê Husên Begê ra lêxe*
*Dı Sinega Êzdiya û Çemçê ra derbas be*
*Bı sıbê ra konaxa bavê te Pirkend e...(*)*

*Axayê mı siyar be!*
*Mirê mı siyar be!*
*Jı bo malê dunê ne sefil, ne ji tengezar be*
*Bıra felek bı te ra yar be*
*Nebû bıra çend saleka lı erdê İranê*
*Kafırê Ecem bı te ra neyar be bajo!..*

*Heyla Miro Erzurma şewti wê bı saz e*
*Wêrana Deveboynê bışewıte wê bı saz e*
*Deveboyin lı ser rêya Erzurmê qameye û pê-hevraz e*
*Tıvınga destê bavê Evla Begê qe nasekıne*
*Jı êvar da zare-zar e û gaze-gaz e*
*Evla Begê bı sê denga kıre gazi*
*Go Surmeli Memed Paşa bavo,*
*Wê jı hal û hewalê me çawa be*
*Lı kêleka me ya rastê eskerê Romê ye*
*Lı paşya me eskerê Heci Usıv paşa yê Sıpıki,*
*Sofi Paşayê Heseni, Temoyê Cıbıri ye*
*Lı xana Çerkeza, bı me ra hûre-hûr e, gaze-gaz e*
*Ewê jı hal û hewalê me çawa be?*
*Surmeli Memed Paşa dıgo Evla Beg lawo tu metırse*
*Ez bavê te me, kılê çavê Eyşan Xanımê me*

---

*** *Pirkend bajareki İranê ye û nêziki sinorê Romê ye.***

Institut kurde de Paris

## Memed Paşa gundeki dıde Evdal

Evdal ku mala xwe bar dıke dıçe Kela Elajgırê, êdi jiyana wi bı ya Memed Paşa ra tê gırêdanê. Memed Paşa jı Evdal pır hez dıke û tucari bêxatırya wi nake.

Rojeki Memed Paşa gazi Evdal dıke, dıbê: "Evdal tu hım bûyi dengbêjê mın, hım ji bûyi rispiyê mın. Jı te ra ji idare pêwist e, mın gundê Bêdır da te û qeyda wi wergerande ser te. Here bı gundiyan ra bıryara xwe bıke."


Evdal dıbê: "Paşa, ez mêrkê dengbêj ım, axatiya gundan jı mın ra nabe." û wê qerara Memed Paşa qebul nake.

Paşê ku Memed Paşa pır ısrar dıke, Evdal dıçe Bêdır, bı gundiyan ra xeberdıde. Jı wan ra dıbê: "Geli bırano, ez mêrkê dengbêj ım, jı vê rojê şûnda axati jı mın ra nabe. Ez têkıli we û erdê we nabım û tıştekı ji jı we naxwazım, hun di-sa minani berê erdê xwe hıldın û daynın. Hema tenê wê axpi-na lı ber gund jı mın ra bajon, sal bı sal nanê wê jı mın ra bı-şinın, besi mın e."

Gundi pır kêfxweş dıbın, tenê wê axpinê jı bo Evdal dajon û nanê wê sal bı sal jê ra dışinın.



Institut kurde de Paris



Evdal û Şêx Sılê

*Ez xwedanê şanzde agırê me*
*Bavê te yê şev-xûnê lı Ereb xe*
*Bı sıbê ra qonaxa bavê te xaylaz e...*

*Axayê mı siyar be*
*Mirê mı siyar be*
*Jı siyara siyareki rındi karibar be*
*Jı bo malê dunê ne sefil, ne ji tengezar be*
*Bıra felek bı te ra yar be*
*Nebû bıra çend saleka lı erdê İranê*
*Kafırê Ecem bı te ra neyar be, bajo!..*

# Evdal û qiza keşiş

Evdal dı dema bıharan û dawya havinan da jı Memed Paşa idestûrê dıstine, dıçe lı nav gel dıgere. Rojeki Evdal dıçe Qereçoban a Xınûsê. Qereçoban gundê Fılla (Ermenya) bûye. Lı gund dewet hebûye, Evdal dıçe nav dewetê. Bala xwe dıdê ku qiz û bûkên Fılla govendê dıgerının. Bı navê Manûsê qizeke keşişê Fılla ya bedew ji lı wêderê bûye. Dema ku Evdal ji dıkeve govendê, bı wan ra dıreqıse, keçık qırfê xwe pê dıke. Keçkê nav û dengê Evdal bıhistıbûye, lê nızanıbûye ku ew Evdalê Zeynıkê ye. Evdal dı govendê da çend kılaman davêje ser Manûsê, paşê jı govendê derdıkeve, lı pêşberi qiz û bûkên Fılla rûdınê û kılameki dıbêje.

## Lê axçik canê (*)

*Wey de lê lê, heyla lê Axçik were!*
*Ezê bı Kurmanci dıbêm axçik were!*
*Bı Tırki dıbêm gel, tu vegere!*
*Bı Farısi dıbêm xeel!*
*Bı Erebi dıbêm teel!*
*Bı Fılleki dıbêm Ast û wast, yest û karast (*)*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya ye.***

Institut kurde de Paris

*Wey Axçikê ez bı derdê te me.*

*Lê Axçikê ezê hatım Qereçobanê, mı di,*
*/dêra Fılla lı mı sıpi kır*
*Mı di, Manûsa Keşiş jı dêrê derket meşya, sıng sıpi kır*
*Manûsê Incila Isa duxwend, dı nav duayê xwe da hivi kır*
*Herçyê ku bedewya Manûsê dit, dunya berda,*
*/axreta xwe jı bir kır.*

*Heyla Axçik were, Axçik were!*
*Ezê bı Kurmanci dıbêm Axçik were!*
*Ezê bı Tırki dıbêm gel, tu vegere!*
*Bı Farısi dıbêm xeel!*
*Bı Erebi dıbêm teel!*
*Bı Fılleki dıbêm Ast û wast, yest û karast*
*Wey Axçikê ez bı derdê te me...*

*Lê Axçikê wezê hatım Qereçobanê lo lı*
*/mın yan da*
*Manûsa Keşiş jı mal derket, şê û şê-bıskê zırav bada*
*Mı di cotê zer-memıkê Manûsê dı paşlê da xû da*
*Manûs were te bırevinım, tu lı ser dinê Islamê can de*
*Heyla Axçik were, Axçik were!*
*Ezê bı Kurmanci dıbêm Axçik were!*
*Ezê bı Tırki dıbêm gel, tu vegere!*
*Bı Farısi dıbêm xeel!*
*Bı Erebi dıbêm teel!*
*Bı Fılleki dıbêm Ast û wast, yêst û karast (*)*
*Wey Axçikê ez bı derdê te me...*
*Lê Axçikê wezê hatım Qereçobanê ha lı ber avê*
*Manûsa Keşiş mılê xwe hıldaye, çeka dışo*
*/davêje ber tavê*

---

**** Mana vê pırsa Ermenki, "Bı navê Xudê dılê mın kete te" ye.***

*Herge tu jı dinê xwe vedıgeri, tu wi xaçi şûnda bavê*
*Were te bırevinım, bavêm diwana Memed Paşa,*
*Tu destê xwe bıkşine jı xaçê bavê*

*Heyla Axçik were,Axçik were!*
*Ezê bı Kurmanci dıbêm Axçik were!*
*Ezê bı Tırki dıbêm gel, tu vegere!*
*Bı Farısi dıbêm xeel!*
*Bı Erebi dıbêm teel!*
*Bı Fılleki dıbêm Ast û wast, yest û karast*
*Wey Axçikê ez bı derdê te me...*

*Lê Axçikê wezê hatım Qereçobanê wê bı ger e*
*Heyla Manûsa Keşiş de tu rabe bı mı ra were*
*Mınê bı heyrana bejna zırav, çavê belek, ınya kever e*
*Tu ku bêyi, Evdalê bı destê te bıgrê jı xwe ra bıbe here.*

*Herge tu nızani, ez Evdalê Zeynikê şaırê rû dunê me*
*Dengbêjê Surmeli Memed Paşa ez bı xwe me*
*Ezê lı rûbarê dunê welat-welat pır gerya me*
*Heyla Manûsa Keşiş, ezê bırindarê te me.*

Institut Kurde de Paris

## Evdal Axa û Sıncari Talo

Institut kurde de paris

Lı keşa Ebexê (der û dorên Muradiyê) bı navê Evdal Axa merıveki zorker hebûye. Dı navbera wi û Sıncari Talo da neyarti hebûye. Sıncari Talo zılameki pır mêrxas bûye. Evdal Axa, Sıncari Talo dıde gırtın û wi dıbe lı zıncirê dıxe. Destgırtya Sıncari Talo dıçe cem Evdal Axa rıcayê. Keçık jı Axê ra dıbê: "Sıncari Talo berde, pênç bırayê mın henın, wana şuna wi da dil bıgre!"

Evdal, lı ser vê bûyerê kılameki derdıxe.

### Sıncari Talo (*)

*Hay de Evdêêêl... Evdêl, Evdêl, Evdêêêl...*
*Evdêl ez bı qurban hive-hiv e, bı rone*
*Çıra konê reş i ereb i jı êvar da dışxule*
*Ez rebena xûdê nızanım mûm û meş'el e*
*Nızanım fener e, yan ji fınd û don e*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Roseyê Kopala ye.***

*Evdali jı mala Evdêlo, tuyê Xudê dıhebini*
*Qeyd û zıncirê te gıran ın*
*Sıncari Talo bıde xatırê mı rebenê*
*Lıngê mı qerımi jı çûyin û hatınê*
*Çevê mın kor bûne*
*Destê mı jı êvarda qerımi lı ser şırıta kon û deri*

*lo yemaan...*
*Lo yeman yeman, lo yeman*
*Lı dunyayê bı sed yeman...*

*Hay de Evdêêêl... Evdêl, Evdêl, Evdêêêl...*
*Evdêl dı ber me ra dıkışe Çemê Payê leme-lem e*
*De tu izna mı bıde, ezê iro herım ditına Sıncari Talo*
*Bı maqûli, bı letifi ez pepûkê gaveki rûnêm lı cem e*
*Heyla Evdali jı mala Evdêlo, qeyd û zıncirê te gıran ın*
*Sıncari Talo bıde xatırê mı rebenê*
*Mın û Sıncari Talo, tev sırgûn ke*
*Aliki me Rom e, yek Ûrız e, yek Ecem e*

*lo yemaan...*
*Lo yeman yeman, lo yeman*
*Lı dunyayê bı sed yeman...*

*Hay de Evdêêêl... Evdêl, Evdêl, Evdêêêl...*
*Evdêl, Çemê Payê tê ser me da gure-gur e*
*İro çend roj e çavê mı bı Sıncari Talo neketye*
*Wezê dıkım herım ditına Sıncari Talo*
*Mirata Çemê Payê kûr e*
*Rê nade mı me'rûmê, ne qam e, ne delav e, ne buhur e.*
*Evdêli jı mala Evdêlo, qeyd û zıncirê te gıran ın*
*Tuyê Xûdê dıhebini, Sıncari Talo bıde xatırê mı rebenê*
*Qeyd û zıncirê te hesınê xam ın*
*Ez dıtırsım wê lıngê Sıncari Talo bıbıre*

*lo yemaan...*

Institut kurde de Paris

*Lo yeman yeman, lo yeman*
*Lı dunyayê bı sed yeman...*

*Hay de Evdêêêl... Evdêl, Evdêl, Evdêêêl...*
*Evdêl de tu rabe lı ser Çemê Payê pıreki çêke*
*İro ev çend roj e çavê mı bı Sıncari Talo neketye*
*Ezê dıkım iro herım dîtına Sıncari Talo*
*Jı bo rê û dırba mı rebenê*
*Cotek keyırê mermer bine lı ortê ke*
*Qeyd û zıncirê te gıran ın*
*Sıncari Talo berde jı qeyd û zıncira*
*Pênc bırayê mı hene*
*Bı destê her-pênc bırayê mı bıgrê bine dı dewsê ke*
*Hay de Evdêl, rê û dırbê mı me'rûmê dûr ın*
*Sıncari Talo bıde xatırê mı rebenê*
*Wi berde jı qeyd û zıncira*
*Mı dı nav heval û hogıra da bı dılê mı rêke lo yemaaan...*
*Lo yeman yeman, lo yeman*
*Lı dunyayê bı sed yeman...*

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut Kurde de Paris

# Evina Memed Paşa

Sê jınê Surmeli Memed Paşa hebûne. Ew ji minani hemmû axa û begên Kurda ku kuda dıçe çavên xwe lı qiz û bûkan dıgerine. Dılê wi û qizeki dıkeve hev, lê ew qizkê nastine. Keçık jı bo paşê bengi dıbe, jê ra xeberê dışine, dıbê: "Bıra xazginyê xwe bışine, mın jı xwe ra bıxwaze."

Evdal lı ser evina wê keçkê kılameki derdıxe.

## Ezê jı teyra teyreki hur ım (*)

*Axao, ezê jı teyra teyreki hur ım*
*Per û baskê mı weşyane*
*Nıkarım lı ser Sûra Diyarbekırê pê bıfırım*
*Kese tunê xeberê bıde Bavê Evla Begê, Siyarê Ereb.*
*/Mirê Zırav*

---

** Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garisya û Heyder Aras e.*

*Tê mı dıxwaze, bıra bê mı bıxwaze*
*Herge mı naxwaze, xazginyê mı gellek ın,*
*/muşteryê mı pır ın*

*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar*
*Dılo yar yar, yar felekê...*

*Axao, ezê jı teyra teyreki reş ım*
*Per û baskê mı weşyane*
*Nıkarım lı ser Sûra Diyarbekırê pê bımeşım*
*Kese tune xeberê bıde Bavê Evla Begê, Siyarê Ereb,*
*/Mirê Zırav*
*Tê mı dırevine, bıra mı bırevine*
*Herge mı narevine, xazgingê mı pırın, bist û şeş ın.*

*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar*
*Dılo yar yar, yar felekê...*

*Axao, ezê jı teyra teyreki per-sıpi me*
*Kese tune xeberê bıde Bavê Evla Begê, Siyarê Ereb,*
*/Mirê Zırav*
*Destê mı lı tu kar û emeli nagere, ez bengi me*
*Xazginyê mı pır ın, dılê mınê bı kul û bı bırin e*
*Evdalê Zeynıkê kılama dıbêje-nabêje*
*Tucari derdê dılê mı natemırine...*

*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar*
*Dılo yar yar, yar felekê...*

Institut kurde de Paris

## Nama Tarxanê Qelenyê

Lı İranê dengbêjeki Tarxanê Qelenyê hebûye, navê wi Şêx Sılê bûye. Ew ji mina Evdal şaıreki bı nav û deng bûye. Rojeki jı Serhedê dengbêjek dıçe Qelenyê, dıbê: "Ez dengbêjê Surmeli Memed Paşa, Evdalê Zeynıkê me."

Wana ji nav û dengê Evdal bıhistibûye. Tarxanê Qelenyê dıbê: "Madem tu Evdalê Zeynıkê yi, were bı dengbêjê mın ra bıstırê!"

Ew merıv ku bı Şêx Sılê ra hıneki dıstırê, wanên lı wır dınıhêrın ku yeki lap beredayi ye, ne kılaman baş dızane, ne ji qayde û meqaman.Tarxanê Qelenyê dıgrê nameki jı Memed Paşa ra dışine. Dıbê: "Serê te buxe bı ser te û paşatya te da... Dengbêjê te Evdalê Zeynıkê hate vır, bı dengbêjê mın ra kete lecê. Qet ne dızanıbû bıstrê, ne ji tışteki bêje. Jı yeki mina te ra ne şerm e, tu dengbêjên waha hıldıdi kêleka xwe û kılaman pê dıdi gotınê."

Dema ku name ya Tarxanê Qelenyê hatiye, Evdal lı gerê

Institut kurde de Paris

bûye. Jı Memed Paşa wetrê bı rasti ji Evdal çûye Qelenyê û tışteki wusa çêbûye. Memed Paşa pır dıqehıre, pır hêrs dıkeve û lı bendi hatına Evdal dımine. Çendeki şûnda ku Evdal derdıkeve tê, dınhêre ku Memed Paşa pır bı hêrs e.

Memed Paşa dıbê: "Evdal ev çı hal e, ev çı mesele ye? Te çûye lı İranê, bı dengbêjê Tarxanê Qelenyê ra sıtraye û ez rezil kırıme."

Evdal dıbê: "Xwe acız neke mirê mın!.. Ez ne çûme İranê, ne ji mın bı yeki usa ra kılam gotiye. Dı vi kari da yeqin xeletiyek heye."

Evdal, dı wê gera xwe da kuda çûye, çı kırye, gışki yek bı yek jı Memed Paşa ra dıbêje. Wê demê Memed Paşa ji qani dıbe ku xebera çûyina Evdal a İranê ne rast e, yeki beredayi çûye wır û navê wi xırab kırye.

Memed Paşa dıbê: "Evdal, madem ku usa ye, tu hazırya xwe bıke, here İranê, bı dengbêjê Tarxanê Qelenyê ra bıstırê û were!"

Evdal hazırya xwe dıke, Memed Paşa jı Tarxanê Qelenyê ra nameki dınıvise, gazi rispiyê xwe Emerê Heci İso û yeki dın dıke, namê dıde wan û wan û Evdal bı hevra dışine İranê.

Memed Paşa dı namê da dıbêje: "Ew tıştên ku te dı namê da gotıne, ne rast ın. Dengbêjê mın Evdalê Zeynıkê nehatye wır. Yeki dınê dı reşê wi da hatye wır û jı we ra derew kırye. Pırsên te lı mın pır qar hatın. Jı bo vê yekê, ez dengbêjê xwe Evdalê Zeynıkê tevi du merıvên xwe dışinım. Evdalê bê, bı dengbêjê te ra bıstırê. Te ku dengbêjê mın guhdari kır, dı derheqê wi da fıkra xwe jı mın ra bınıvisine!"

Evdal û herdu merıvên Memed Paşa dıçın Qelenyê, lı mala Tarxanê Qelenyê dıbın mêvan. Evdal nama Memed Paşa derdıxe dıde Tarxan. Ew ji xeberê dışine, hemmû gıregırên wê kêşê tine lı diwana xwe kom dıke. Pıştra Evdal û Şêx Sılê dest bı kılaman dıkın, heft ro û heft şeva bı hevra dıstırên.

# Evdal û Şêx Sılê (*)

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaaan...*
*Lo yeman lo yeman lo lo yemaaan...*
*Evdal go Şêx Sılê Didem e, jı dılê mı ra xweş Didem e*
*Çemê Didemê dı ber me ra dıkışe leme-lem e*
*Mınê lı Turkiyê sê wilayet lı pışt xwe hişti ye*
*Ezê jı boyna Şêx Sılê hatıme welatê Ecem e*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yeman*
*Lo yeman lo yeman lo lo yemaaan...*

*Şêx Sılê go: Evdal ku ez heme, ez Şêx Sılê me,*
*Dengbêjê Tarxanê Qelenyê me*
*Ez kela lı deştê me, mıja lı rûyê behrê me*
*Lı dunyayê ez beloqê ber çavê dengbêjê xelkê me*
*Lı vıra ez iro qesasê serê Evdalê Zeynıkê me*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman wey zemano...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yeman*
*Lo yeman lo yeman de lo yemaaan...*

*Evdal go: Şêx Sılê Didem e, xweş Didem e*
*Aliki me Urıs e, yek Rom e, yek Ecem e*
*Sıngê mı kıtûka şaır û dengbêja ye, zarê mı qelem e*
*Dawyê da tê bêji Evdal tu hosta yi, ez şagırtê te me*

---

**** Ev kılama bı sıtrana Emerê Zeynıkê (Nebyê Evdalê Zeynıkê), Zıbêtê Emo, Şakırê Bedih (Şakro), Resoyê Kopala, Evdırıhmanê Mılazgırê û Zahıro ye.***

Institut kurde de Paris

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaan*
*Lo yeman lo yeman ax lo yemaaan...*

*Şêx Sılê go: Evdal ezê bı diharê Qelenyê*
*/dıketım ha lı yan e*
*Lı serfêzê xan û man e, koşka*
*/Sılê Musa Axa diwana Tarxan e*
*Dı bınya me da tê dengê gıre-gıra kalûskê*
*/segbavê Eceman e*
*Geli cımaetê hûn sêr bıkın, iro lı ser serê*
*/Evdalê Zeynıkê bûye ferman e*

*Lo yemaaaan...*
*Lo yeman wey zemano...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaan*
*Lo yeman lo yeman de lo lo yemaaan...*
*Evdal go: Şêx Sılê ezê lı diharê Qelenyê dıketım,*
*/ha lı yali mala*
*İro çend roj e, dı koşka Tarxan da em bı hevra*
*/ketıne gotın û gale-gala*
*Geli cımaetê hûn şahıd bın, ezê iro yeke usa*
*/bınime serê Şêx Sılê,*
*Lı dara dunyayê kesi tışteki usa neanibe serê tu*
*/hogır û tu hevala*
*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaan*
*Lo yeman lo yeman de lo lo yemaaan...*

*Şêx Sılê go: Evdal dılê mınê kela şehrê vê Musılê*
*Şalûr û bılbıl bı hevra runıştın lı bın dara vê sorgulê*



Institut kurde de Paris

*Tu bıstırê awaz bı awaz qayde û meqqamê*
*/Evdalê Zeynıkê*
*Ezê iro jı te ra bıstırêm bı sêsıd û şêst awazê Şêx Sılê*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman wey zemano...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaan*
*Lo yeman lo yeman de lo lo yemaaan...*

*Evdal go: Şêx Sılê jı Helebê berjêr Şam e,*
*/gobeka vê dunyayê*
*Navê mınê bela bûye lı Hemê, lı Heqayê,*
*/jı Musılê hetani Bexdayê*
*Geli cımaetê bıra Şêx Sılê dı hızûra we da jı*
*/mı ra were rayê*
*Şêx Sılê minani kavırê axlêva bıharê westyaye,*
*/lı pey mı nayê*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman lo lo yemaan*
*Lo yeman lo yeman de lo lo yemaaan...*

*Şêx Sılê go: Evdal pırsa te ye Şam jı*
*/Helebê berjêrtır e gobeka dunê*
*Çiyayê Qelenyê hêşin dıkın, sorgul zer bûne, xal ketınê*
*Evdalê Zeynıkê rızqê xwe jı jorê jı Xudê naxwaze*
*Ewi rızqê xwe lı jêrê daye ser axawatê û vê torınê*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman wey zamano...*

*Lo yeman lo yeman, lo lo yemaaan...*
*Lo yeman lo yeman, de lo lo yemaaan...*

*Evdal go: Şêx Sılê ez hatım Qelenyê beri mala wê bı rez e*

Institut kurde de Paris

*Şairo tu berê pırsê dı sıngê xwe da çêke, paşê bêje*
*Herçiyê ku mina Şêx Sılê semyanê wi jı kisê xelkê ye*
*Ew daim dı cımaeta cemêra dı mina peza gêj e.*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman, lo lo yemaaan...*
*Lo yeman lo yeman, de lo lo yemaaan...*

*Şêx Sılê go: Evdal Didem e, jı kula dılê mı ra xweş*
*/Didem e*
*Bıhar e, Çemê Didemê dı ber mera dıkışe, gure-gur e,*
*/leme lem e*
*Ez çıbkım, kal bû me, dıranê mın ketıne, ez ne*
*/hemsalê te me*
*Evdal haza ku tu şairi, tu hostayê mın i, ez şagırtê te me*

*Lo yemaaan...*
*Lo yeman lo welato...*

*Lo yeman lo yeman, lo lo yemaaan...*
*Lo yeman lo yeman, de lo lo yemaaan...*

*Evdal go: Şêx Sılê bejna mı ne kın e, ne dırêj e*
*Minani tak-rıhana lı devê mesila şax davêje*
*Eva heft roj û heft şev e Şêx Sılê bı mı ra kılama dıbêje*
*Geli cımaetê hun bızanbın ku Şêx Sılê şair e û*
*/xweş dengbêj e*

*Lo yeman lo yeman*
*Lo yeman lo yeman*
*Lo yeman de lo lo yemaaan...*

Evdal û Şêx Sılê heft ro û heft şeva bı hevra dıbêjın. Dawyê da dengê Şêx Sılê dıkeve û Şex Sılê dest lı ber Evdal datine. Tarxanê Qelenyê dıqehıre û lı Şêx Sılê hêrs dıkeve.

Institut kurde de Paris

Evdal jê ra dıbê: "Mirê mın, hêrs nekeve! Şêx Sılê dengbêjeki yektaye û şaıreki pır mezın e. Bawer bıke, hetani nıha tu kesi lı pêşya mın ewqasi berxwe nedaye. Tu wiyayi bızanıbe ku dı şaıryê da Şêx sılê jı mın zêdeye, kêm nine."

Tarxanê Qelenyê bı wê xeberdana Evdal va kêfxweş dıbe, radıbe jı wan ra xelatan tine, dıde wana. Pey ra jı Surmeli Memed Paşa ra nameki dınıvisine, dıde wan û wana bı rê dıke. Dı nama xwe da, jı Memed Paşa ra dıbê: "Paşayê delal, mın xeletiyek kır, bıbaxşine. Dengbêjê te Evdalê Zeynıkê hat bı Şêx Sılê ra sıtra û jê bır. Evdalê Zeynıkê şaıreki pır mezın e û ez bawerım ku yeki usa heta nıha nehatye Kurdıstanê. Haza ku Evdal şaır e, dengbêj e, haza ku ew layiqi yeki mina te ye."

Pışti leca Evdal û Şêx Sılê, kılama leca wana dı zemaneki kurt da lı hemmû deverên Kurdıstanê bela dıbe û jı yalê dengbêjan da tê gotın.

Institut kurde de Paris

# Rêwitya Nexşiwanê

Pêwendiyên Memed Paşa bı axa û begên wê kêşê ra pır baş bûne. Ne tenê axa û begên Kurda, her wusa axa û begên Tırka, Ecem û Ermena ji jı Memed Paşa hez kırıne û pê ra dosti saz kırıne. Begeki Tırkê Nexşiwanê bı Memed Paşa ra kıribatiyê datine, wi teklif dıke dıbe Nexşiwanê. Memed Paşa bı bist û pênc siyari va dıçe, Evdal ji bı xwe ra dıbe.

Dılê Memed Paşa dıkeve bûkeka Tûrkmana, duxe-veduxe, jı xwe ra dıkeve kef û zewqê, qet vegerandınê nayne bira xwe. Çıl û sê rojê mêvantiya wan dıqede. Ewên ku bı Memed Paşa ra çûne, bala xwe dıdınê ku xema paşê nine, niyeta wi ya vegerandınê ji tuneye. Gıre-gırên Memed Paşa jı wê mêvantiya dırêj pır acız dıbın, lê jı tırsa newêrın tışteki jê ra bêjın. Lı hev dıçın-tên, dıqaqıcın, dıfıkırın, dawyê da dıçın bı Evdal ra xeberdıdın. Dıbên: "Evdal, ev çıl û sê rojê me nın em lı vıra nın, Paşa jı xwe ra ketye eşq û zewqê. Çavên zar û zêçên me ji nıha lı rê mane. Ancax tu dıkari jı me ra rêyeki bıbıni, viyayi jı vır raki. Tu lı cem wi destûrdayi yi, em bextê te da ne!.."

Evdal jı wan ra dıbê: "Ezê jı derdê we ra çare bıbinım, ezê viyayi rakım, lê her yek jı we, hûnê yek zêri bıdne mın."

Gıre-gır dıbên: "Evdal tu viyayi jı vır rake, hema tu çı dıxwazi emê bıdne te."

Berêvarê dema ku cıvata Memed Paşa tê lı dora wi kom dıbe, Evdal dest davêje guhê xwe û vê kılamê dıbêje:

Institut Kurde de Paris

# Mınê Lı Hafa Nexşê Nexşiwanê (*)

*Hayde dılo yar yar, dılo yar yaaar...*
*Heyla dılo yar yar, dılo yar yaaar...*
*Heyla Axao, mınê lı hafa nexşê vê Nexşiwanê...*
*Şıvana pezê mala bavê delalya mı berdaye*
*/rasta vê Heranê*
*Bı salıxa lı Kela Elajgırê govendek dıgere lı ber eywanê*
*Gırmina def û zurnê ye, Eyşan Xanım kety*
*/ nava govend û dilanê (**)*
*Destmalek hıldaye, govendê lı pey xwe dıkşine*
*/ koşê vê diwanê*
*Hey de dılo yar yar, dılo yar yar*
*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar...*
*Yar felekê...*

*Axao, tu were ber bayê nefsê nekeve, nefs çetın e*
*İro çıl û sê rojê me temam bû, em lı vıra ne*
*Ewrê reş baran e*
*Ewrê sıpi zıvıstan e*
*Çavê cote xanımê teyi lı malê, lı rê man e*
*Merıv ku çeka xelkê lı xwe ke, ro û dan e*
*Merıv ku lı hespa xelkê siyar be, yek-meydan e*
*Merıv ku bıbe maşûqê jına xelkê, yek-ramûsan e*
*Minani maleke ku merıv şeveki lê bıbe mêvan e*

*Hay de dılo yar yar, dılo yar yar*
*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar...*
*Yar felekê...*

*Axao, mınê lı hafa nexşê Nexşiwanê, sıbe ye bina bê tê*
*Şıvana pezê mala bavê delaliya mı berdaye*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya û Heyder Aras e.***

** ***Eyşan Xanım jına Memed Paşa ye.***

Institut kurde de Paris

*/ser mexela û pûtê*
*Bı salıxê salıxdana lı kela Elajgırê dewet e,*
*/dengê defê û zûrnê tê*
*Eyşan Xanım ketye sergovendê dıreqıse,*
*/govend dıkışe lı dû tê*
*Seqırme lê dıxe, çava dıqırpine, berbe xortê lı nav dewetê*

*Hey dılo yar yar, dılo yar yar*
*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar...*
*Yar felekê...*

*Axao, tu were awha neke, dılê mını bı deman e*
*Havin derbas bû, payiz e serê isnagan e, êl e gıran e*
*Eva çıl û sê roj e, em lı hıdûdê İranê lı ber Ava Reş mane*
*Tu çadıra xwe rake, jı vê wezyetê bıbe poşman e*
*Ewrê reş baran e*
*Ewrê sıpi zıvıstan e*
*Tu rabe, siyar be, çavê cotê xanıma lı rê mane*

*Merıv ku çeka xelkê lı xwe ke, ro û dan e*
*Merıv ku lı hespa xelkê siyar be, yek-meydan e*
*Merıv ku bıbe maşûqê jına xelkê, yek-ramûsan e*
*Minani maleke ku merıv şeveki lê bıbe mêvan e*

*Hay de dılo yar yar, dılo yar yar*
*Heyla dılo yar yar, dılo yar yar...*
*Yar felekê...*

Institut kurde de Paris

Wexta ku Evdal kılama xwe xılas dıke, Memed Paşa serê xwe ber xwe da xar dıke, demeki usa dımine.

Xofeke mezın dıkeve hundurê gıre-gıran, ew ji usa bê deng bihna xwe dıgrên û lı benda Memed Paşa dımının. Dı dılê xwe da dıbên: "Meyeke ça kır... Jı rûyê me da Evdal jı Paşê ra ew pırsên gıran gotın, yeqin ewê lı Evdal bê xezebê û wê tışteki bine serê wi."



**Lı Nexşiwanê dılê Memed Paşa dıkeve bukeka Tırka**

Demeki şûnda Memed Paşa serê xwe bılınd dıke, çavên xwe lı cımaeta xwe dıgerine û awha dıbêje: "Geli cımaetê we gotına Evdal bıhist, Evdal rast dıbêje, pırsa wi ye... Mın xeleti kır, rabın xwe hazırkın, emê bı rêkevın"

Gıre gırên Memed Paşa pır şadıbın, radıbın zû-zûka hazırya xwe dıkın, bı Paşê ra dıdın ser rê û têne Elajgırê.

Institut kurde de Paris

# Fermana Xozanê

Sultanê Osmani, dı serê bıhara 1865'a da jı Memed Paşa ra fermaneki dışine. Dı Fermanê da dıbê: "Lı kêşa Edenê malbata 'Kozanoxlu' jı mêjva lı pêşya dewletê asê bûye, serkêşyê û eşqiyatyê dıke. Hetani nıha dewletê xastiye ku vê pırsgırekê bı aşiti hel bıke û jı bo vê yekê gellek caran şiret lı Kozanoxlu kıriye, lê wi tu cari guh nedaye şiretan. Dewleta Eli Osman qerar dayê ku vê k'norê jı holê rake û hukmê zagona şerieta Muhemed û hukmê dewletê jı nû va saz ke."

"Jo bo vê yekê, bı navê 'Fırka-i İslahiye' hêzeke leşkeri hate damezırandın. Ev hêz 15 taxbûrên peya û 2 alayên siyari ne. Taxbûreke nizami ji wê jı Giridê here tevi vê hêzê bıbe. Serleşkerê vê hêzê qehremanê Rumeliyê Dewrêş Paşa ye. dı bın fermandarya wi da zabıtên jêhati û mêrxasên weki qehremanê Şerê Qırımê Kurt İsmail Paşa, Mirliwa Hasan Paşa, Serleşkerê Helebê Seyid Paşa, Mirliwa Husni Paşa û Yaver Paşa nın."


"Ça ku tê zanin malbata we jı seri da hetani roja iroyin jı dewleta Eli Osman ra hızmetên muhim kırıne. Dı çavê dewletê da qedrê te ji her wusa pır bılınd e. Jı bo vi kari, xızmeta te ji pêwist e. Tu gera jı nav Kurdên wê kêşê qasi çarsıd siyari berhev ki, dı demeke kurt da hazırya xwe temam ki, bıkevi rê û heri lı kêşa Edenê xwe bıghini Dewrêş Paşa."

"Serokê Gurciyan Aslan Beg ji wê jı kêşa Sariqamişê bı refek siyarên Gurci û Çerkez va here ser Xozanê."

"Beri rêketına xwe, tu wali-paşayê Erzurumê agahdar bı-



Institut kurde de Paris




**Fermana Sultanê Osmani, ya ku jı kalkê Surmeli Memed Paşa ra şandiye.**

Dı fermanê da tê gotın ku, Karya Qarawanqê ya buhayê wi 20 hezar akçe ye û gırêdayi Sancaxa Qaxızmanê ye, hatye dayin bo kalıkê Surmeli Memed Paşa.

Institut kurde de Paris

## Rêya çûyin û vegera Xozanê




Institut kurde de Paris

ke, ewê jı bo rêwityê alikariya te bıke."

Memed Paşa, gıre-gır û rispiyên xwe top dıke û bı wana dışêwıre. Pıranya wana dıbên: "Neçe!"

Evdal û jına wi ya mezın Eyşan Xanım ji dıbên "Neçe!"

Eyşan Xanım dıbê: "Dewleta Eli Osman, zûda ye ku jı vê malbatê hez nake, bı me ra neyartiyê dıke. Ev dewleta hewceyi çend siyarên te nine, dıxwaze ku te bıbe bıke tomıkeki û tışteki bine serê te."

Memed Paşa dıbê: "Neçûyin nabe. Mana neçûyinê, li pêşya dewletê serihıldan e. Ezê herım, lê ezê merıvên usa bıjbêrım, bı xwe ra bıbım ku, bıra merxasya mın lı her derê deng bıde."

Memed Paşa xeberê dışine der û doran, dı nava çend rojan da pênsıd mêr lı Topraqelê kom dıbın.

Memed Paşa dıpırse û dıde pırskırın, xalên kijanan ku çê û mêrxas bûne, wana hıldıbıjêre. Paşê ji çalaki û siyarbûna wana dıcerıbine û nêziki çarsıd kesi jı nav wan vedıqetine.

Çendeki şûnda ew siyarên bıjare, bı mızraqên xwe va lı hespên xwe siyar dıbın, tên lı pêşya qonaxa Memed Paşa kom dıbın ku bı rêkevın.

Memed Paşa vedıgere ser Evdal, dıbê: "Evdal de dest pê ke, bıstırê, em ji bı rêkevın."

Evdal dest pê dıke waha dıstırê:


## Heyla wayê, heyla wayê...(*)

*Ezê lı diharê Kela Elajgırê dıkevım ha lı beyara*
*Hela mêzekın lı leşkerê qerenizamiyê û lı refê siyara*
*Çarsıd xortê eşiretê berê xwe daye xeribyê*
*Rebê Alemê, Mirê Mira sıhûda wana bışxûline*
*/lı pêş neyara.*

---

*** Ev kılama bı sıtrana Heyder Berke (Kurê nebyê Evdal e) ye.**

Institut kurde de Paris



**Memed Paşa bı siyarên xwe va bı rêdıkeve û dıçın Xozanê**

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Bı sıtrana Evdal va zêre-zêr dıkeve nav jın û zaran, gışk pêva dıgrin.

Memed Paşa vedıgere ser Evdal, dıbê: "Xudê jı te razi, te şêni gışk bı gıri xıstın. Ma em şinê nakın ku tu usa bı şewat dıbêji! Qaydê xwe bıguherine. Wana aş ke ku em ji bırêkevın!"

Evdal qayde dıguherine, dest pê dıke kılamên dın dıbêje. Şêni gıriyê xwe dıbıre û siyar ji bı rê dıkevın. Siyarên Memed Paşa, bı xemlên hespên xwe, bı cılên xwe yên reng bı reng û bı mızraqên (rım) xwe va ku dıkevın rê û dımeşın, jı merıv wetrê mêşeki jı darên rengin bı pê ketye, jı ser erdê dışıqıte û dıçe.

Memed Paşa ku xwe dıghine Erzurumê, wali-paşayê Erzurumê wi baş dıecıbine, û dıke mêvan. Roja sısiyan ji bı nêdıkeve.

Lê beri rêketınê wali-paşa wana teme dıke, dıbê: "Hun ku dı Dêrsım da derbas dıbın, gera baş haci xwe bın, xelkê wi deveri pır hov û asê ye, dıbe ku erışi we bıke."

Memed Paşa dema ku xwe dıghine Dêrsım, dıkeve nav wan çiya û gelyên kûr dıtırse.

Tebiet û insanê Dêrsım tesireke mezın lı ser rûhiyata wana dıke. Evdal, jı rınd û bedewên Dersım ra heyran û hezmekar dıbine û lı ser Dêrsım kılameki derdıxe û dı dema rawestınê da, jı Memed Paşa û siyarên wi ra wê kılamê dıbêje.

## Dêrsım e Xweş Dêrsım e (*)

*Dılêm lo lo, dılêm lo lo, dılêm lo lo...*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*
*Dılêm lo lo, Dêrsım e lo xweş Dêrsım e*

---

**** Ev kılama bı sıtrana Emerê Zeynıke (Nebyê Evdalê Zeynıkê) û Şakırê Bedih (Şakro) e.***



Institut kurde de Paris

*Avên çeman û kanyan tên ser me da gıme-gım*
*/û zıme-zım e*
*Ezê lı Dêrsıma jêrin rasti sê zerya hatıme*
*Yeka Tırk e, yeka Kurmanc e, yeka Ecem e*
*Bextê we da me bırano, wana bı avırê çava ez kuştıme...*
*Dılêm lo lo, dılêm lo lo*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*

*Mınê bala xwe berdayê, yanga jê dı Tırk e*
*Cotek kondırê Intabê dı lınga da, dı ber mı ra dıfırıke*
*Sol û mesê vê teresê teres-bavê dı lınga da çırk e-çırk e*
*Dest davêje dêmê reş-gulya, dı ser mılan da wer dıke*
*Ezê dıkım ramûsaneki lı xala gerdenê kerem kım*
*Nızam çıma bımıra xiyal û xem e, bı kin û rık e...*
*Dılêm lo lo, dılêm lo lo*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*

*Ezê bı sura sıbê ra çûme cem yanga Ecem e*
*Yeke bejn-zırava navık-qendil e, bı xiyal û xem e*
*Mınê bala xwe dayê, dı ser mı da gure-gur û leme-leme*
*Mı di teres-bavê jı wêda tê, qutya derd û kula tev lı cem e*
*Ezê dıkım ramûsaneki lı xal û xeta gerdenê kerem kım*
*Nızam çıma bı mı ra usa bı kin û rık e, bı xiyal û xem e*
*Dılêm lo lo, dılêm lo lo*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*

*Zerya Kurmanc yeke eni bı deq e, qolê zêra lı seri*
*Dı desta da kopalê zivin, lı ber konê Erebi pez dıda bêri*
*Mınê jê dıpırsi, dıgo keçê kurmalê tu ezep i, yan lı mêr i*
*Dıgo mala te şewıtyo, mı dıgo qey tu mêr i, tu camêr i*
*Mıskinê mêrê mı ne lı mal e, işev tu were*
*/bışkênine zırza dêri*
*Tu şeva xwe dı nav taxıma sıng û berê mı*
*/zeryê da bıbuhêri*

Institut kurde de Paris

*Mı nızanbû tu ne mêr i, tuyê jı mıskinê merê mı newêri*
*Dılêm lo lo, dılêm lo lo*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*

*De dılêm lo lo wey dıl*
*Hay de dılo lo hey dıl*
*Xudê xırab bıke dıli bê dıl*
*Fenani gaki bê werıs û bê cıl*
*Fenani kıraseki qoli bê mıl*
*Fenani xasbaxçeki bê gul*
*Fenani dara bê şalûl û bılbıl*

*Bıra dılê merya bı dıl be*
*Bıra tûrê parsê lı mıl be*
*Bıra tıji garıs û gıl-gıl be*
*Bıra tûrê parsê qul be*

*Bıra parsa ne lı vır be*
*Lı nava welateki gawır be*
*Bıra ser-raxa merıv gûni be*
*Bıra bın-raxa merıv postê jijû be*
*Ber-serya merıv kevır be*
*Xurê merıv keri nanê gıl-gıl be*
*Her bıra dılê merya bı dıl be*
*Heyla dılo hey dıl*
*Dılêm lo lo, dılêm yar yar...*

Institut kurde de Paris

# Lı Xozanê

Institut kurde de Paris

Dewrêş Paşa leşkerê xwe tine lı Osmaniyê bı cih dıke. Memed Paşa û Aslan Beg ji dıçıne Osmaniyê, lı wê derê tevi wi dıbın.

Malbata Xozanoxlu, dı zemanê Selçûkiyan da, jı gundeki dor Intabê bar dıke dıçe lı Xozanê bı cih dıbe. Navê wi gundê wan i berê Xozan bûye, jı bo vê yekê ew malbat bı navê "Xozanoxlu" hatıye naskırın. Lı gor hınek gotınan ev malbata Kurd bûye, lê ku çûye dı nav Turkmenan da maye û bûye hukumdarê wan, bı zeman va Kurditiya xwe wunda kırıye. Hukumdarya vê malbatê ya lı deverên Xozanê, dı dema sazkırına Dewleta Selçûkiyan da dest pê kırye.

Axayên Xozanê (Kozanoğulları) dı zemanê Dewleta Osmani da ji minani hukumdarên serbıxwe bûne, hukmê dewletê nas nekırıne û xerc û bac nedane. Dewleta Osmani,

hetani wê çaxê çend cara ku leşker şandiye ser Xozanê, leşkerê wi lı pêşya Turkmenan şıkiyaye, bı ser neketye û paşta vegeryaye. Wexta ku İbrahim Paşa yê kurê Memed Eli Paşa tê Anadolyê, ew ji leşker dışine ser Xozanê. Leşkerê wi ji bı ser nakeve. Pışti İbrahim Paşa, Dewleta Osmani dı bın fermandarya Memed Paşa yê Qıbrısi (Kıbrıslı Memed Paşa) da leşkereki xurt dışine ser Xozanê, ew ji dışkê û paşta vedıgere.

Axayê Xozanê yê mezın Usıv Axa, dı serê 1800'i da Xozanê dı nav herdu kurên xwe da par dıke, Xozana Rojava dıde kurê xwe yê mezın, Xozana Rojhılat ji dıde yê pıçûk. Bakûrê Osmaniyê, çiyayên serfêza Zulqadriyê (Kadirli) û dorava Çemê Cihanê (Ceyhan), kêşên Xozana Rojhılat bûn û bı pırani Turkmen bûn, Ermeni û eşiretên Kurda ji lê hebûn. Deverên Xozana Rojava ji, erdê navbera Çiyayê Sisê (Kozan) û Çiyayê Eledaxê û dorava Çemê Seyhanê bûn û bı temami Turkmen bûn.

Dewrêş Paşa, hazıryê dıke û bı leşkereki gumrah va êrışê dıbe ser Çiyayê Xozanê. Aslan Beg ji bı dusıd siyarên xwe yên Çerkez û Gurci va pê ra dıçe. Memed Paşa ji dıxwaze pê ra here, lê Dewrêş Paşa wi lı Sisê (Kozan), dıhêle. Lewra siyarên Aslan Begê bı tıvıngên şişxane bûne, siyarên Kurda bı mızraq bûne. Lı çiyê şereki bê eman dest pê dıke, Turkmenên "Ulaşlû" zora leşkerê Dewrêş Paşa dıbın û revê pê dıxın.

Wê demê da siyarên Çerkezan xwe dıghinınê, lı Turkmenan dıxın, wana jı hev tûr û tela dıkın. Peyra leşkerê Dewrêş Paşa dajo ser Turkmenan, fırsendê nade wana û Turkmenan mexlûb dıkın. Paşê Dewrêş Paşa êrışê dıbe ser Xozana Rojava, dı zemaneki kurt da Turkmanên wi deveri ji dışkên, axa û serokên Turkmenan lı pey hev dıçın teslim dıbın.

Êdi leşkerê Dewrêş Paşa lı wan deveran qam dıbın, Turkmenan dil dıgrên û qefle bı qefle wana dışinın sırgûnê. Dewrêş Paşa û Kazasker Ahmed Cevdet Efendi (Paşa), bı wi

Institut kurde de Paris

teheri çıl-pênci hezar kesi jı ci û warên wan derdıxın û dışinın hêla Çukurovayê, Helebê, Diyarbekırê,Qeyseryê û Bursayê.

Şaırê Turkmena yê bı nav û deng Dadaloğlu ji wê demê lı cem Axayê Xozanê bûye. Ango şaırê Turkmena yê bı nav û deng Dadaloğlu û şaırê Kurda yê heri mezın Evdalê Zeynıkê pêşberi hev, lê hayê wan jı hev nabûye.

Dadoloğlu jı bo wê bûyerê awha dıbêje:

*"Ew rojê wê disa bê, disa şerê tevkeve*
*Tıvıngên wê deng bıdın, dawlumbaz wê lêkeve*
*Sultan xweyi ferman be, çiya û banyê me he nın*
*Ki dımre, bıra bımre, saxên me besi me nın."*

Dewrêş Paşa û Ahmed Cevdet Efendi (Paşa), xebera serketınê bı têlgırafê dıdıne Istenbolê. Padışah ji jı wana ra telgırafeki dıkşine, wana piroz dıke û jı bo "Memed Beg" û Aslan Begê rutba paşati û Miri-mirantiyê ferman dıke.

Dewrêş Paşa ku dest bı hazırya vegerê dıke, dı nav leşker da nexweşiya kolerayê derdıkeve. Dı zemaneki kurt da gellek kes telef dıbın. Jı siyarên Memed Paşa ji gellek dımırın, dı nava çend rojan da jı wi çarsıd siyari 40-50 kes dıminın. Wanên ku sax dıminın ji, serê xwe hıldıdın, her yek aliki da dıçe.

Apê Evdal Reso û pısmamê wi Feqi Elyê Piri ji nexweş dıkevın û dımırın. Feqi Elyê piri hım melayê Memed Paşa bûye, hım ji rispiyê wi bûye. Pışti mırına wana Evdal ji jı wır dıqete. Mıhineke Apê wi ya pır jêhati hebûye, navê wê Senem bûye. Evdal dıbê: "Welle, mın xılas ke, eva mıhina wê mın xılas ke."

Evdal lı hespê xwe siyar dıbe, Senemê hıldıde destkêşa xwe û bı tenê dıde ser rê.

Evdal êdi bı şev û ro nasekıne, hespên xwe dajo, dı kêşa Diyarbekırê ra xwe dıghine Gelyê Xerzan. Dema ku hesp dıweste lı mıhinê siyar dıbe, mıhin ku dıweste lı hespê siyar dı-

be, wana dı ber hev da dıguherime û lı rêya xwe dom dıke. Dı Gelyê Xerzan da pêxas û keleşên wi deveri pey Evdal dıkevın, lê xwe pê ra nagıhinın. Senem wi jı ber keleşan xılas dıke û wi bı saxi û sılameti wi tine dıgıhine mala wi.

Jı wi çarsıd siyarên Memed Paşa tenê si-çıl kes dıfılıtın têne malên xwe, ewên dın gışk qır dıbın. Ewên ku çûne Xozanê ji gışk merıvên bıjare û merxas bûne. Xebera mırına siyarên Memed Paşa ku dıçe, welat bı tomeri dıkeve nav şinê û lı ser gel tesireke pır mezın dıke. Evdal lı ser wê bûyerê kılama "Wey Xozanê" derdıxe û wê trajediyê tine zıman. Ev kılama paşê jı yalê dengbêjan da tê guherandın û bı çend cura tê gotın.

Institut kurde de Paris

## Wey Xozanê (*)

*Xozandaxê lê lê lê lı ber topê ye*
*De kalmastê bırano jı bextê mın ra lı ber topê ye*
*Heyla dı bınyê da zarê zara pezkûvyê ye*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Wey dı bınyê da zare-zara pez-kûvyê ye*
*Herçi gava hûnê pırsa Qeymezê Kurmanc*
*/jı mın dıkın (**)*
*De iro sê roj û sê şev e lı Xozandaxa xopan*
*/lı ser kanyê ye*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Xozandaxê lê lê lê geli bırano lı berwara*

---

**** Ev şaxa kılamê bı sıtrana Şeroyê Bıro ye.***

***** Qeymez, jı Intabê Kurdêki Êzdi bûye û xorteki pır jêhati û delal bûye. Dı kılamê da Evdal "Qeymezê Êzdi" gotiye, paşê dengbêjên Kurda yên musluman ew guherandıne, kırıne "Qeymezê Kurmanc".***

*De kalmastê temaşe kın, bextê mın ra lı berwara*
*De iro sê roj û sê şev e tê da têye nale-nala bırindara*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*De tê da tê ye nale-nala bırindara*
*Herçi gava hûnê pırsa Qeymezê Kurmanc jı mın dıkın,*
*De iro sê roj e bı dozde xortê eşirê va bê xwey*
*/ maye ber kolekê dara*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Xozandaxê lê lê geli bırano lı ber fêrika*
*Bı rojê xewa me nayê jı destê germê û germistanê*
*De bı şevê nayê jı destê miratê van wawika*
*Xelkê lı orta meydana Xozandaxê ında kırye*
*/bı tekan û tûka*
*Mın porkura xwedê ında kırye Qeymezê Kurdi,*
*/xortê xweyê gundê ber fêrika*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Xozandaxê lê lê lê geli bırano wê lı mıl e*
*De kalmastê jı bextê mı ra, geli bırano wê lı mıl e*
*Ava Qemesyana şewti bı ser me da gırtiye tê, xule-xul e*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Ava Qemesyana şewti serda gırtyê tê xule-xul e*
*Xelkê lı orta meydana Xozanê ında kırye bı tekan û tûka*
*Mı porkura xwedê ında kırye Qeymezê Kurdi,*
*/siyarê hespê qule*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm siyara...*



Institut kurde de Paris

# Wey Xozanê (*)

*Weyla vê Xozanê lê lê lê lı me yan da*
*Heyla mın di. sımêl reşa palık bada*
*Eyşan Xanımê dıgo Memed Paşa mı jı te ra nego*
*/berê xwe nede Xozanê*
*Jı serê sıbê hetani nivro sêsıd xortê eşirê lı ser pıştê*
*/hespa rıh û can da*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, wey Xozanê...*

*Vê xopana Xozanê bışewıte lı devê dalê*
*Bayê samê anye qıra siyara, mina qıra salê*
*Eyşan Xanımê dıgo Memed Paşa tu berê*
*/xwe nede Xozanê*
*Çarsıd siyarê ku te bıre Xozanê, jê heftê heb*
*/vegerya malê*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, wey Xozanê...*

*Xudê xırab bıke, lı Xozanê tê bayê samê bı awaki*
*Eyşan Xanımê dıgo Memed Paşa neçe Xozanê,*
*/tuyê malê lı me xırabki*
*Herçi gava hûnê suwala siyarên Xozanê jı mın dıkın,*
*Mınê lı Xozanê tevi ewqas siyari sê gul wunda kırye,*
*Jı Dıharê Sultanê Alo, jı Şamya Feqi Elyê Piri,*
*/jı Mısûrya Bavê Xaki*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, wey Xozanê...*


*Heyla şewıtya Xozanê, teyê alik deştê yek zozanê...*
*Heyla wêranê te lı me anye koka egitan û xortanê*

---

**** Ev şaxa kılama "Wey Xozanê" bı sıtrana Resoyê Kopala ye.***

Institut kurde de Paris

Secera Feqi Elyê Piri




Institut kurde de Paris

*Geli bırano ezê pırsa siyareki jı we bıkım*
*Feqi Elyê Piri, Bavê Temo, bırayê mıni axretê kanê*

*Dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, wey Xozanê...*

Institut kurde de Paris

# Mırına Memed Paşa

Dı serê meha Êlûnê da (1865) nexweşiya kolerayê zail dıbe, êdi kes namıre. Dewrêş Paşa jı M.Paşa ra dıbê: "Emê herne Istenbolê, te ji bı xwe ra bıbın".

Wê demê, çadıra Memed Paşa ji lı bınya Sisê (Kozan) lı ber kaniki bûye. Lı cem wi jına wi û çend merıvên wi mane. Lı wi deveri marên mezın, yên weki ejderhan hebûne. Mar, jı bo avxwarınê, berêvaran jı yalê çiyê da dıkışın û têne ser kanyê. Mervên wê kêşê jı Memed Paşa ra dıbên: "Çadıra xwe jı wır rake, hıneki jı kanyê dûrkeve, marên lı te xın."

Memed Paşa dıbê: "Ez çadıra xwe jı vır ranakım. Wê paşê bêjın ku Memed Paşa jı maran tırsiya. Navê mınê xırabe. Bıra mar jı mın bıtırsın."

Memed Paşa dıçe lı ser rê ya maran hendeqeki vedıde, şûrê xwe hıldıde dıkeve hendeqê û lı benda maran dımine. Dema berêvarê, mareki mezıni weki ejdırhayeki, dıkışe ku bê ser avê, Paşa êrişi mar dıke û wi dıde ber şûra. Mar, xedar bırindar dıbe, lê dest lı ber Paşê danayne. Mar poçka xwe



Institut kurde de Paris

davêje, wan dar û ber û kevırên wêderê minani tapaneki rêş dıke, dıqetine tine xarê. Memed Paşa ku xwe davêje hendeqê, poçka wi jê nagrê. Ev û mar bı wi teheri geleki ber hev dıdın. jı ber hendeqê fesala mar lı Paşê nayê û Paşa mar dıkuje.

Xelkê wêderê jı wê cesaret û cul'eta Paşê ra ecêbmayi dımine û disa jê ra dıbêje: "Paşa tu were inat neke, çadıra xwe jı wır rake! Marên waha yên mezın daim cot ın, hevaleki vi mari muheqeq heye, ewê tola hevalê xwe bıstine. Pırsa tolsıtandına maran herkes dızane ku pırseke eyan e, marê hevalê wi, zû-dereng wê were lı te xe. Tu were çadıra xwe rake, jı vır dûrkeve!"

Memed Paşa guh nade wan gotınan û çadıra xwe jı wır ranake. Du–sê roja pey ra, êvareki Memed Paşa dı çadırê da dengê ewte-ewta bonciyê xwe dıbıhize.

Memed Paşa ku guhê xwe dıdê, dınhêre dengê guje-gujeki tê. Şûrê wi dı hıstûna çadırê da dardakırı bûye. Dema ku radıbe, destê xwe davêje şûr, jı nışkê va dıbe şirqin, mar xwe davêje Memed Paşa, wi û hıstûna çadırê dıke yek û xwe lê dıpêçe. Bı lêxıstına mar va şûr jı destê Paşê depeke, dıçe lı ber çadırê dıkeve. Çadıra jına wi nêzik bûye. Jınık ji ku dengê bonci dıbıhize, dıbeze tê çadıra Memed Paşa û wê rewşê dıbine. Paşa deng lı jına xwe dıke, dıbê: "Şûr jı destê mın pekya, waye lı ber derê çadırê ye, zû şûr bine viyayi parxanên mın dı hevra derbas kırın!"

Jınık şûr hıldıde, lê dıxe, fıtlên mar qet qeti dıke û Memed Paşa jı pêça wi xılas dıke. Lê Memed Paşa xedar bırindar dıbe. Mar ku wi bı hıstûnê va dıpêçe û dıgvêşe, pansûyên wi dı hevra derbas dıbın hesınê hıstunê ji dı sıngê wi ra dıçe xarê û sıngê wi qul dıke.

Paşê Dewrêş Paşa û paşayên dın têne ser, doktor tinın bırinên wi dıdın derman kırın. Dınhêrın ku xêra wi tune, Dewrêş Paşa û merıvên wi dıdın ser rê dıçın Istenbolê, çendeki şûnda Memed Paşa ji wefat dıke.

Lı ser mırına Memed Paşa, Evdal kılameki derdıxe.

## Heyla wayê (*)

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Heyla wayê wey dunyayê...*
*Bavê Xanımê, Mirê Zırav jı Kela Elajgırê siyar bû*
*/bı gırani*
*Mınê bala xwe dayê, Mirê Zırav çû jı Bırca Belek rım*
*/hılani*
*Dû Mirê mı ra Mail Xanım û Eyşan Xatûne şineke*
*/gıran dani (**)*

*Memed Paşa lı Zêtka peya bû derê Poxosê*
*/Fılle bı mêvani*
*Mirêm were, mirêm were*
*Felek xayin e tım bê bext e*

*Heyla Miro, ezê çûme Kela Topraqelê ha lı ber kaşa*
*Tıli-pêçyê Bavê Evla Begê balmûmi ne, lı gustila,*
*/lı van qaşa*
*Bejna Têli Surmeli Memed Paşa bejna çeka û xas-qumaşa*
*Bavê Evla Begê Mirê Zırav, lı Ürgûpê bû mêvanê*
*/Eyib Paşa (***)*
*Mirêm were, mirêm were*
*Felek bêbext e, tım xayin e...*

*Roja ku Memed Paşa siyar bû, cotê xanıma şineke*

---

**** Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya ye.***

***** Sê jınê Memed Paşa hebûn. Eyşan Xanım, Maile Xanım û Şerife Xanım. Memed Paşa jına xwe ya piçûk Şerife Xanımê û sê kurê xwe bı xwe ra dıbe Xozanê.***

****** Memed Paşa bı çı teheri çûye "Ûngûpê" nayê zanin. Belki pıştı bırindar bûna wi ew çûye vıra.***

Institut kurde de Paris

/gıran danine
Gotın Sultanê Dewleta Eli-Osman her tım bı Mirê
/me ra xayin e
Kijan gêduka zorê, mala mırınê hebe, Bavê Evla Begê
/lê dışine
Eyşan Xatûnê go, dıtırsım jı iro şûnda çavê me
/Mirê Zırav nebine

Were were, mirêm were
Mirêm were felek xayin e
Heyla hayê, heyla hayê
Heyla hayê, wey dunyayê.

Institut kurde de Paris

# Şerê Çerkezan û Kurên Memed Paşa

Pışti "Fermana Tanzimatê", Dewleta Osmani hınek reformên idari çêdıke. Qaymeqam û qumandarên cendırma dışine "Sancaqan". Dewlet, bı wi teheri dıxwaze ku hukmê axa û began kêm ke û bı zeman va jı holê rake. Jı tırsa Memed Paşa tu kes cul'et nake bıbe qaymeqam û fermandarê cendırmê Kela Elajgırê. Lı kêşa Sariqamişê bı navê Çerkez Omer merıveki pır jêhati û bêperwa hebûye, şeş heb ji bırayên wi hebûne. Çerkez Omer dıbe qaymeqam, bırayê wi yê Husên ji dıbe fermandarê çendırman û têne Kela Elajgırê. Çerkezên merıvên xwe ji dıkın cendırme. Lê Memed Paşa guh nade wana, disa minani berê hukum dıke. Ew û Memed Paşa, bı wi awayi lı ber pozê hev dısekının û lı hev me'neya dıgerın.

Çend rojan pışti mırına Memed Paşa, merıv tên jı Evla Begê ra dıbêjın "lı taxa Çerkezan lı def û zurnê dıxın û şêhnayiyê dıkın."

Evla Beg pır hêrs dıkeve, radıbe dıçe diwana Çerkez Omer. Evla Beg ku jı derê diwanê da dıkeve hundır. Çerkez



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**Kurê Memed Paşa bı Çerkezan ra lı hev dıxın**

Omer jı ber radıbe piya û jê ra hurmet dıke. Evla Beg dıbê: "Omer Beg, bavê mın teze mırye, em hezni ne û lı taxa Çerkezan ji şêhnahiyê dıkın, ev çı hal e?"

Hayê Çerkez Omer jı deweta Çerkezan tunebûye. Çerkez Omer, ber dılê Evla Begê dıde, dıbê: "Bawer ke hayê mın ji vi karê Çerkezan tune, tu bihna xwe teng neke, ezê anıha herım def û deweta wan bıdım sekınandın."

Paşê Çerkez Omer Evla Begê dıde rûnıştandın, jê ra qahwê çêdıke û tine bı destê xwe dıdê. Dema ku ew qahwê vedıxwun, jıneke Çerkez dıreve dıçe taxa Çerkezan, dıbê: "Hûn çı dıkın, çı sekınine!.. Evla Begê êrış bıre ser Çerkez Omer, lê xıst ew kuşt."

Lı ser wê xeberê, bırayên Çerkez Omer Husên Beg û yên dın şûrên xwe hıldıdın û dıbezın. Wê demê ji Evla Beg û Çerkez Omer xeberdana xwe xılas dıkın, radıbın ku derkevın derva. Evla Beg lı pêşyê bûye, Çerkez Omer ji lı dû wi bûye. Husên Beg, lı ber deri rasti Evla Begê tê, lê bırayê xwe nabine. Jı wi wetrê Evla Begê bırayê wi kuştiye û dıçê. Husên Beg şûreki davêje, lı serê Evla Begê dıxe, wi bırindar dıke. Evla Beg ji şûreki davêje Husên Begê û wi dıkuje. Çerkez Omer, hema dı ci da dızvıre, şûrê xwe hıltine û jı para va lı Evla Begê dıxe. Evla Beg hêz dıde xwe, jı erdê radıbe ser çoka û şûreki davêje Çerkez Omer. Çerkez Omer ji dıkeve erdê. Du tebancên "Qerebina" dı bêrıka Evla Begê da bûne, lê wê demê ew qet nayın bira wi. Pey ra bırayên Evla Begê Teyar Beg, Sılêman Beg û Dılo Beg têne hewaryê, ew û Çerkezan lı hev dıxın. Ew ji lê dıxın, pênc-şeş cendırmên Çerkezan dıkujın. Teyar Beg, Sılêman Beg û Dıla Beg ji têne kuştınê.

Pışti şer, Çerkez zû-zûka cınazên xwe û jın û zarên xwe hıldıdın, jı wır dırevın dıçıne Sariqamişê, nava Çerkezan.

Lı ser vê bûyerê Evdal kılama "Evla Begê" derdıxe.

Evla Beg jii du-sê rojan pışti şer wefat dıke.

## Evla Begê Mirê Zırav (*)

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê*
*İro qeda hatye ser belayê*
*Mınê lı derê diwanê bala xwe dıdayê*
*Dengê bavê Evla Begê, Mirê zırav têda nayê*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê*
*Heyla wayê, fani dunyayê...*

*Heyla wayê, heyla Miro, heyla wayê*
*Mınê dınhêri jı diwanê dengê Memed Paşa nayê*
*Eyşan Xanımê dıgo lawo yeqin bavê te êdi paşta nayê*
*Evla Beg hêrs ketiye, jı diwana Çerkez Omer dernayê*
*Cotê şaşegırê Evla Begê dı cêbê da ne, qet dı birê nayê*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Heyla Miro, ezê çûme Kela Topraqelê ber dukanê*
*Ava Kelê tê jı Şagolê, jı çiyê, jı zozanê*
*Eyşan Xanımê dıgo Evla lawo were rûnê lı diwanê*
*Têla bavê te hatye jı Edenê lawo jı Xozanê*
*Lı Xozanê wefat kırye Memed Paşa, Mirê Kurdıstanê*
*Lawo tu were, şina bavê xwe bıke lı vê diwanê*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Kela Topraqelê bışewıte wê lı kef e*
*Qaza û qulunga lı bıntara Kelê gırtiye ref e*
*Kevırê diwana Memed Paşa mermer e, tev sedef e*

---

* ***Ev kılam bı sıtrana Emerê Zeynıkê û Kazoyê Garısya ye.***

Institut kurde de Paris

*Evla Begê dıgo Eyşan dayê, ev sê roj e bavê mı mıriye*
*Lı taxa Çerkeza nızanım ev çı zurne ye, ev çı def e*
*Ezê herım diwana Çerkez Omer, jê ra bêjım*
*/ev jı te ra ne şeref e*
*Heyla wayê heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Eyşan Xanımê dıgo lawo Kela Topraqelê cot-kani ne*
*Ava Şagolê tê bı ser me da berxê lo bı gırmin e*
*Were rûnê lı Bırca Belek, tu lı şûna bawê xwe bımine*
*Berxê, karê te bı dewet û def û zurna Çerkeza tunine*
*Bavê te lı Xozanê wefat kırye, berxê em hezni ne*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Eyşan Xanımê dıgo lawo neçe, mı gelek xewnê xırab dine*
*Ez dıtırsım feleka malşewiti derdê dayka te bı duda*
*/bıgerine*
*Tu were lı Bırca Belek rûnê, şina bavê xwe bıbine*
*Evla Beg cahıl e, vê subengê haci bayê felekê nine*
*Berê xwe dıde diwana Çerkez Omer jı xwe ra dılezine*

*Dıkeve diwanê sılav dıde, Çerkez Omer sılava wi hıltine*
*Çend Çerkezê dınê lı kêleka Çerkez Omer rûnışti ne*
*Evla Beg dıbê Çerkez Omer merhebatya te heram e,*
*/lazım nine*
*Çıma tu nızani bavê mı lı Xozanê wefat kırye, em hezni ne*
*Huseynê birayê te lı taxa Çerkeza bûkê siyar dıke,*
*/defê lêdıxine*
*Çerkez Omer dıbê, Memed Paşa bavê me gışka ne,*
*/bavê te tenê nine*
*Sond û qesema dıxwe, dıbê, hayê mı jı deweta*
*/Çerkeza tunine*
*Çerkez Omer ku radıbe, jı Evla Begê ra xızmetê dıbine*
*Evla Beg dıbê tu mezın i, xızmeta te jı mı ra layiq nin e*

Institut kurde de Paris

*Çerkez Omer dıbê, bo xatırê Memed Paşa xızmeta*
*/mı tıştek nine*
*Tu nebê Çerkez Omer, Evla Begê lı wır dıxapine.*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*


*Eyşan Xanım dıçe ber pencera diwanê, bala xwe ku dayê*
*Dıbine ku Çerkez Omer xeberên, teze hiştine,*
*/yê kewın dıde bayê*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Eyşan Xanım çavê xwe jı Evla Begê ra dıqırpine*
*Çavê Evla Begê lı seri sorbûne, haci xwe tunine*
*Eyşan Xanım dıçe, Teyar-Dılo, herdu kurê xwe dışine*
*Dıbê Teyar lawo, here bırayê xwe jı wêderê rake bine!*
*Jıneka Çerkeza ku wan herdu bıra lı ber deri dıbine*
*Dıbê yeqin hayê Çerkez Huseyin jı wana tunine*
*Kurên Memed Paşa derê diwana Çerkez Omer bırrine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Jınıka Çerkez, berê xwe dıde taxa jêrin dılezine*
*Lı Huseyin Begê, bırayê Çerkez Omer dıke qirine*
*Dıbê, def û zurnê bıhêle, tu vê dewetê bıterkine*
*Kurên Memed Paşa derê diwana bırayê te bırrine*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Jınıka Çerkez dıbê Topraqele bışewıte lı ber çeperê*
*Xudê xırab bıke daweta zawê û bûkê, vê şêzerê*
*Kurên Memed Paşa serê bırayê te jêkırıne,*
*/avêtıne ber sıvderê*
*Te jı dewet darxıstiye, lı def û zurne dıxi, hê*
*/sekiniyi lı vêderê*



**Evdal dı rêda rasti qundaxa zareki tê.**
**Navê Temo lê dıke.**

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Huseynê Çerkez gava ku vê xeberê hıltine*
*Dıkeve pêşya Çerêza, wana berbe diwanê dıkışine*
*Dınıhêre kurên Memed Paşa hê jı deri dûr nebûne*
*Huseynê Çerkez dıbê yeqin xebera jınıkê rast e, xılaf nine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Huseynê Çerkez dıbê Teyar lawo, Topraqele bı cade ye*
*Diwana bavê tê hemû bı kevırê bırri va doşırme ye*
*Bavê te lı Xozanê wefat kıriye, lawo çı xema me ye*
*Çıma tu nızani lı taxa Çerkeza ev çı def e, çı zurne ye*
*Iro dı Kelê da deweta mın û Eyşan Xatuna dêya te ye*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Teyar dıbê Huseynê Çerkez lawo Kela Topraqelê*
*/bı cade ye*
*Ew pırsa jı devê te û heftê û heft bavê te zêde ye*
*Lawo çıma tu nızani, mala we jı berê da*
*Lı cem mala me minani mala Pogosê Fılle ye*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Eyşan Xanım lı derê diwanê dıgıri û dılorine*
*Hêsıra dı ser hınarê nazık da dıbarine*
*Dıbê iro dı Kelê da em bêkes mane*
*Dılşewıtyê berxê mı iro kes tunine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*
*Eyşan Xanım dıbê Teyar lawo nızam ev çiye lı*
*/me peyda bû*

Institut kurde de Paris

*Iro dı Topraqelê da ev çı afate berxê lo lı me rabû*
*Pırsên kure Memed Paşa û Çerkeza lo jı hev derbas bû*
*Bı şirqina qema va, qewzê qema jı kalanan xılas bû*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Evla Beg û Çerkez Omer lı diwanê rûnıştine*
*Evla Beg dıbê yeqin Çerkez Omerê dewetê bıterıkine*
*Jı diwanê derdıkeve, erbeteke gıran bı çavê xwe dıbine*
*Bist mêrê Çerkeza lı ser serê Teyar û Dılo qema dıhejine*
*Evla Beg dıbê, dême Çerkez Omer mı lı vıra dıxapine*
*Evla Beg vedıgere, destê xwe lı çûncıka Çerkez Omer*
*/dışıdine*
*Çerkez Omer davêje ber qema, serê wi jı govde dıqetine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Eyşan Xanımê dıgo Topraqele bışewıte lo cot-kanine*
*Dıbê Evla lawo iro Çerkeza pêşya bırayên te bırrine*
*Teyar bı sê qema bırindar e, tu heyfa bırayê xwe hıline*
*Evla Beg ser Huseynê Çerkez da êrışê tine*
*Huseyinê Çerkez dınhêre, qema destê Evla Begê bı xûne*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Kela Topraqelê bışewıte lı hember e*
*Evla Begê mı jı diwanê derket dere*
*Qema Huseynê Çerkezi hınde gır e*
*Ewqas dırêj e, ewqas ji bı ber e*
*Qeme tûje e, minani axû ya mar e*
*Qemek avête Evla Begê, pır xeder e*
*Evla Begê pê ra qema xwe da ber e*
*Qema dudya ku avête Evla Begê*
*Çûncıka wi reşkır ani ser enya kever e*

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyalê...*

*Eyşan Xanım ku bırina Evla Begê dıbine*
*Hema xwe bı berxê xwe ra dıgıhine*
*Şara xwe lı serê Evla Begê dışıdine*
*Dıbê Teyar lawo, iro xêra berxa jı mı ra tunine*
*Memed Paşa serê xwe daniye, hewara we tunine*
*Dı Kelê da Çerkeza dora berxê mı bırrine*
*Lawo tu heyfa bırayê xwe bı destê xwe hıline*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*


*Gava Teyar bırina Evla Begê ku dıbine*
*Destê Teyar-Dılo, herdu bıra jı hev qetine*
*Teyar, ser Huseynê Çerekez da êrışê tine*
*Huseynê Çerkez qemê ser Teyar da dıhejine*
*Teyar jı ber qema Huseyin xwe paşta dıkşine*
*Qemeki lı ber parxanê Çerkez Huseyin dıxine*
*Dıl-gurçıkê wi bı pozê qemê ra derdıxine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*

*Topraqele bışewıte cot-kani ne*
*Teyar-Dılo bırindar ın, xêra wan tunine*
*Berxên Memed Paşa xwe berbe diwanê dıkışinın*
*Herdu bıra, lı wır emrê Xûdê bı ci tinın*
*Herdu bıra şeş mêrê Çerkeza dıkujın*
*Cınazê Çerkez Omer û Huseyin lı wır dımine*

*Heyla wayê, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê...*
*Eyşanê dıgo te xanımê, mı xatûnê*
*Ûrt û ocaxê me kor bûne lı vê dunê*
*Jı mıra binın vê leganê, vê sabûnê*

Institut kurde de Paris



Evdal jı qulıng ra kılaman dıbêje

Institut kurde de Paris

*Ezê çekê berxên xwe bışom jı vê xûnê*

*Heyla miro, heyla wayê*
*Wey felekê, wey dunyayê*
*Felek xayin e, bı me ra nayê*
***Heyla wayê, te fani dunyayê***

Institut kurde de Paris

## Pıştì mırına Memed Paşa

Pıştì mırına Memed Paşa û lıhevxıstına kurên wi Çerkezan, êdi hukmê malbata wi namine. Evdal ji wê çaxê mala xwe bar dıke dıçe gundê xwe yê berê.(*) Jı axa û begên Kurda gelek jê ra dıbêjın "Mala xwe bine cem me, bıbe dengbêjê me" Evdal daxwaza kesi qebûl nake, dıbê: "Pıştì Surmeli Memed Paşa ez jı keseki ra dengbêjyê nakım."

Wê çaxê Ermeni û Kurd dı nav hev da bûne. Jiyana wana bı sed-salan bı hevra derbas bûye. Jı ber vê yekê erf û edetên wana pır nêziki hev bûne. Hemmû Ermeniyan bı Kurdi zanıbûne û wana dı şêhnayi û dilanên xwe da kılamên Kurdi sıtrane û leyistıne. Keç û xortên Kurda û Ermeniyan ji bûne evindarên hev, lê cudatiya dini hertım jı wana ra bûye asteng.

Wê demê, dılê hekimeki Ermeni dıkeve keçeke Kurda. Dı nav malbava keçkê û neyarên wan da şer çêdıbe û gellek kes bırindar dıbın. Keçık dıçe gazi dılketyê xwe dıke ku ew here ser bırindarên mala bavê wê.

---

** Lı gor gotına kurê nebyê Evdal Heyder Berke, Evdal pıştì mırına Memed Paşa, mala xwe nebırye gundê xwe yê kewın Cemalverdi, bırye Qanciya.*

Institut kurde de Paris

Evdal lı ser wê bûyerê kılama “Hekimo” derdıxe.

## Hekimo (*)

*Weri bê Hekimooo!..*
*Hekim tuyê dinê xwe dıhebini*
*Bese tê dı ser mı da bıki nazi!..*
*De yar yar, yar yar, bıki nazi*
*De tu were melhemeki çêke*
*Jı bırinê bırindarê mala bavê mı ra*
*Jı dûvê hıllıka, jı donê koka dara vê mırcanê*
*Ax bextê te da me eşqerê, jı şirê teyrê bazi*
*Wezê pêşkêşi Hekimê xwe kım*
*Mal û halê dunyalıgê, zêrê serê van pireka*
*Ber destê xudê wad û qırar be, heke qail nebi*
*Boyna xatırê bırindarê mala bavê xwe,*
*Wezê pêşkêşi hekimê xwe kım,*
*Nuxsê zer-memıki qerqaşi-nazi*
*Evdal ım, Evdal ım, Evdal ım...*
*Evdal ım. Evdal ım, neminım...*
*Hekimo bextê te da me*
*Bırindarê mala bavê mı xedar ın neêşine...*

* * *

*Weri bê Hekimo...*
*Hekim tûyê dinê xwe dıhebini*
*Tê qutya dermani hıldi bêyi viyali*
*De tu were melhemeki çêke,*
*Jı bırinê bırindarê mala bavê mı ra*
*Jı dûvê hıllıka, jı donê koka dara vê mırcanê*
*Ax bextê te da me eşqerê, jı şirê teyrê bazi*
*Wezê pêşkêşi hekimê xwe kım,*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Şerayê Bıro û Hemidê Mecid e.***

Institut kurde de Paris

*Mal û halê dunyalıgê, zêrê serê van pireka*
*Ber destê Xudê wad û qırar be, heke qail nebi,*
*Boyna xatırê bırindarê mala bawê xwe*
*Wezê pêşkêşi hekimê xwe kım,*
*Gupkê zer-memıki çarde sali*
*Evdal ım, Evdal ım, Evdal ım...*
*Evdal ım, Evdal ım, neminım*
*Hekimo bextê te da me*
*Bırindarê mala bavê mı xedar ın, neêşine...*

Institut kurde de Paris



**Evdal kor dıbe, Temo destê wi dıgre dıgerine.**

# Temo

Temo yê Egit jı eşira Hesena, jı bavê (mılê) Eshedya bûye. Qebila wana ku lı pêşya dewletê seri hıldaye, jı wana gellek kes hatıne kuştın, qısmek ji hatıne sırgûn kırın. Egitê bavê Temo ji şandıne gırtigeha Sinopê. Temo, wê demê 14-15 sali bûye, lı pey bavê xwe dıçe Sinopê û gellek zehmet û zelûliyê dıbine. Bavê wi ku dı gırtigehê da dımıre, ew ji radıbe dıçe Mılazgırê nav qewmê xwe. Dewlet ku jı wana ra efê derdıxe, malbata Temo disa tê ser rewşa xwe ya berê.

Dema ku Surmeli Memed Paşa dıçe ser Xozanê, gazi Temo ji dıkın. Lewra Temo wê demê bı mêrxasya xwe va deng dabûye. Temo bı bist û pênc siyarê xwe va bı Surmeli Memed Paşa ra dıçe Xozanê. Temo dengbêj bûye ji. Dı rê da ew û Evdal dıbın dost û bı hevra dıstırên. Evdal jı Temo pır hez dıke. Ew ji minani Evdal jı Xozanê sax vedıgere tê.

Wi zemani, dı nav Romê û Ûrıs, Romê û Ecem da çend sala careki şer çêdıbe. Şerên Romê û Ecem minani leyistıka pasteguro bûne. Eşiretên Kurda yên Romê û Ecem, bı hevra dujmıntiyê dıkın, dı ser sinorên dewletan da êrışê dıbın ser hev û hevdu talan dıkın. Ew şerana hıne cara mezın dıbın, jı

Institut kurde de Paris

herdu dewletan leşker ji tev dıbe, erdê hev zeft dıkın û xesarên gıran dıdıne xelkê. Lê ew şerana tu cari nabın weki şerên dewletan yên edeti. Dı wan şeran da ku leşkerê herdu dewletan lı hev dıxın ku şuxul mezın dıbe, perpırsiyarên wana -minani ku hayê paytextên wana qet bı wan bûyeran tûnebûye- tên bı hevra qısedıkın, suc û gunehan davêjın ser berpırsiyarên sinoran û şer tepıs dıkın. Kurdên der- dorên sinoran ji bı xesar û zırarên xwe va dımının.

Dema ku dı nav Romê û Ecem da şerên wusa dertên, xelkê kêşa Wanê, Ebexê, Ercişê, Eledaxê û Bazidê, hema pez û dewarên xwe dıdıne pêşya xwe û berbe rojava dırevın.

Rojeki xeber tê, dıbên: "Rom û Ecem disa bı hevra ketıne şer, leşkerê Romê şıkiyaye, leşkerê Ecem jı sinor derbas bûye, pêda-pêda tê."

Gundiyên Evdal ji terş û hewanê xwe dıdıne pêşya xwe û dırevın. Evdal ji bı wana ra dıçe. Ew ku dı rê da pır-hındıki dıçın, bala xwe dıdınê ku şêni tıji wan rê û dırban bûye, herweki mehşer e. Ça ku dıbêjın "Dê ewledê xwe davêje", ew rewşa ji usa bûye, kes haci kesi tunebûye. Evdal, wê demê dı rê da rasti qundaxa zareke kurin tê. Zarokê hıldıde dıde hemêza xwe, dıçe cem jına xwe. Dıbe: "Eyşê, kurên me dudu bûn, bı wiyayi va bûne sısê. Emê wiyayi jı xwe ra minani ewledê xwe xweyi kın, mezın kın. Gunê mın roja qiyametê lı hustûyê te û dê û bavê te be, tu tucari ferqê nexi nav vi û zarên me yên dın û baş lê bınhêri

Eyşê dıbê: "Hay, hay... Ezê baş lê bınhêrım. Lê em navê wi çı daynın?"

Evdal dıbê: "Ezê navê dostê xwe Temoyê Egit lê kım. Bıra navê wi Temo be. Temo yê Egit ji êtim dımine, belengazyê dıkşine, lê paşê Xudê sıhûda wi dışxuline, wi jı tengasyê xılas dıke û ev dıbe zılameki serdest. Inşella ewê ji mezın be, bıbe yeki wusa."

## Evdal kor dıbe

Temo ku mezın dıbe, heft- heyş sali dıbe, Evdal kor dıbe. Wê demê Evdal dest- teng ji dıkeve û kes guh nadê. Wanên ku berya wexta pê ra dost xûya bûne guh nadnê. Salên wi ji êdi derbas bûne. Ango kali, kori û feqiri bı hevra deri lı Evdal dıgırên û ew jı nışkê va dıkeve nava dunyake rêş û tari. Ew Evdalê ku himi şêhnayiyan, û govendan bûye, minani çıvikeka biyani ya serjêkıri dıkeve qefesa hesıni.

Evdal dıkeve mala xwe, jı hundur dernakeve, bı şev û ro dıke qirin, zarin, êdi jı derdê xwe ra dıbêje û dı lorine. Gundi û cinarên Evdal dıçın lava dıkınê, dıbên: "Evdal, awha neke, tê bıbıeci, jı mal derkeve, jı xwe ra bıgere. Bı sebır be, ew Xudayê ku ev derda daye te, helbet ewê jı te ra deriki veke."

Paşê Evdal jı mal derdıkeve, Temo bı destê wi dıgrê, wi diyar bı diyar dıgerine. Êdi Temo, dıbe dest û lıngê wi, dıbe roniya çavên wi, dıbe sembola wi. Sembola bêkesiyê, xeribiyê, feqiriyê. Evdal bı Temo ra derdıkeve dıgere, dıçe ser şêx û melan, dıçe ser şext û ziyaretan û dıçe malên axa û began. Axırê disa merivên camêr hebûne, ew disa minani berê jê ra hurmet dıkın, qedrê wi dıgrên, lê bı pırani axa û begên Kurda guh nadnê û qedrê wi nagrên. Evdal jı bo wê yekê pır dıqehıre, jı bê wefatiya gel pır bı gazın dıbe.

# Evdal û Qulıngê Baskşıkesti

Bıharê wexta ku erd reş dıbe, qulıng tên, dı Serhedê ra derbas dıbın, berbe bakûr dıfırın dıçın. Dema ku refê qulıngan lı ezman weki xeteke sıpi dıxûyên, gundi-şêni dev jı karên xwe berdıdın, bı dılgeşi wana temaşe dıkın. Ew ku baskên xwe yên belek bı aheng dıhejinın, bı qirin û qûrtina xwe va herweki temaşevanan sılav dıkın. Mızginya bıharê, mızginya rohni, reşi û xweşyê dıdıne wana.

Jı ber vê yekê, hatına qulıngan lı Serhedê bûyereke piroz e û ew dı dılê insanên wê kêşê da pır eziz ın.

Wexta ku qulıng peyayi erdê dıbın, lı çayir û çimenan dıhêwırın, bı hevra dest bı şêhnayiyê dıkın, hetani çûyinê bê rawest dıqınginın.

Careki qulıng ku disa tên, bı wi teheri şêhnayiyê dıkın û dıçın, jı mêrga bınya gund qirina qulıngeki bala Evdal dıkşine. Evdal dıbê: "Qulıng her tım cot-cot ın û ew her tım bı hevra dıqınginın. Qirina qulıngeki bı serê xwe tenê elametê xêrê nine, yeqin tıştek hatye serê wi."

Evdal gazi zarokan dıke, dıbê: "Hela herın mêzekın, çıka çı bı wi qulıngi hatye, ew çıma usa bı şewat dıqire?"

Zar dıçıne mergê, bala xwe dıdınê ku qulıng nafıre, wi

dıgrên, tinın dıdıne Evdal.

## Evdal kor e (*)

*Evdal dıgo Temo lawo bavê te kor e, de wi wi Evdal kor e*
*Ez dengbêjê Surmeli Memed Paşa bûm, kes nabê*
*/kerem ke were jor e*
*De tu rabe bı destê mı bıgrê, mı bavêje ser*
*/Ocaxa Şêx Bekırê Sor e*
*Ew zateki mezın e, bıra gıli-gazınê mı bıbe bıghine*
*/Diwana Rebê jor e*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar...*

*Evdal go Temo lawo bavê te kor e, de wi wi rê nabine*
*Bavê te destê xwe lı deri û diwara, de wi wi dıpeline*
*De tu rabe bı destê mı bıgrê bıbe lı ser şêx û*
*/ziyareta bıgerine*
*Mı hılde bıbe Gogoxlanê, ser Hıstûna Sıpi, ser*
*/Ocaxa Şêx Badin e*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Evdal go Temo lawo payiz e, herkesi tıvdarekê xwe dine*
*Jı mêrgê dengê qulıngeki tê, here mêzeke, yeqin*
*/ew sax nine*
*Ew ji mina bavê te jı refê xwe paşta maye,*
*/wiyayi jı mı ra hılde bine*
*Bıra bavê te vê zıvıstanê bina xwe bı wi qulıngi derine*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar...*

Institut kurde de Paris

---

*** Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya ye.**

*Temo dıçe bala xwe dıdê ku baskê qulıng şıkestine*
*Wi qulıngi dıgrê, jı bavê xwe ra hıldıde tine*
*Evdal destê xwe lı baskê qulıng dıgerine*
*Dıbê lawo, ew ji weki bavê te bûye, jı hevalê xwe dımine.*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, dılêm yar yar...*

Evdal qulıng jı destê zaran dıgrê, dema ku destê xwe lê dıgerine, bala xwe dılê ku baskeki wi şıkestiye. Evdal pır ber qulıng dıkeve, dıbê: "Ew ji waye minani mın bırindar e, ew ji minani mın jı heval û hogırên xwe maye, qedera me herda bûye weki hev."

Evdal tine baskê wi derman dıke, gırêdıde û wi dıbe malê xweyi dıke. Bı destê xwe qût û ava wi tine dıde ber û nanê, xwe pê ra parvedıke.

Evdal û qulıng êdi bı hevra dıbın heval, Qulıng ji usa himi Evdal dıbe, ew ku kuda dıçe, dı kijan ali da dımeşe, qulıng ji dıde pey, pê ra dıçe û jê neqete.

Evdal jı wê rojê şûnda lı ser xwe û qulıngê xwe kılaman dıbêje.

## Qulıng lı serê me ha neke (*)

*De lo lo... de yo yooo...*
*De yo yo, qulıngooo...*
*Lo qulıngo malxırabo lı serê me ha meke fenani te nine*
*Baskê xwe veneke, çeplê xwe dı ser mı da nehejine*
*Serê beskê te bı çemûr ın, kokê baskê te şıkesti ne*
*Tu jı derdê dılê xwe ra nebê, jı bırina dılê mı*
*/ra neqıngine*
*Hersê mehê havinê ci û meskenê te Serhed e*
*Tev mêrg û çiman e, bı gul û çiçek û çav-kanine*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Şakıro (Şakırê Bedih) ye.***

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**Çavên Evdal vedıbın, baskê qulıng dıcebırın, qulıng dıfıre dıçe.**

*Hersê mehê zıvıstanê sekna te qoce Mêrdine*
*Tu bı felekê bawer nebe,*
*Herçar rojê dunyalıgê weke hevdû nine*
*Felek bavê kesi nine*
*Çıra kesi jı êvarê hetani mila şebeqê naşxuline*
*Bı kesi ra hertım nadûmine*
*De tu rabe, jı derdê dılê xwe ra bêje*
*Jı bırina dılê mı ra bıqingine...*

*Hayê lımın, hayê dılo*
*Hayê lımın, hayê gundo...*
*Ez sewdali me, haye dılo...*

*De lo lo, de yo yo...*
*De yo yo, qulıngo...*
*Malxırabo, mı jı te ra nego fenani te nine, lı serê me ha meke*
*Tu jı himê bınê Beryê rabûyi hatiyi, baskê xwe ser mı da veneke*
*Serê baskê te bı çamûr ın, kokê baskê te şıkestine*
*Malxırabo tu baskê xwe dı ser mı da nehejîne*
*Ceplê xwe ser mı da lı ba neke*
*Hersê mehê havinê ci û meskenê te Serhed e*
*Tev mêrg û çiman e, bı gul û çiçek û çavkani ne*
*Hersê mehê zıvıstanê sekna te qoce Sıwêrek e*
*Tuccari tu bı ciwanya xwe fexrê neke*
*Tu nızani herçar rojê dunyalıgê nabe yek e*
*Ewê ku du dıla û çar çava jı hev dıqetine*
*Pışta merya dı çıl û çar ciyi da dışkênine*
*Çıma tu nızani dawya me qoce geleke*

*Hayê lımın, hayê dılo*
*Hayê lımın, hayê gundo...*
*Ez sewdali me, hayê dılo...*

# Mırın çêtır e jı halê feqiriyê

Ew Evdalê ku Surmeli Memed Paşa gundek dabûyê û ewi qebûl nekırıbû, guh nedabû mal û mılkê dunyalıgê, bı kalbûn û korbûnê ra feqir dıkeve û dı dunya xwe ya reş û tari da bê mecal dımine. Qulıngê baskşıkesti ji jê ra dıbe derdê ser derdan. Ew, êdi lı ser halê feqirya xwe dırêj–dırêj dıbêje.

## Wey kaliyê wey koriyê (*)

*Evdal go Temo lawo, berxê ez bavê te me*
*Dengbêjê Surmeli Memed Paşa ez bı xwe me*
*Dılê mı bûye kela derdan û kulla, pır bı xem e*
*Jı mırına Memed Paşa vırda ez şerpeze me*

*Wey kaliyê, wey koriyê*
*Xudê xırab bıke kalaniyê*
*Welle Temo lawo mırın çêtır e jı feqiriyê*

*Heyla lawo, vê felekê nızam çıma lı bavê te ha kır*
*Berxê mı lawo, emrê bavê te nêziki heyştê sal kır*
*Bavê te lı Xozanê yeki mina Memed Paşa wunda kır*

---

*** Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya ye.**



Institut kurde de Paris

*Dı dawiya emrê mı da felekê barê feqiriyê lı mı bar kır*

*Wey kaliyê, wey koriyê*
*Xudê xırab bıke kalaniyê*
*Welle Temo lawo mırın çêtır e jı feqiriyê*

*Berê qiz û bûka hustûyê xwe lı ber bavê te ji xar kır*
*Kalanyê lı mı kal kır, xortanyê mala xwe jı mı bar kır*
*Bûka rûyê xwe jı mı guheri, qiza dılê xwe jı mı sar kır*
*Pirê heftê - heyştê sali tınazê xwe kır, devê xwe*
*/lı mı xar kır*

*Wey kaliyê wey koriyê*
*Xudê xırab bıke kalaniyê*
*Welle Temo lawo mırın çêtır e jı feqiriyê*

*Kela Topraqelê bışewıte, dı ber da rê ke*
*Xemê mı pırr ın, xeyalê dılê mı gellek e*
*Lawo, Xûdê xırab bıke feqiri ne tu çek e*
*Xudê tucari mılê mêrkê camêr tê ra neke*

*Wey kaliyê, wey koriyê*
*Xudê xırab bıke kalaniyê*
*Welle Temo lawo mırın çêtır e jı feqiriyê.*

## Evdal kor e rê nabine (*)

*Evdal go Temo lawo, kalbûnê de wi-wi, de wi-wi lo lı mın kal kır*
*Xortaniyê mala xwe jı cem mı bar kır*
*Qizê dı nav êla da berê guhastın, pışta xwe bı mı da kır*
*Ez çıbkım lawo bûka dılê xwe jı mı sar kır*
*Pirê heftê-heyştê sali devê xwe lı mı xar kır*

---

**** Ev kılama bı sıtrana Evdırıhmanê Mılazgırê ye. Naveroka vê kılamê û kılama berya wê nêziki hev ın, lê cudatiyên wana ji pır ın.***

Institut kurde de Paris

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırn çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Temo lawo, sal û zeman heye emê ji bı mexseta*
*/dılê xwe şabın*
*Dayka de dıgo bı destê mı bıgrê, emê dı çiyayê*
*/Eli-Palo da xarbın*
*Jı bo dılê rezil çend saleka emê bı hevra bendewar bın*
*Xudê mezın û mıraz-bexşe, em ji bı mexseta dılê*
*/ xwe şabın*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Lawo wexta ku mırın hebû, xwazıl*
*/kalbûn-pirbûn qe nebûya*
*Dayka te dıgo zemaneki wê were, tuyê kal bi, ezê pir bim*
*Bı avırê çava, bı qınyata dıla, emê jı hevdu bêzar bın*
*Heta zar û zımana emê bı hevra tengezar û belengaz bın*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çetır e jı halê feqiriyê...*

*Temo lawo, lı dunyayê korani dewi-wi,*
*/de wi-wi ne tu çek e*
*Xudê lı mılê bavê te kırye, lı mılê tu mêrê camêr neke*
*Xudê lı rêwyê riya, lı nexweşê nav ciya,*
*/lı nefsa tengasyê were rıhmê*

Institut kurde de Paris

*Ez hêvi dıkım, belki deryê xêrê lı pêşya mı ji veke*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê weranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtıre jı halê feqiriyê...*

*Temo ma lawo bıhar e, Evdal kor e,*
*/de wi-wi Evdal kor e...*
*Lawo ca rabe, bıkeve rêze-gunda pırske,*
*Kanê lı dunyayê tu derd heye ku qasi kalbûnê zor e*
*Heyla lo lawo hêviya mı maye Mirê Mira, Rebê jor e*
*Ez par vi çaxi Evdalê Zeynıkê, siyarê Cındi bûm*
*Goşyê ser mılê qizan û xorta bûm*
*Gula govenda bûm, şahê dengbêja bûm*
*Jı isal pê ra keseki xwedanê xêra tune bı destê mı bıgrê*
*Bêje camêro ca were rûnê lı diwanê, lı serê jor e*
*Lawo de tu rabe bı destê bavê xwe bıgrê,*
*/bıbe Qerekosê,*
*Mı bıbe Dumalyê, bavêje ser Ocaxa Şêx Bekırê Sor e*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Temo ma lawo bıhar e, dılê bavê te wi-wi,*
*/de wi-wi bı keder e*
*Aliki da feqiriya dunyayê, derdê kalbûnê xwe*
*/berdaye ser e*
*Lawo tu rabe bı destê mı bıgrê, diyar-diyar bıbe here*
*Tu mı bıbe Gogoxlanê, Hustûna Sıpi,*
*/ser Ocaxa Şêxê Lexere*
*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Temo ma lawo bıhar e, qulıng hatın de*
*/wi-wi qulung şeş e*
*Bınê baskê wan belek ın, serê baskê wan bı nexş e*
*De tu rabe bı destê mı bıgrê, bavê ser ocaxa*
*/Bilali Hebeşe*
*Xudê dızane, çavê bavê te ne kor ın, lawo ava reş e...*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê weranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtıre jı halê feqiriyê...*

*Temo lawo bıhar e, qulıng hatın de wi-wi jı Rewanê*
*Refê qulınga daniye lı bırcê çiye*
*Lı ser çav-kaniyê, ser belekyê berfê, lı vê zozanê...*
*Temo lawo tu rabe pırske*
*Bêje qulıngo, malxırabo heval û hogırê te ji kanê*

*Qulıng dıqiriya dıgo Evdal tu arıf i,*
*/tu dızani demê û dewranê*
*Ezê par van çaxa serekê refê qazan û qulınga bûm,*
*Mınê dabû pêşyê, ew dıbırın Beriyê û Beristanê*
*Jı isal pê ra felekê jı mı ra xırab lê aniye*
*/baskê mı şıkestıne*
*Ez hatıme erdê, ketıme destê beni-insanê*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*

INSTITUT KURDE de PARIS
BIB... ...QUE

*Temo lawo mırın çêtıre jı halhe feqiriyê...*
*Evdal go Temo lawo bıhar e, dılê bavê te*
*wi-wi jı dıla din e*
*Hela here mêzeke, ew qulunga çıma jı*
*/nefê xwe qetyaye, paşta dımine*
*Ew ji yan minani bawê te kor e, rê nabine*
*Yan ji baskê wi şıkesti ne*
*Ew qulınga ku dıke qirin û qûtine*
*Dı dılê mı da sesıd û şêşt û şeş bırin e*
*Sewta qulıng bırinê bavê te dıherışine*
*De tu rabe, bıke bılezine*
*Wi qulıngi bıgrê jı bavê xwe ra bine*
*Emê jı Xudê rıca kın, bıkın zarin û qirine*
*Yan bıra jı me ra deriki veke,*
*Yan ji bıra emanetê xwe jı me bıstine.*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Temo radıbe dıçe, de wi-wi, de wi-wi dılezine*
*Çend zarê cinara lı xwe dıcıvine*
*Wi qulıngi hıldıde jı bavê xwe ra tine*
*Evdal qulıng jı destê Temo hıltine*
*Destê xwe lı baskê qulıng dıgerine*
*Bala xwe dıdê ku baskê wi şıkestine*
*Dıbê qulıngo, gelo çıma Xudê vê xezebê*
*/bı ser me da dıbarine*
*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo merın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Evdal gulıng hemêz dıke, jı wê da tine*
*Bı danê esrê ra xwe bı malê ra dıgıhine*
*Dema ku Eyşo qulıng lı hemêza Evdal dıbine*
*Lı nav çavê xwe dıxe, dıke qirin û qutine*
*Dıbê ew çend kod zıkata ku xelkê jı zarokê mı ra anine*
*Evdalê here teyr û tûyê çolê bı xwe ra hılde bine*
*Xudê qebûl neke, wê teyr û cûcıkê xwe lê bıçêrine*
*Dı nivê zıvıstanê da wê qût û qısmetê me bıqedine*
*Eyşo ya hêsir û belengaz wê paşê here jı ku bine*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Evdal go Temo lawo ez bêjım felek de wi-wi tu bê felek*
*Lawo bı bavê te ra xayin derket qoce felek*
*De lawo ez Evdalê Zeynıkê bûm Şahê dengbêja bûm*
*Bavê Temo, kekê Mıhê bûm Siyarê Cındi bûm*
*Goşyê ser mılê qizan bûka bûm, Gula govenda bûm*
*Berdefkê cımaeta miran û hakıma bûm*
*Ez lı dunyayê dı nav canık û camêra da geryabûm gelek*
*Lawo gemi çûne, gemyê me welgeryane, mane kelek*
*Xelkê bû aşıqê mal û halê dunyalıgê*
*Xelkê bû aşıqê cot û kotana*
*Rezan û peza mal û mılka, ga û çêlek*
*Xelkê wunda kıriye bı tekan û tûka*
*Bavê te wunda kıriye cotek çavê reş û belek*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê, wey faniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

Institut kurde de Paris

*Evdal go Temo lawo bıhar e, dılê bavê te*
*/wi-wi jı dıla din e*
*Lawo ez dınhêrım lı vi welati qedır û qimeta*
*/bavê te tunine*
*De tu bı destê mın û qulıngê mı bıgrê bıbe Dıgnûgê,*
*/ser Ocaxa Şêx Badine*
*Emê jı mexrebê hetani mila şebeqê lı ser bıkın*
*/figan û zarine*
*Belki Xalıqê Alemê jı mın û qulıngê mı ra şıfake*
*/xêrê bışine*
*Yan ji bıra Xûdê jı me herdûya ji emanetê xwe bıstine*

*Hey dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Axa dılêm yar yar, dılêm yar yar...*
*Heyla wey dunyayê weyfaniyê*
*Wey zozanê wêranê, wey kaniyê*
*Welle Temo lawo mırın çêtır e jı halê feqiriyê...*

*Tamo radıbe, dıke de wi wi, de wi wi lo dılezine*
*Bı destê bavê xwe dıgrê, lo diyar-diyar dıgerine*
*Heft sal derbas dıbe, sala heyşta poside û bı poşmani*
*Bavê xwe ser dayka xwe da paşta tine*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*Dılêm yar yar, te fani dunyayê...*

# Hekimên İranê

Wê çaxê hekimên İranê yên çavan pır bı nav û deng bûne Evdal ji salıxê wana dıbıhize. Evdal heft sala diyar-diyar dıgere, dıçe ser şext û ziyaretan, ser şêx melan, tu çareki nabine. Lê Evdal bı hêvi û guman e, ew yeqin bawer dıke ku çavên wi yê vebın. Wê demê jı kurê xwe ra dıbêje: "Mın hılde bıbe İranê ser hekimên çawan!"

Rojeki salıx hıldıdın ku jı İranê hekimeki çavan hatiye gundeki nêzik. Temo bı destê bavê xwe dıgrê dıbe cem. Hekim lı çavên Evdal dınhêre, jê ra dıbêje: "Lı ser çavên te perde heye, heke ew perda ku bê hıldanê, tê bıbıni."

Evdal dıbe: "Tu dıkari hıldi?"

Hekim dıbê: "Belê, ez dıkarım. Bı bawerya mın, perde ku bê hıldanê, tê bıgıhiji ronkayiyê, lê ku çavên te pûç bın tu nabini."

Hekim dıgrê perda ser çavên Evdal hıldıde, derman dıke û dıçe. Pışti çûyina hekim, Evdal lı gor gotına hekim çavên xwe derman dıke û lı hêvya saxbûna çavên xwe dısekıne. Lê jına wi Eyşo, gundi-cinar tu kesek bawer nake ku çavên Ev-

dal dê sax bın. Dıbên: "Heyran ew çavên ku heft sal e kor ın wê çawa sax bın. Eva tışteki nêziki rıhma Xudê ye, lê dûri aqılan e."

Demeki pey ra Evdal şeveki xewın dıbine. Dı xewnê da merıveki rû-rıhman jê ra dıbê: "Evdal rabe, Xudê lı te hate rıhmê, tu xelat kıri, çavên te sax kır, baskê qulıngê te ji cebırand. Rabe derkeve derva!"

Evdal jı nav ci radıbe, lê tışteki nabine. Destê sıbê bûye, deri û kullek ku gırti bûne, hundırê malê tari bûye. Evdal deng lı jına xwe dıke, dıbê: "Eyşo rabe çırê vêxe!"

## Eyşo rabe çırê vêxe (*)

*Evdal go Eyşo ca rabe de wi wi, de wi wi lı mı çırê vêxe!*
*Qizê ez nızanım qınyatê dılan e, yan ji xewnê*
*/şevan e mı ditye*
*Mı di kaleki nûrani lı ber serê mı sekınibû,*
*/gazi mın kıriye*
*Jı mı ra go Evdal rabe, Xalkê Alemê te xelat kıriye*
*Go Xudê lı te hatye rıhmê, çeka xwe lı mılê te kıriye*
*Baskê qulıngê te ji cebırandiye, hê jı berê çetır bûye*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*De dılêm yar yar, dılêm yar yar...*

*Eyşo vegerya go Evdal nabe, de wi-wi,*
*/de wi-wi sed car nabe*
*Mın sond xwarye, bı quran û kıtêbên malên şêx û mela be*
*Tu hetani sıbê vi çaxi bêji, Eyşo jı nav ci û nıvinê*
*/xwe ranabe*
*Eyşo jı te ra çırê vênaxe, çıra lı pêşya te hılnabe*
*Bı şev û rojê xew û tebati û sekna te çê nabe*

---

** **Ev kılama bı sıtrana Evdırıhmanê Melazgırê ye.***

Institut kurde de Paris

*İsal heft sal e çavê Evdalê Zeynıkê kor bûne, qe sax* **nabe**
*Ez sıbê herım jı cinara ra bejım çavê Evdal vebûne,*
*/kes pê bawer nabe*
*Kê bawer ke ew çavê kı heft sal e kor ın,*
*/wê jı nışkê va vebe*
*Xudê qebûl neke, idara mın û zarokên mın jı destê*
*/Evdal* **nabe**
*Xudê-Rebiyo ez nızanım axırya me û Evdalê*
*/kor wê çawa be...*

*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*De dılêm yar yar, dılêm yar yar...*

*Evdal go Eyşo ca rabe, lı mı de wi-wi, de wi-wi çırê vêxe!*
*Qizê mı erzahıla te da Mirê Mira û ocaqa mala şêxe*
*Belki Xudê mala bavê Eyşo bıbe ber tofanê û lı topê xe...*

Institut kurde de Paris

## Evdal derdıkeve dunya roni

Evdal dıke-nake Eyşo jı nav ci ranabe çırê vênaxe. Evdal destê xwe lı hıstûnê dıpeline, xwe bı diwêr dıgrê, hêdi-hêdi dıçe xwe dıghine deri. Dema ku deri vedıke, lıngê xwe jı şêmûkê davêje der, tirêja ronkayiyê lı ber çavên wi çik-vedıde. Evdal jı şêmûkê sê-çar gava davêje û dısekıne. Paşê destê xwe davêje pêça ser çavên xwe, pêçê dışıqıtine xarê, çavên xwe vedıke û lı pêşya xwe dınhêre.

Evdal dınhêre ku çavên wi dıbinın, bawer nake, bı xwe jı xwe ra dıbê: "Yeqin ev xeyal e, ne rast e."

Evdal, dı ci da rûdınê, destên xwe dıde ser çavên xwe, demeki usa dımine. Paşê çavên xwe hıneki mızdıde û carke dınê lı pêşya xwe dınhêre. Disa bı xwe jı xwe ra dıbêje: "Na, na... Ev xeyal nine, hema rasti bı xwe ye."

Çavên wi vedıbın, ew jı dunya tari xılas dıbe û derdıkeve ronkayiyê.

Evdal şa dıbe, dılê wi dıkute, hêz dıde xwe radıbe piya û lı der-dorê xwe mêze dıke. Newala lı bınya malan, darebiya lı dor çemê gund, Zozana çiyayê Xara, zınar û kevırên textê Mêrgezerê. Topa Çiyayê Zopik, hemmû lı pêşberi wi dıxûyên û dunyake mezın û fıre lı pêşya wi dırêj dıbe.

Institut kurde de Paris

Evdal berbe newalê hêdi-hêdi dımeşe, demeki şûnda jı paş va dengek tê. Wexta ku vedıgere lı paş xwe mêze dıke, bala xwe dıdê ku qulıngê wi ji waye jı mal derketye, daye pey wi û berbe wi tê. Evdal dı ci dızvıre berbe qulıng dıçe, dema ku tê nêziki qulıng, destê xwe dırêj dıke ku wi bıgrê bıde hemêza xwe; Qulıng, yekten jı ber Evdal qıl dıke, baskên xwe lı hev dıxe, bı hewa dıkeve, berê xwe dıde rojhılat, here ku tu dıçi... Evdal dı ci da dısekıne, pey qulıngê xwe da mêze dıke, hetani ku ew dıçe, jı çavan wunda dıbe.

Institut kurde de Paris

# Serhıldana Tahır Xanê Qelenyê

Pışti vebûna çavên wi Evdal lı hespê xwe siyar dıbe bı dılê xwe dıgere. Dıçe kêşa Elajgırê, Intab û Patnosê, Erciş û Ebexê. Wê demê Kurdên İranê ci bı ci lı pêşya Şahê Ecem seri hıldıdın. Şahê Ecem leşkereki mezın dışine ser Serdarê Kurda yê bı nav û deng Tahır Xanê Qelenyê.

Tahır Xan lı pêşya leşkerê İranê lehengiyeke mezın nişan dıde, berxwe dıde û revê bı leşkerê Ecem dıxe. Lê paşê tevi Calalyan gellek beg û eşirên Kurda yên dın ku alikorya leşkerê şah dıkın, Tahır Xan mexlûb dıbe.

Evdal lı ser wê bûyerê kılameki derdıxe.(*)

## Ezê bı diharê Qelenyê dıketım (**)

*Ay de lo looo... De lo lo, de lo lo, de lo looo...*
*De lo lo, de lo lo, ez bırindar ım bıranooo...*
*Dayê rebenê ezê bı diharê Qelenyê dıketım,*
*/iro şerê Tarxan e*
*Bırano ca rabın sêr bıkın*
*Lı çiyayê Qelenyê Tarxan bı sê denga lı*
*/Emırxan kıre gazi*
*Go bavê-bavê mıno, hêla konani jêr bernede!*
*Şahê Ecem bıra bı eskerê xwe nebe gumane*
*Nebê eskerê mı gırane*

---

* **Lı gor salıxan ev şera dı salên 1885-1890 i da bûye.**
** **Ev kılama bı sıtrana Resoyê Kopala ye.**



Institut kurde de Paris

*Yeqin bızanbe qetla şahê Ecem*
*Lı cem bırayê te mina qetla du mırişka ne*
*Ez çıbkım, jı êxbala mı ra, lı pêşya Şahê Ecem*
*Jı êvar da ketye pêsira mı koma Celalyan e*

*Lo lo,lo lo, lo looo...*
*De lo lo, lo lo looo...*
*Lımınê lo lo looo...*
*Ax ez bırindarım bıranooo...*

*Dayê rebenê, ezê bı diharê Çiyayê Qelenyê dıketım*
*/ha bı dar e*
*Jı êvara Xudê da jı çiyayê Qelenyê tê surek, sureki sar e*
*Taxıma destê Apê Zezê, Bavê Cemilê kiraza*
*/welatê jêr e, imama seri karibar e*
*Tarxan bı sê denga lı Emırxan kıre gazi*
*Go Bıra, hêla konani jêr bernede*
*Em du tayê bı tenê ne*
*Eskerê Şahê Ecem hezar bı hezar dı ser me da hate xare*

*Şane-şûnê Apê Zezê, Bavê Cemilê lı dunyayê gellek hene*
*Beri hezar û hefsıd mêrê Ecem daye*
*Pêşi daxıstye Ava Erez, paşi maye lı Gêdûka Ebaskendê*
*Mirata beşliyê jı êvarda dı desta da zare-zare*
*Zezê dıgo Cemilê merûmê,*
*Mı jı te ra nego deng lı kekê mı neke*
*Bıra têkıli şahê Ecem nebe*
*Eskerê Şahê Ecem gıran e, eskerê kekê mı hındıke*
*Ez dıtırsım, tu were pê nıkare lo lo...*
*Lo lo, lo lo, lo looo...*
*Lo lo, lo lo, lo looo...*
*Ax lımınê lo lo lo*
*Lolo ez bırindarım bıranooo...*

*Dayê rebenê, ezê bı diharê Çiyayê Qelenyê dıketım*
*İro berfekê lı me barye minani hêk e*

Institut kurde de Paris

*Xudêyo tu şewıtya Qelenyê xırabki*
*İro jı berfê sıpi dıke minani hêk e*
*Tarxan bı sê denga lı Emırxan kıre gazi*
*Go bıra, mıqat be, hêla konani jêr bernede*
*Orta mın û şahê Ecem xıra bûye*
*Kesekê xwedanê xêra tunine iro sulha me çêke*
*Sıhûda xweş-mêra ku jı Xudê da neşıxule, gellek zor e*
*Mirata beşliyê dı destê bırayê te da kelem daye*
*Heyfa mı nayê bı terş û talanê*
*Şahê Ecem merweki bênamûs e*
*Dıtırsım tu were erz û eyanê me bıbe*
*Serê me herda jêke*

*Lo lo looo... lo lolo, lo lolooo..*
*Lo lo lo, lo lo, loooo,*
*Ax lımınê de lolo...*
*Ez bırindarım bıranooo...*

*Zezê dıgo Cemilê Merûme*
*Kekê mı lı dunyayê xweş mêr e xweş axa ye*
*Lı vi welati daim lı ber pozê Şahê Ecem e*
*Eza pepûkê, Mir-penç e, yarım-Şa ye*

*Zezê dıgo Cemilê korani dı çavê mın û te da hatê*
*Heyfa mı nayê bı kuştına bavê mın û te tenê*
*De ija rabe bala xwe bıdê, pepûkê*
*Bı dızgina Gogerçin gırtıne, berê wi dane Kela Maku yê(*)*
*Gogerçin lı rêza mıhina kırıne extırmeye(**)*
*Lo lo lo, lo lolooo...*
*Ax lımınê de lo lolooo...*
*Ez bırindar ım bıranooo...*

---

**** Gogerçin navê hespê Tahır Xan e.***
***** Extırme: Heywanê barbır***



Institut kurde de Paris

# Evdal mala xwe dıbe Dedewêranê

Çend salan şûnda, kurê Evdal yê mezın Hamê jê cıhê dıbe, dıçe dı Gomıka Mılazgırê da bı cih dıbe, paşê ji Evdal mala xwe jı Qanciya bar dıke, ew û kurê wi yê pıçûk Mıhê, dıçın Dedêwerana Xınûse. Wê demê dı Mıftıkê da, Cıbran û Bılıkan bı hevra şer dıkın û gellek mêr tên kuştın.

Mıftık, dı navbera Xınûs û Bılanıxê da, dı ber Çiyayê Qolibaba da, nêzıki ava Mûradê ye.

Evdal kılameki lı ser wê bûyerê derdıxe.

## Rojê dı Qolibaba da welgerya (*)


*Evdal ım... Evdal ım Evdaaal...*
*Herê bê Evdalooo...*
*Ezê lı diharê Mıftekani şewti dıketım lı dar û biya*
*Êvareee... rojê dıçû dı Qolibaba da welgarya*
*Zergê xwe avête quntari çiya*
*Kulê tê bı kul bi bıkevi mala Sıloyê Sedıkê*
*Jı berana beranê pez-kûvya*

*Jı êvar da parçe kendalê avê bı dest ketye*
*Jı me dıjbêre egitan û mêrxasa*
*Minani tucarek jı tucarê Helebê*
*Ketye nava keri pezê deştê*
*Jê dıjbêre berana, bêlıma, geltan û miya...*
*Evdal ım, Evdal ım, Evdal ım siyaro...*

---

*** Ev kılama bı sıtrana Kazoyê Garısya ye.**

Institut kurde de Paris



**Evdal lı ber Pıra Kulyê rasti komeke qiz û bûkan tê**

*Herê bê Evdalooo...*
*Ezê lı diharê Mıftekani xopan dıketım vê bı hez e*
*Êvareee... rojê dıçû dı Qolibaba da wê dıbeze*
*Kulê tê bı kul bi bıkevi mala Sıloyê Sedıkê*
*Heyvenê mala Reşo û Cega heyveneki zor û zurbe ye*
*Qotek modoli bı dest ketye, xwe avêtye ber kendalê avê*
*Mêra jı me dıkuje, derdıxe heyfên kewn û teze.*

*Evdal ım, Evdal ım, ez Evdal ım siyaro...*

*Herê bê Evdalooo...*
*Ezê lı diharê Mıtekani xopan dıketım lı devi avê*
*Sıloyê Sedıkê berani keli beş, ketye ber kendali avê*
*Kulê tê bı kul bi bıkevi mala Sıloyê Sedıkê*
*Tıvınga dı desta da barûtê dışewtine, qoxana paşta davê*
*İro dı Qolibaba da mêra dıkuje, cınaze dımının lı ber tavê*
*İro xortan û egitan dıkuje, jı hev dıqetine*
*/destê bûk û zavê.*

*Evdal ım, Evdal ım, ez Evdal ım siyaro...*

Institut kurde de Paris

# “Mina bıllûra lı ber guhê ga”

Lı wê kêşê Evdal ku dıçe dı nav gelda dıgere, pır xeyalşıkesti dıbe. Ew axa û begên ku berya wexta wi jı destên hev revandıbûne, bı ditina wi û strana wi ya dı diwanên wan da xwe şerefbılınd hesıbandıbûne, bı pırani guh nadıne û qedrê wi nagrın. Evdal wê rewşê bı pırsên tuj va rexne dıke. Lê ew disa ji bı xwe bawer e, yeqin dızane ku berhemên wi minani zêrên zer ın, Hezar sal ji dı bın erdê da bıminın, narızın.

Evdal wê çaxê jı bo wê rewşê kılama “Heyla Wayê” dıbêje:

## Heyla Wayê (*)

*Temo lawo iro dılê mı şewıti, lı halê mı gırya*
*Lo lawo hela bala xwe bıdê roni jı ber çavê mı bırya*
*Wextê ku ez bı Surmeli Memed Paşa ra çûme Xozanê*
*Bıra Rebbê Alemê emanetê xwe jı mın bıstanda*
*Gava ku koka egitan û efrûta lı me qelya.*
*Bavê te dı dawya emrê xwe da mina peza gura-gırti*
*Jı nefê xwe qetya û maye lı dû bırra û kerya*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Heyla wayê, hey dunyayê...*
*Lawo, bavê te mina qulınghe Nisanê,*
*/jı halê xwe ra dıgo û dıqiriya*
*Çıqas rêwyê ku lı serê rêya hebûn, dema*
*/ku çav bı halê mı ketın,*
*Temama rêya xwe hişt, lı mı vegeriya*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Resoyê Kopala ye.***



Institut kurde de Paris

*Dıgotın apo, gotınên te ne gotınên insanên vê dewrê ye*
*Hey malmirato, ne te agır berda cigera me heliya...*
*Lawo mın disa minani berê qesta nava cımaetê kır,*
*Lawên nekesa rabûne ser xwe, gotın apo ciyê te ew nine,*
*Ez şûnda vegerim, lı hewliya poxana*
*/sekınim lı ser darê piya...*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Heyla wayê, hey dunyayê...*

*Temo lawo, derdê mı besi mı nine, berxo*
*/nızanım iro te jı mın xêr e*
*Lawo iro gırrek bı lıngê mı ketiye, hetani*
*/tepa serê mı dıhêre*
*Heyla lawo mızginya mı lı te be,*
*Mın berhemek usa lı dunyayê hiştiye,*
*Heta roja qiyametê lı erdê bımine,*
*Ew tucari xırab nabe, mina zêr e...*
*Lawo, tırsa mı tune jı mırınê, ezê bımırım,*
*Pışti mın ra tu were herkes rabe dewa dengbêjyê,*
*/şaıryê bıke,*
*Wê bêjın xelk lı gotın û meqama napırse,*
*Herkesê meydanê bıde hespa xwe û lı*
*/hesabê xwe bınıhêre...*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Heyla wayê, hey dunyayê...*

*Heyla wayê, heylaaa wayê...*
*Bıra qeda bê lı herçar rojê vê dunyayê*
*Kes pê bawer nebe, emrê çûyi berxê êdi şûnda nayê*
*Ezê rıcaki jı Rebê Alemê bıkım,*
*Belki Xudê lı ser imanê emanetê xwe jı mı bıstine,*
*Êdi ez nekevım ber destê axelerê û vê reayayê...(*)*

***** **Reaya: Merıvên bê eslên qedırnezan.**

Institut kurde de Paris

*Lawo, ez bı şevê û rojê ewqas dıqirım,*
*Tu kes dengê mı seh nake, mina bıllûra lı ber guhê gayê...*
*Heyla wayê, heyla wayê*
*Heyla wayê, heyla wayê...*

Institut kurde de Paris

# Evdal rasti komeke Qiz û Bûkan tê

Evdal ku mala xwe dıbe Dedewêranê, dıçe lı kêşa Xınûsê, Bılanıxê, Tekman û Qereyazyê dıgere. Rojeki lı hespê xwe siyar dıbe, dıkeve rê ku here Soylemeza Jorin, mała Qulixan Begê(*).Berya wexta ji ew çend cara çûbûye mala Qulixan Begê.

Evdal dema ku dıçe jı Kulyê derbas dıbe, dest pê dıke lı ser pışta hespê kılaman dıbêje. Qiz û bûken Kulyê ji lı serfêza Pıra Kulyê kıras-şo danibûne. Dı nav wana da qizek bı dengê bılınd dıbê: "Ev kalê hanê şerpeze ki ye usa dıqire?"

Xuşka wê ya mezın Evdal nas dıke û lê hêrs dıkeve, dıbê: "Korê, usa nebêje, ew Evdalê Zeynıkê ye!"

Evdal xeberdana wana dıbıhize, hema lı wê derê kılameki dıbêje.

## Konaxa bavê te Kuli ye (**)

*Evdal dıgo Temo lawo iro konaxa bavê te Kuli ye*
*Komek qiz û bûkê kulyê lı ser Ava Erez kıras-şo daniye*
*Qizeki dıgo hela mêze kın, ew kalê şerpezê lı*
*/ser pışta hespê ki ye?*

---

***Qulixan Beg serokê eşira Zırka bûye, mala wi lı Soylemeza Jorin bûye.***

***** Ev kılama bı sıtrana Zahıro ye.***



Institut kurde de Paris

*Malxırabo ku dıke qirin, merıv dıbê qey din e,*
*/yan cınnû ye*
*Xwenga wê ya mezın dıgo hêdi qıseke, bıra dengê*
*/te neçe wi ye*
*Korê, çıma tu nızani, ew Evdalê Zeynıkê,*
*/bavê Temo, siyarê Kûvi ye*
*Ew iro lı Soylemeza jorin dengbêjê deweta Quli ye*
*Ebûr nabe Temo lawo ebûr nabe*
*Jı destê qiz û bûkê vi zemani*
*Rêwyê riya dı riya xwe da derbas nabe...*
*Temo lawo ezê bı diharê*
*/Pıra Kulyê dıketım bı dar û bi ye*
*Herdu alyê Pıra Kulyê bı çiya û newal û geli ye*
*Evdalê Zeynıkê bavê Temo, gula govenda, siyarê Kûvi ye*
*Gundê ku ew lê bûye mêvan, gellek qizê mina te*
*/lava kıriye*
*Dıgon Evdal me ramûse, mı daxwaza*
*/wana paşta vegerandiye*
*Xwenga pıçûk dıgo ev kalê han çıma*
*/kılama davê ser mın, dıke qirine*
*Lê lê xwengê tu dıbê qey ev kalê han xurıfye, yan ji din e*
*Ebûr nabe Temo lawo ebûr nabe*
*Jı destê qiz û bûkê vi zemani*
*Rêwyê riya da riya xwe da derbas nabe...*

*Evdal dıgo qizê te çıma awha dı ser mı da zarke-zark e*
*Çend sal berê xelkê dıgo Evdalê Zeynıkê*
*/çı xorteki başi pak e*
*Çıma ku çend dıranê mın ketıne, çend tayê sıpi*
*/lı rûyê mı hatıne*
*Lema ew keçıka pisa-pınti awha dıbêje, poz bı mı nake.*
*Ebûr nabe, Temo lawo ebûr nabe*
*Jı destê qiz û bûkê vi zemani*
*Rêwyê riya dı riya xwe da derbas nabe...*

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# Evdal carke dın mala xwe bar dıke

Evdal, pışti ku mala xwe dıbe Dedewêranê, lı wê kêşê dıçe malên pêşdahatiyên Zırkan. Ew, dıçe Madragê, Çawurma Xelil Axa, Soylemeza Jêrin, Kulyê û Elbaşyê. Merıvên camêr qedrê wi dıgrên, jê ra hurmet dıkın, lê wan kesên ku xwe nızanıbûne qedrê wi negırtıne, bı çavên parsoka lê mêzekırıne.

Institut kurde de Paris

Evdal dı kılameke xwe da qala çend kesan dıke, waha dıbêje:

............

*Temo lawo Kulli xweş e Erez lı ber e (*)*
*Elyê Temo baxşişa bavê te daye zêrê zer e*
*Çûme mala Huso, wi daye mın kisek pere*
*Jı wır rêketım, çûme mala .............., Elbaşyê(**)*

*Lı ber deri ketıbû, kıllor dabû mina kuçkê gewre (***)*
*Wi bexşişa bavê te da ferek çarıx, tasek bulxur e.*

Paşe Evdal dıçe Soylemeza Jorin, mala Qulixan Begê. Qulixan Beg wi bernade, 6-7 rojan dıke mêvan, jê ra xızmet dı-

---

* ***Ev benda kılamê bı gotına Heyder Demır e.***

** ***Lı vır ew navê ku Evdal gotye me jê derxıst***

*** ***Merıv ku lı erdê vedıleze û pen dıbe, jê ra "kıllor dayê" ango mina kuçka ketye tê gotın.***

ke, berdılê wi dıde, dıbê: "Evdal, tu dı axırya emrê xwe da keti vi halê hanê, jı bo feqirya dınyayê ber xwe nekeve! Her çıqas tu iro dı halê dunê da feqir bi ji, tu lı cem Xudê pır dewlemend i. Xudê tu mezınkıri. Xudê dewlemendiyeki usa daye te, ku nebye para tu kesi, xemgin nebe!"

Wexta ku Evdal bı rê dıxın, Qulixan Beg dıgrê 5 zêrê zer bexşişa wi dıdê, pey ra ji, gaki bı cıl-werısê wi va pêşkêş dıkê.

Evdal du sala lı Dedewêranê dımine, jı insanê wê kêşê pır bı gazın dıbe û jı kurê xwe ra dıbê: "Rabe em jı vır herın." Carke dın mala xwe bar dıke, dıçe Qanciya. Evdal wê demê kılama "Rabe Rabe" derdıxe:

## Rabe rabe (*)

*De rabe, rabe rabe, de rabe...*
*Rabe lawıko, bala xwe bıdê, qırrê xwe avête serê çiya*
*Hevin e, zer bûye gihayê mêrga, iro lı mı mıçıqi*
*/avê çav-kanya*
*Murada şewıtya ku dema bıharê din û har bû*
*Manani insanê sêzde û çarde sali*
*Rê nedıda rêwya, keleka û gemya.*
*Payiz e tenık bûye, felek mala te mirat be*
*Minani insanê ku emrê wi derbas bûye*
*Êdi xwe nade kapê-d xam-canûya*
*Felek mala te mirat be, emrê mı sêzde û çarde bû*
*Te dılê mı lı dunyayê gelek şakır, te ez xapandım*
*Gava mı derê cımaeta vedıkır, gışka dıgo*
*/kerem ke were jore*
*Dı dawya emrê mı da.*
*Te du dıranê mı xıstın, du têlê sıpi lı serê mı rakırın*
*Gava mı derê meclisa vekır.*
*Gellek kesan destê xwe lı hev xıstın,*
*Bû tiqê-tiqê wana, rûnıştın bı mı kenya*

---

* **Ev kılama bı sıtrana Resoyê Kopala ye.**



Institut kurde de Paris

*De rabe rabe, de rabe...*

*Felek mala te mirat be, ez din nebûm, te ez din kırım*
*Ez bengi nebûm, iro te ez bengi kırım*
*Te ez kırım mina taki kımkorê, lı Bingolê ez hêşin kırım*
*Germa mehên Tirmeh û Tebaxê lı mın da, ez zer kırım*
*Bayê S ehrayê lı mı da, ez zırav kırım*
*Lı hewa xıstım, ez dame pêşya xwe bırım*
*Lı Gola Şêlû, Gola Nazûkê, lı Behra Wanê ez werkırım*
*Ne çali ye, ne çırpi ye, ne dal e, ne devi ye*
*Tu sıtarek tune gidino, ez xwe pê bıgırım...*
*Felek mala te mirat be, emrê mı sêzde û çarde bû*
*Te ez xapandım, lı dunyayê pır şa kırım*
*Dawya emrê mı da ev çıbû, te çend tayê sıpi*
*/lı serê mı rakının.*

*Qiz û bûkna bı ser mı ketıne, dıbên tu kali...*
*Hey zalımno ez ne kal ım*
*Herge ez kalbım ji, disa kaleki bı gale-gal ım.*
*Ez koçerım, xerab mal ım*
*Ez rêwi me, jı hevalê xwe qetyame*
*Jı para mame, gidino iro ez bê heval ım...*
*Felek mala te mirat be, eva temam derd û kullê te ne,*
*Te ev derda lı mın peyda kır, ez pê dımırım, pê dınalım...*
*De rabe rabe, de rabe...*

*Rabe lawıko em jı vır herın, ev welata jı me ra nabe*
*Welateki şorbe gıl-gılê, nan-garısê jın tolê, mêr qehpe ye*
*Gıdino ev welata jı me ra nabe!..*
*Rabe, lı kumêtê kap-reş siyar be!*
*Bıra mina cara serê te lı Kumêt xar be,*
*Bı insanê xırab ra rûnenê, ranebe!*
*Bı yeki mina Surmeli Memed Paşa ra heval be*
*Tu jı pıra bendewanê derbas be*
*Bı Xudayê xwe û hevalkê xwe ra rast be*
*Gıdi bıra Xudê bı te ra dost be*
*Hezki bıra dujmınê te hezar be...*
*De rabe rabe rabe, de rabe*

Institut Kurde de Paris

# Mıhemedê Eli Begê

Mıhemedê Eli Begê nebyê Heci Usıv Paşa bûye. Heci Usıv Paşa serokê eşira Sipka bûye û pêşiyên wana jı Çiyayê Şengalê hatıne lı Deşta Intabê bı cih bûne. Dı nav gel da jı mala wan ra "Mala Ferhoyê Uzo" hatiye gotın. Mala Ferhoyê Uzo, dı eslê xwe da Êzdi bûye, paşê ola xwe guherandiye bûye Musluman. Bı wi teheri beşeke Sipka lı ser ola xwe maye, ango Êzdi bûye, beşek ji Musluman bûye. Dı seri da pıranya xelkê Intabê Kurdên Êzdi bûne û jı ber wê yekê navê Deşta Intabê dı nav gel da "Êzdixane" bûye.

Heci Usıv Paşa zılameki pır sofi bûye. Wexta ku ew dıçe Hecê, lı wır bı mezınê Tırkên Aqısqayê Heci İso ra hevnas dıbe û ew û Heci İso dıbın destebırakê hev. Paşê Heci Usıv Paşa, Êzdiyan jı Deşta Intabê derdıxe, Tırkên Aqısqayê tine dı şûna wan dı bı cih dıke.

Jı mala Heci Usıv Paşa ra "Mala Sêrxûn" ji tê gotın.

Mıhemedê Eli Begê zılameki pır şerûd bûye. Wexta ku ew bı yeki ra şer dıke, yan ji jı bo şer dıçe ser gundeki, serdanpê cılên sıpi lı xwe dıke dıçe. Ango ew, xwe kefen dıke; yan wê bıkuje, yan ji wê were kuştın.

Mala Eli Begê lı Qerxelıxê bûye. Navbera Mıhemedê Eli



Institut Kurde de Paris

Begê û mêrê meta wi xıra dıbe. Mala mêrê meta wi ji dı Meter da bûye. Mıhemedê Eli Begê xulam û pêxasên xwe hıldıde, êrişê dıbe ser Meter, mêrê meta xwe û kurê wê dıkuje û vedıgere.

Demeki şûnda meta wi jê ra xeberê dışine, dıbê: "Bıra were mala mın, ezê wi efû kım".

Du kurên meta wi yên lal û kerr hebûne. Meta wi tine wan her du kurên xwe dı pışt hıstêr da vedışêre û lı benda wi dımine.

Wexta ku Mıhemedê Eli Begê dıçe mala meta xwe, çek û silahên xwe datine û rûdınê, meta wi wan her du kurên xwe jı pışt hıstêr derdıxe û wi bı destê wana dıde kuştınê.

Evdal lı ser wê bûyerê kılama "Metê" derdıxe.

## Haylê Metê*

*Were haylê were haylê, were haylê were haylê...*
*Metê dêranê herçi gava Mıhemedê Eli jı mal siyar*
*/bû, sebrê bıkşine*
*Bêrivanê herçi gava Mıhemedê Eli jı mal siyar bû,*
*/sebrê bıkşine*
*Ew roj ne roja xudê be, lı cotê qonaxa Metê Intaba jêrin e*
*Wan kor û seqeta gulleki beri bedena*
*/Mıhemedê Eli, siyarê Tiklan dane,*
*Heyla mala bavê xırabyê, kesek tune tımtêla*
*/mala sêrxûn bıgerine*
*Haylêêê...*
*Haylê haylê haylê haylê*
*Haylê haylê haylê haylê...*


* * *

*Were haylê, metê dêranê dı zınêr da, ha dı zınêr da*
*Weyla bêrivanê dı zınêr da, ha dı zınêr da*
*Her du mılê metê belki bışkên dı qova zendê da*
*Îro sê ro û sê şev e, jı para guleki beri bedena*

---

* ***Ev kılama bı sıtrana Şeroyê Bıro ye.***

Institut kurde de Paris



**Evdal jı kûrê xwe û nebyê xwe ra du kılamên xwe dıbêje û can dıde**

*/Mıhemedê Eli daye*
*Heyla mala bavê xırabiyê, gulle maye dı bırinê da*
*Haylêêê...*
*Haylê haylê haylê haylê*
*Haylê haylê haylê haylê...*
*De meke, metê meke bêrivanê meke*
*Cezûyê meke, fesadê meke, mel'ûnê meke*
*Agırê kulê dı beyta mala bavê xwe ke*
*Cınazê Mıhemedê Eli, bavê Zayido, siyarê Tiklan*
*Lı orta meydanê xırab neke!..*

* * *

*De haylê, were haylê, were haylê were haylê...*
*Metê dêranê Meterani xopan wê bı kele ye*
*Berivanê Meterani xopan wê bı kele ye*
*Mıhemedê Eli Begê siyarê bozeki dêl-hıne ye*
*Metê tu nekuje Mıhemedê Eli, bavê Zayido, siyarê Tiklan,*
*Rojê oxırmê gıran berxê koza mala bavê te ye*
*Haylêêê...*
*Haylê haylê haylê haylê*
*Haylê haylê haylê haylê*
*De meke, metê meke, bêrivanê meke*
*Cezûyê meke, fesadê meke, mel'ûnê meke*
*Agırê kulê dı beyta mala bavê xwe ke*
*Cınazê Mıhemedê Eli, bavê Zayido, siyarê Tiklan*
*Lı orta meydanê xırab neke!..*

Institut kurde de Paris

## Mırına Evdal

Emrê Evdal ku jı sedi derbas dıbe, êdi ew minani berê nıkare kılaman bêje. Car-cara ku merıvên xatırnaz pêda dıkevın, jê daxwaza kılaman dıkın, ew ji bı nermê xwe va dıstırê. Evdal jı mala xwe ji zêde dernakeve naçe ciyên dın. Tenê hıne canan dıçe kêşa Intabê, dıgere. Lı wê kêşê ji Elmecit Bey û Eli Begê Heci Usıv Paşa pır qedrê wi dıgrên. Ew ku dıçe mala, Elmecit Begê, wi zû-zû bernade, demeke dırêj dıke mêvan, paşê baxşiş û xelatan dıdê usa bı rê dıke.

Rojeki Evdal ku jı gundê Elmecit Begê vedıgere, berbe gundê xwe tê, lı gundeki Intabê dıbe mêvan. Xelk tê dorê, jê kılaman dıxwaze. Evdal dıbê: "Heyran mın bıbaxşinın, dengê mın dernayê, ez nıkarım bıstırêm."

Gundi lava dıkın, dıbêjın: "Hema hêdi, hêdi jı nermê xwe va bêje!"

Evdal ku pêsira xwe jı gundiyan xılas nake, dest pê dıke, hêdi-hêdi jı nermê xwe va dıstırê. Bı wi awayi hıneki dom dıke, paşê xwe nagrê tê eşqê, dengê xwe bılınd dıke û dıqire. Bı qûrinê re nefesa wi pêk nayê, qırıka wi dıxıtıme û dengê wi dıbıre. Wê demê Evdal minani zarokeki rûdınê kûr-kûr dıgri. Paşê gundi lava dıkınê, dı ber dılê wi dıdın û wi bı rê dıxın.

Evdal nexweş dıkeve, çendeki dı nav ci da dımine. Rojeki

Institut kurde de Paris

kurê wi Mıhê tê, bala xwe dıdê ku nexweşya wi gıran bûye, rewşa wi ya mırınê ye. Mıhê ku dıçe lı ber serê wi dısekıne, Evdal jê ra dıbê: “Kurê mın, ez insaneki dılsoz û salıh ım, mın bı tu qûlê Xûdê ra xırabi nekırye, inşellah ezê ruspi herım hızûra Xudê.”

Peyra Evdal gazi nebyê xwe Emer dıke, jı kurê xwe û nebyê xwe ra dıbê: “Guh bıdne mın, ezê jı we ra tışteki bêjım; Mın guh neda mal û mılkê dunyalıgê, jı ber wê yekê em feqir ın. Lê mın jı we ra navek hiştiyê, ew defina we ye lawo. Ez bawer dıkım, heta ku dunya ava be, navê mınê bê gotın. Berhemên mın minani zêr ın, hezar sali ji dı bınê erdê da bıminın, ew zeng nagrın, narızın.”

“Pışti wexta tu were kılamên mın bêne jıbirkırın, lê du kılamên mın yên emegdar henın, ez naxwazım ku ew jıbir bın. Kılama Dêrsim û ya Xozanê. Ezê jı we ra wan kılamana rêz bı rêz bêjım, hun ji lı pey mın bêjın, wana jıber kın.”

Evdal bı desteki xwe va destê kurê xwe, bı destê dın va ji destê nebyê xwe dıgrê, dest pê dıke, hêdi-hêdi dıstırê; dıbê:

Dılêm lo lo, dılêm lo lo, dılêm lolo...
Dılêm lo lo. Dersım e lo xweş Dêrsıme
Avên çeman û kanya tê ser me da gıme gum û zıme-zıme
Ezê lı dêrsıma jêrın rasti se zerya hatıme
............

Evdal kılama “Dêrsım” rêz bı rêz, kelime-kelime jı wana ra dıbêje, bı wana dıde jıberkırın û dısekıne.

Hıneki bihna xwe hıldıde, paşê dest bı kılama “Xozanê” dıke.


Dıbê:
*Were wey Xozanê lê lê, lê lê, lê lê lı ber topê ye*
*Vê kalmastê bırano jı bextê mı ra lı ber topê ye*
*Heyla dı bınyê da zare-zara pez-kuvyê ye*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*De dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

*Heyla dı bınyê da zarê-zara pez-kuvyê ye*
*Herçi gava hunê pırsa Qeymezê Êzdi jı mı dıkın*
*De iro sê ro û sê şev e lı xozana xopan bê xweyi*
*/serkanyê ye.*
*Ax dılêm yar yar, dılêm yar yar*
*De dılêm yar yar, dılêm siyaro...*

Evdal wê kılamê ji yek bı yek jı kurê xwe û nebyê xwe ra dıbêje, bı wana dıde jıberkırın, paşê dengê xwe dıbıre, serê wi dıkeve ser balgi û can dıde.


Institut kurde de Paris

Gundê Topraqele (Gundê ku Evdal lê jiyaye)




Institut kurde de Paris

Gundê Qanciya (Gundê ku Evdal lê wefat kırye)




Institut kurde de Paris

Mezelê Evdal (Lı gundê Qanciya ye)



Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

# Beşa II

## *Hevpeyvin û belgeyên lı ser*

# Evdalê Zeynıkê

Institut kurde de Paris

# Evdıla Öztürk:

*Evla Begê Sılêman Begê, jı gundê Intabê Bado bû. Mın pê ra sala 1961'i û 1966'a da xeberda. Ev dı sala1961'i da 81 sali bû.*

- Mın Evdalê Zeynıkê dit û pê ra rewiti-hevalti ji kır. Evdal hatıbû cem apê mın Evdılmecit Begê. Apê mın qedrê wi dıgırt û jê hez dıkır. Wê çaxê salên wi nêziki sedi bûn, lê sıheta wi lı ci bû, lı ser xwe bû.

Ça ku dıgotın berya wextê kaliya wi dengê wi pır gumrah bûye.

Dıgotın wexta ku wi bı dengê bılınd dıstıra, dengê wi jı gundên der û doran dıhate bıhistın.

Ez wê çaxê 16-17 sali bûm, ez û Evdal em lı hespên xwe siyar bûn çûne gundeki. Dema ku hatına Evdal bıhistın, dı fırte-eyneki da şênyê gund hat tıji qonaxa me bû. Herkesi ew mereq dıkır û dıxwast ku dengê wi bıbıhize. Gundi pê da ketın, boy ku ew jı wana ra bıstırê.

Dengê wi êdi zêde dernedıket.

Evdal got: "Dengê mın dernayê, ez nıkarım bıstırêm."

Gundi pır pê da ketın, lava kırnê gotın: "Çı dıbe, hema bı hemdê xwe, nerme-nerm jı me ra hıneki bêje!"

Evdal dest pê kır, nerme-nerm sıtra. Paşê xwe negırt hate eşqê, dengê xwe ku hılda û kıre qûrin, nefesa wi pêk neani û deng dı qırıkê da xıtımi.

Lı ser wê, Evdal rûnışt û minani zareke pıçûk kûr-kûr gırya. Gundi ji pır poside bûn, lava kırnê, ber dılê wi dan, gotın: "Halê dunyayê ye, ber xwe nekeve!"

Gundi lı dora wi çûn-hatın, jê ra xızmet kırın, xurek hazır kırın anin, me ji nanê xwe xwar û em siyar bûn çûn.

Institut kurde de Paris

# Melle Şekır, jı gundê Çatê-Mılazgır:

*Mın pê ra dı sala 1966'a da xeberda. Ew wê çaxê 77 sali bû. M. Şekır, kurê kurapê Evdalê Zeynıkê ye.*

Melle Şekır, jı mı ra awha got:

"Tu ser serê mın, ser çavê mın hatiyi û rast hatiyi, ezê jı tera bejêm. Ez kurê kurapê Evdal'ım, em miratxurê hevın.

Mın hım Evdal dit, hım ji pê ra cinati kır.

Eşira me Memani ye, qebila me ji Pazûkiye. Memanan çar çıqın: Pazûki, Qesıki, Pınanşi û Banoki.

Eşira Meman jı welatê jêr hatye lı kêşa Patnosê bı cih bûye. Êl dı serê havinê da jı welatê jêr radıbe tê, lı hêla Sarısûyê, lı zozanên Quntara çiyayê Sipanê datine, pez û dewarê xwe dıçêrine û payizê disa vedıgere dıçe Welatê Jêr.

Dı zemanê İsmail Axa yê Zengûzêrin da êl lı wır bı cih dıbe, êdi venagere. Serokê eşira Meman İsmail Axa hım pır dewlemend bûye, hım ji merıveki bın nav û deng bûye. De usa dewlemend bûye ku zengûyên zinê hespê wi jı zêr bûne. Lema jê ra gotıne İsmail Axayê Zengûzêrin.

Wê çaxê, berya vegerandınê, careki berf 15-20 roji berya wextê xwe dıkeve û rê dırban dıxıtımine. İsmail Axa dıbine ku jı berfê êl êdi nıkare jı ciyê xwe bıleqe, ferman dıke, dıbê: "Hemmû dewaran şerjê kın, kuçıkan dadın, stilan lı ser rast kın, goştê wan têkın qeli, peyra holıkan vedın!"

Êl radıhêlê, dewaran şerjê dıke, lı ser kuçıkan sitılan rast dıke, hestiyên dewaran va agırê kuçıkan gur dıke û goştê dewaran dıke qeli. Paşê mêr radıhêlın bêr û tevıran, erdê dıkolın, holıkan çêdıkın û pezê xwe dıkın bıni. Êla Meman wê zıvıstanê dı holıkên bın erdê da derbas dıkê, êdi lı wır bı cih

dıbe û dımine.

Êla Meman bı zeman va lı hev zêde dıbe, êdi lı wır naeşıre, jı êlê hınek pêda-pêda bar dıkın dıçın, ciyên dın. Anıha xênci Patnosê, lı deşta Elajgırê, lı Intabê, lı Mılazgırê, lı Parsin û Xaylazê gellek gundên Memanan henın. Ew gışk jı wır çûne.

Em ji dı wexta kalkê kalkê mın da hatıne lı Cemalvêrdi (gundê Intabê) bı cih bûne. Evdal lı Cemalvêrdi hatye dunê.

Evdal hê pıçûk bûye bavê wi dımıre, êtim dımine. Navê diya wi Zeynê bûye. Diya wi lı ser mala xwe dımine û wi xweyi dıke. Lema Ewdal bı navê diya xwe hatıye naskırın. Zeynê jıneke pır bı qedır û bı rûmet bûye, jı ber vê yekê cinaran jêra gotıne: "Zeynık"

Evdal denbêjeki pır mezın bû, hım ji şair bû. Xudê dabûyê.

Evdal pır geryabû û ewi egellek tışt dıtıbûn derbas kırıbûn. Ewi çı ku ditye, derbas kırye, lı ser gışka kılam derxıstiye. Ew kılaman anıha ji dı nav xelkê da têne gotın.

Yên ku kılamên Evdal baş dızanın, lı Dıgrûgê Sıloyê Gulê, lı Cemalvêrdi Bedihê kor e. Nebyê wi, Emer ji kılamên wi dızane û ew bı xwe ji dengbêj e. Bedihê Kor lı cem Evdal himi denbejyê bûye. Mala nebyên wi lı Qanciya ye, tu here wıra!

Institut kurde de Paris

# Emerê Zeynıkê:

*Nebyê Evdal, jı gundê Qanciya (Qereyazi) Mın dı sala 1966'a da pê ra xeberda, ew wê çaxê 65 sali bû.*

"Mın kalkê xwe dit û kılam û meqamên xwe ji wi hıldan. kalkê mın sal û niveki. du salan berya şer wefat kır. (Şerê dunyayê I) Ez wê çaxê dozde-sêzde sali bûm.

Ew dengbêjên me yên Serhedê bı pırani lı gor qaide û meqamên wi dıstırên. Şeroyê Bıro, ewê ku dı radyoya Rewanê da dıstırê, ew hema hema minani kalkê mın dıstırê.

Kalkê mın lı Cemalvêrdi hatye dunê (gundê Seregola). Wexta ku wefat kır, kalkê mın sed û deh sali bû.

Kalkê mın hê pıçûk bûye bavê wi mırye û diya wi ew mezın kırye.

Kalkê mın seri da dengbêj nebye. Hetani ku salên wi jı bist û pencarn derbas bûne, ewi kılam-mılam negotıne. Hetani wê dema emrê xwe ji ewi, minani herkesi bı rêncberya xwe û bı cot û cobarê xwe ra mıjûl bûye.

Dı wê dema emrê xwe da kalkê mın şeveki xewneki dıbine. Dı xewnê da vedıreşe, garısên hûr jı qırıka wi tên xarê. Rispiki gund hebûye, mêrık hım rispi, hım ji alım bûye. Sıbetırê kalkê mın dıçe cem wi. xewna xwe jê ra dıbêje. Rispi xewna wi waha şirovedıke; dıbê: "Xudê xewna te bı xêr bıke kurê mın. Heke te ew xewna dı 15 sali ya xwe da bıdita. tê bıbûyayi alımeki mezın, heke te dı 20 sali ya xwe da bıdita, tê bıbûyayi merweki pır dewlemend, lê te ku ev xewna dı vê çaxa emrê xwe da ditye, ez bawer dıkım tê bıbi dengbêjeki pır mezın ku heta dunya ava be, nav û dengê te wê bê gotın."

Pıştî wê xewnê kalkê mın dıbe dengbêj, nav û dengê wi dı zemaneki kurt da lı her derê bela dıbe û tu dengbêj nıkare pê

Institut kurde de Paris

ra bıstırê.

Dema ku nav û dengê kalkê mın bela dıbe, wê çaxê dengbêjeke Surmeli Memed Paşa ya qiz hebûye, navê wê Gulê bûye. Gulê ji dengbêjeke pır baş bûye û bı xwe ji Fılle bûye. Hetani wê rojê Gulê bı gellek dengbêjan ra ketye lecê, her tım bırserketye. Tu kesi jı wê nebırye. Gulê qizeke bakıre bûye, ewê ehd kırye, gotye "Kê ku bı mın ra bıkeve lecê û jı mın bıbe, ezê wi mêr kım."

Kalkê mın qerara xwe dıdê, xwe hazır dıke ku here ser Gulê û pê ra bıkeve lecê.

Kalkê mın go: "Rojeki mın bıhist ku lı Xamûrê dewet heye û Gulê ji lı wêderê ye."

Go: "Ez rabûm, mın hespê xwe kışand, zin lê kır, lê siyar bûm, jı Cemalvêrdi bı rêketım çûme Xamûrê."

Go: "Wexta ku ez deri da ketım hurdur, mın nıhêri diwan waye tıji ye, Gulê lı ser doşegên qutni-qumaş rınuştiye, cot bı cot balgi lı ber-pala wê ne, dıstırê."

Go: "Mın dı dılê xwe qerar dabû ku ez serida xwe beyan nekım, jı rêya dûr hatıme westiya me, demeki bihna xwe hıldım, paşê xwe beyan bıkım."

Go: "Gulê dı wê neqebê da ku kılamek xılas dıkır, vedıgerya ser mêvanên teze-hati, bı kılamki merhabati dıda wana."

Go: "Demeki şûnda Gulê ez ferq kırım, vegerya ser mın, bı kılamki merhebati da mın ji."

Go: Wê çaxê êdi mın xwe negırt, ez dı ci da qiryam, mın ji bı kılamê bersiv dayê."

Go: "Mın go Gulê ez Evdalê Zeynıkê me, hatıme ser te."

Êdi ew û Gulê dıkevın pêsira hev dıstırên. Leca wan sê ro û sê şeva dom dıke, dawyê da Gulê dest lı ber kalkê mın dati-ne. Kalkê mın Gulê nastine, çımki ew wê çaxê zewıci bûye.

Pışti leca wan Surmeli Memed Paşa kalkê mın dıbe dıke dengbêjê xwe. Kalkê mın merıveki secih bûye. Memed Paşa gundê Bêdır (lı Elajgırê) dıdê, lı ser tapi dıke, dıbê: "Mala xwe bıbe, dı Bedır da bı cih be!"

Institut kurde de Paris

De wê çaxê Surmeli Memed Paşa hukumdarê wê kêşê bûye û her tışt dı destê wi da bûye. Kalkê mın naxwaze, dıbê: "Ev dayina hanê ya ku Xudê daye mın, besi mın e, ezê çı bıkım bı gund."

Memed Paşa merıveki pır bı hêrs û xezeb bûye. Tu kesi newêrıbye lı ber wi xeberde, yan ji tışteki jê ra bêje. Lê kalkê mın lı cem wi destûrdayi bûye.

Careki begeki Türkmanên Nexşiwanê Memed Paşa teklif dıke bo kıribatyê. Memed Paşa gıre-gırên xwe hıldıde dıçe, kalkê mın ji bı xwe ra dıbe. Memed Paşa çav beri bûkeke Türkmanan dıde, lı kêfa xwe mêze dıke û zemaneki dırêj lı wır dımine. Ew gıre-gırên wi yên ku pê ra çûne, jı wê rewşê pır acız dıbın, lê kes newêre dengê xwe bıke û jı Paşê ra tışteki bêje. Demeki dı nav xwe da qıse dıkın, dıqıl-qılın, dıbên: "Welle ancax Evdal dıkare jı me ra çareki bıbine."

Pey ra dıçın bı kalkê mın ra xeberdıdın, dıbên: "Evdal, evi hatye lı vıra lıngên xwe daye erdê, lı kêfa xwe dınhêre, çavên zar û zêrçên me ji nıha lı rê ne, em bextê te da ne, lı çareki mezeke, viyayi rake!"

Kalkê mın dıbê: "Ez ku viyayi jı vır rakım, hûnê çı bıdne mın?"

Ew ji dıbên: "Heyran tu wiyayi jı vır rake, hema tu çı dıxwazi emê bıdın."

Kalkê mın dıbê: "De baş e, ezê wi rakım, lê her yeki jı we hûnê yek zêri bıdın."

Çamêrna dıbên: "Hay hay, tu wi rake, emê bıdın."

Êvara wê rojê, wexta ku cımaeta Paşê kom dıbe, kalkê mın dest pê dıke jê ra kılameki dıbêje. Bı pırsên gıran û tûj va wi rexne dıke.

Gıre-gır dıtırsın, dıbên: "Me yeke ça kır, ewê bê xezebê, jı rûyê me da ewê tışteki bine serê Evdal."

Lê ew tırsa wan vala derdıkeve, Paşa dengê xwe nake, ser da vedırgere ser cımaeta xwe, dıbê: "Gotına Evdal e, rabın, hazırya xwe bıkın, emê sıbê bı rêkevın."

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Bı wi teheri Memed Paşa û gıre-gırên wi sıbetırê radıbın, bı rê dekevın û ıı Nexşivanê tên.

............

Wexta ku Surmeli Memed Paşa dıçe Xozanê, kalkê mın ji bı xwe ra dıbe. Ew ne tenê dengbêjê Memed Paşa bûye, rispi wi bûye ji. Rê ya wan dı Dêrsım ra derbas dıbe. Dêrsım ji wê çaxê lı ber dewletê dı halê asêbûne da bûye. Şayişan dıkın ku xelkê Dêrsımê tışteki bı wan bıke.

Lê tıştek nabe, ew bı sılameti derbas dıbın dıçın. Tebieta Dersım a hov û har tesireke mezın lı kalkê mın dıke. Kalkê mın lı ser Dersım û bedewên Dêrsım, kılama “Dêrsıme, xweş Dersım e” derdıxe. Ewi jı wê kılama xwe pır hez dıkır.

............

Memed Paşa ku xwe dıghine Xozanê dı nav leşkerê wi û Türkmanan da şer-mer nabe. Lê hewa wêderê pır germ bûye, jı germê nexweşi derdıkeve. Ew kesên ku bı Memed Paşa ra dıçın, gışk qır dıbın, jı wana 40-50 kes dıfılıtın û paşta tên. Gelelk mêrên mêrxas dımırın. Apê kalkê mın Reso û kurapê wi Feqi Elyê piri ji dımırın. Reso rispiyê Memed Paşa bûye, F.Elyê piri ji melayê wi bûye. Dı kılama “Wey Xozanê” da çend navê wan kesan derbas dıbe.

Leşkerê Memed Paşa qefle-qefle dımıre, herçiyên ku sax dımının ji jı hev dıqetın, pire-pireyi dıbın, heryek lı yalikida dıçe.

Mıhineke Reso yê ape kalkê mınipır baş hebûye, navê wê Senem bûye. Pıştı mırına Feqi Elyê piri û Reso, kalkê mın lı hespê xwe siyar dıbe, Senemê hıldıde destkêşê, dıkeve rê û dajo. Ango jı Xozanê û xezeba Xozanê dıreve. Ew dajo, tê dı . Deşta Heranê ra derbasi kêşa Diyarbekrê dıbe, paşê dı Gelyê Xerza ra, dı newala Bıdlisê ra tê xwe dıghine welat.

Wexta ku ew dı Gelyê Xerza ra derbas dıbe, rasti cerdê û rêbıran tê. Rêbırên Gelyê Xerza dıdın pey, dıxwazın ku wi bıgrên bıkujın û Senemê ji jı xwe ra bıbın. Kalkê mın bı lez û zerp dajo, dema hespa ku dıbınê wi da bûye dıweste, jı ser

Institut kurde de Paris

pışta wê qıli ser pışta ya dınê dıke, usa-usa hespan lı ber hev dıguherine, dajo û xwe xılas dıke.

............

Pışti mırına Memed Paşa, Çerkezên Kelê pır şa dıbın, lı def û zurnê dıxın û şênayê çêdıkın. Serokê wana ji Çerkez Omer bûye. Dewletê jı bona ku hukmê Memed Paşa bıterıbine, Çerkez Omer tevi êla wi jı kêşa Sariqamişê anye lı wır bı cih kırye. Çerkez Omer kırye qaymeqam, bırayeki wi kırye qumandarê cendırman, yên dın ji kırıne cendırme. Lê wana jı tırsa Memed Paşa nıkarıbûne xwe zêde tevdın. Bı mırına Memed Paşa va meydan jı wana ra dımine. Lı gor hınek gotınan ji dewletê bı qest Memed Paşa şandiye Xozanê, ku bıra tıştek bê seri û dewlet ji jı wi xılas be.

Çerkez ku usa dıkın, dı nav wan û kurên Memed Paşa da şer derdıkeve û hevdu dıkujın. Kurê Memed Paşa yê mezın Evla Beg û du bırayên wi, Çerkez Omer, bırayên wi û çend cendırmên Çerkezan dı wi şerri da tên kuştın.

Pışti mırına Memed Paşa û wê hevkuştınê, kalkê mın mala xwe bar dıke û carke dın tê Cemalvêrdi. Zemaneki ji lı wır dımine, paşê mala xwe bar dıke tê Qanciya.

............

Kalkê mın car-caran bı gundiyên xwe ra bı kawrani dıçe Erzurumê. De wê çaxê minani nıha rê û dırb tunebûne. Barbırên wana jı ga bûne. Gundi gayên xwe bar dıkın û dıkevın rê. Rê ya wan a Erzurumê ji pırri caran dı Çulyê ra derbas dıbe. Careki ew ku dıçın Erzurumê û vedıgerın, tên jı ava Erez derbas dıbın û berê xwe dıdın Çulyê. Paiz bûye, şıli ji dest pê dıke dıbare, wext ji êvar bûye. Ew, wextê razanê xwe dıgıhinın Çulyê, lê şıli ji wana perişan dıke. Kawranê wan kawraneki mezın bûye, çıl ga bı wan ra bûne. Dıçın lı derê gundiyan dıxın, dıkın û nakın kes deri lı wan venake. Kalkê mın jı hevalên xwe ra dıbê: "Hûn jı mın ra sıvder-mıvdereki bıbinın, em têkevın bıni, ez hema heveki serê xwe jı şılyê bıparêzım, ezê deng lı gundiyan bıkım, jı we ra çareki bıbi-

Institut kurde de Paris

nım."

Hevalên wi vırda-wêda mêze dıkın, sıvdereki dıbinın, kalkê mın dıkeve bınê sıvderê, bı ser gund da dıke qirin û kılaman dıbêje. De dengê wi pır gumrah bûye. Demeki şûnda gundi jı malen xwe derdıkevın têن, pırs dıkın dıbên: "Ev ki ye, çi ye?"

Wexta ku hevalên kalkê mın dıbên: "Ev Evdalê Zeynıkê ye." gundi şa dıbın wan hevalên wi û gayên wana dı nav hev da bela dıkın, wana dıbın dıkın mêvan.

Bejna kalkê mın kınık bûye, rûyê wi ji bı xuri bûye. Pıçûkti da bı nexweşya xuryê ketye, lema rûyê wi bı xuri bûye. Ango dı husnê dunyayê da usa keşxe nebûye. Lê nav û dengê wi ku usa bela bûye, lı her derê navê wi hatye bıhistın, dı çavê xekê da, dı hışê xelkê da ewi weki hûteki, weki merıveki keşxe cih gırtiye. Wexta ku dıçe ciyeki xerib, dıbê: "Ez Evdalê Zeynıkê me," kes jê bawer nake. Kingê dıstırê û kılaman dıbêje, wê çaxê bawer dıkın, dıbên: "Belê, ev Evdalê Zeynıkê ye."

Wê şevê lı Çulyê radızên, sıbetırê dema ku radıbın û dıxwazın herın, gundi izna wana nadın. Dıbêjın: "Hemi waye dı gund da dewet ji heye, bıra Evdal û hevalên wi çend roja mêvanê mebın."

Kalkê mın û hevalên wi sê-çar roja lı wır dıminın. Lı qonaxa kalkê mın navrojê tinın. Lê şêni tıji wıra dıbe, nahêle ew navrojê buxwın. Navroja wan ji xaşil bûye. Kalkê mın go: "Mın kevçik xaşil duxwar, jı kılameki çend rêz dıstıra."

Qizeke malmezınê gund hebûye. Ew ji tê qonaxa kalkê mın, dıxwaze ku wi bıbine. Qizık, keçıkeke mêrani û bê perwa bûye. Wexta ku jı deri da dıkeve hundur, şêni dıqelêşe, dıbê: "Hela veçıxın-veçıxın, dıbên Evdalê Zeynıkê hatye, ka ez bıbinım çıka yeki çawa ye?"

Şêni jı hev vedıçıxe, dema ku qizık pêşta tê û kalkê mın dıbine, dıbê: "Piii... Evdal-Evdal dıgotın, Evdalê Zeynıkê ev e!... Xazi bı navê Evdal, ne bı ditına wi!.."

Ew pırsa wê keçıkê dıbe darbimesel, dı nav xelkê da tê gotın. De anıha ji dema ku yek jı tışteki, an ji jı yeki xeyalşıkesti dıbe, wê pırsê dıbêje: "Xwezi bı navê Evdal, ne bı ditına wi." Ew pırs, ya wê keçkê ye.

Kalkê mın dest pê dıke, dı kılaman da ku pırsa davêje ber keçkê, qizık şermi dıbe, jı wır derdıkeve dıçe mala xwe.

Deweta gund wê êvarê bûye, gundi kalkê mın hıldıdın dıbın dewetê.

Kalkê mın go: "Mın nıhêri şêni tıji merekeke mezın bûye, def û zurne lê dıxe, xort û qiz bûk ketıne govenda cergobez, dıleyizin."

Go: "Mın nıhêri wê keçkê ji destmalek hıldaye destê xwe, ketye serê govendê, bı eşqû şewq dıreqıse."

Go: "Ez ku ketım govendê, mın ça ku sıtra, defçi û zurneci sekinın. Govend gerya û mın got, dawyê da mın kılam avêtın ser wê keçkê."

Go: "Keçık heybere, heybere jı serê govendê şıqıti hat kete destê mın. Jı mın ra got: "Evdal ez dı bextê te da me, êdi bes e, te ez rezil kırım."

Go: "Mın go: qizê lawo, te ez rezil kerım, lema mın ji tu rezil kıri, a ija êdi em bûn weki hev, belê bese."

............

Kalkê mın kor dıbe, çavên wi heft sala nabinın. Çend sal beri korbûna wi şer derdıkeve, dıbe mıhaciri, ew dırevın. Dı wê revê da kalkê mın lı kêleka rê rasti qundaxa zareke kurin tê. Temo, ew e. Ango kurê wi bı xwe nin e, lê ew Temo her tım dı ser kurên xwe yên rasti ra dıgrê û wi mezın dıke. Temo ku dıbe 7-8 sali, çavên kalkê mın kor dıbın. Wê çaxê Temo bı destê wi dıgrê, dıgerine û xızmeta wi dıke. Êdi idara wi berê Xudê, paşê Temo bûye. Ew hemmû kılamên xwe lı ser navê Temo dıbêje. De dıbê: "Evdalê Zeynıkê, siyarê kuvi, bavê Temo..."

............

Pışti korbûnê kalkê mın desteng dıkeve. Ew êdi jı halê xwe

Institut kurde de Paris

ra bı şev û roj dıbêje. Wextê bıharê ku qulıng tên, dılê wi xıra dıbe, lı ser qulıngan kılaman dıbêje. Zarên gund rojeki dı mêrga bınya gund da rasti qulungeki tên. Bala xwe dıdınê ku qulıng nafıre. Zar wi dıgrên tinın dıdın kalkê mın. Dıbên: "Evdal jı qulıngan pır hez dıke. em vi qulingi bıdnê, bıra pê bina wi derkeve."

Kalkê mın destê xwe lê dıgerine, dıbê: "Baskê wi şıkestiye, ew ji minani mın bırindar e, jı heval û hogırên xwe maye."

Paşê tine baskê qulıng derman dıke, gırêdıde, êdi bı şev û roj lı ser xwe û qulıngê xwe dıbêje. Qulıng ji usa himi wi dıbe, ew ku kuda dıçe qulıng dıde pey, jê naqete. Ango ew û qulung jı hevra dıbın heval.

............

Dı nav xelkê da usa tê gotın ku çavên kalkê mın bı xwe vebûne. Ev usa nine. De dı kılamê da dıbê: "Temo lawo çavê bavê te ne kor ın, ava reş e."

"Ava reş" katarak e. Ango çavên wi qatarak bûne.

Wê çaxê hekimên çava hebûne, dı nav xelkê da geryane - minani van mırtıbên nıha ça ku dıgerın, dıranan çêdıkın- nexweşyên çava yên usa derman kırıne û sılamet kırıne. Wê çaxê hekimên çava yên heri baş, yên zana, hekimên İranê bûne. Rojeki jı İranê hekimên çavan ku tên wê kêşê, çavên kalkê mın derman dıkın, paşê çavên wi vedıbın.

Lê wê demê tışti heri balkêş, bı vebûna çavên kalkê mın ra, baskê qulıngê wi ji dıcebıre, sılamet dıbe û qulıng dıfıre û lê dıxe û dıçe.

Saleki-du salan pışti saxbûna çavên kalkê mın, Temo ji nexweş dıkeve û dımıre. Temo wexta ku mırye 15-16 sali bûye. Kalkê mın pır ber Temo dıkeve û navê wi dıke nişana xwe.

............

Mırana kalkê mın baş tê bira mın, ez wê çaxê dozde sali bûm.

Kalkê mın nexweş bû, dı nav ci da bû. Wexta ku nexweşya wi gıran bû, bavê mın jê ra got: "Ez herım gazi melle kım, bıra bê lı ser te bıxûne!"

Ewi destê xwe bılınd kır, got: "Na, na, gazi melle neke! Emelê merıv ku baş nebe, mellê jı merıv ra çı bıke... Ez insaneki muxlısım, mın bı tu qulê Xudê ra xırabi nekırye. Bı izna Xudê ezê bı rûyeki sıpi herım hızûra wi."


Pey ra jı me ra işmar kır, got: "Guh bıdne mın, ezê tışteki jı we ra bêjım."

Bı desteki xwe va destê bavê mın gırt, bı destê dınê va ji destê mın gırt û waha got: "Du kılamên mın yên emegdar henın, kılama Xozanê û ya Dêrsım. Pışti mırına mın tu were kılamên mın bên jıbirkırın, lê ez dıxwazım ku ev herdu kılamên mın neyên jıbirkırın. Hemi hun wan kılaman jı xwe dızanın, ezê nıha wana kelime-kelime jı we ra bêjım, hun ji lı pey mın ducar kın, wana rınd jıber kın!"

Pey ra wi dest pê kır, bı dengeki nımız va sıtra. Wi pırsên kılaman sê car, çar cara got, bı me da gotın. Dema ku wi gotına kılamên xwe xılas kır, dengê xwe bıri, bı dılgeşi lı me nıhêri, pey ra serê wi kete ser balgi û teslim bû.

Institut Kurde de Paris

# Beşer Berke:



*Kurê nebyê Evdalê Zeynıkê. Nıha mala wi lı Menemenê ye. Mın dı sala 1992 û 1993'ya da pê ra xeberda.*

- Jı kılamên kalkê mın gellek dı bira mın da bûn, paşê mın jıbir kırın, nıha jı wan kılaman tenê çend ferd tên bira mın. Heyderê bırayê mın jı herkesi baştır dızane, tu here wi bıbine, ewê jı te ra bêje.

Kılama Metê (ya Mıhemedê Eli Begê), kılama Seraya Mamed Axa, ya Sıncari Talo û ya Qelenyê; ew kılamên Evdal ın.

Ew kılama Qelenyê ku dıbêje:

*"De lo lo, lı Qelenyê tê sureki sar e*
*Taxıma destê bavê Zayidê kekê Zezê*
*Gılazu welatê jêr e, imama serikaribar e*
*Eskerê kufirê Ecem hezar û pênsıd e*
*Eskerê bavê mı pênsıd e, pê nıkare."*

Institut kurde de Paris

Ew kılama Şakro û wan dengbêjên dın jı Emerê apê mın (Emerê Zeynıkê) hıldane.

Evdal ku bûye dengbêjê Surmeli Memed Paşa, wi gundê Bêdır dayê, lı ser qeyd kırye, lê ew neçûye wır. Lı pêşya gund axpineke mezın heye, nıha jê ra dıbêjın "Axpina Mala Zeynıkê".

Sedemê vê, Evdal çûye jı gundiyan ra gotye: "Tenê vê axpinê jı mın ra bajon, nanê wê jı mın ra sal bı sal bışinin, besi mın e, bıra gund jı we ra be."

Anıha ji ku merıv hebın, merıv here wê qeyda gund derxe, mêrıv dıkare dewa Bêdır bıke.

............

De nıha hınek dıbêjın ku Evdal lı Gomıka Mılazgırê mırye, merzelê wi lı wêderê ye. Ew ne rast e, Evdal lı Qanciya wefat kırye, merzelê wi jı lı wıra ye. De tu wê salê hatıbûyi, apê mın ê Zeynel nişani te dabû. Me bavê mın ji lı kêleka merzelê wi defın kır. Ango merzelê wi û yê bavê mın (İsmail) lı kêleka hev ın.

Bırayê kalkê mın, ango kurê Evdal yê mezın Hamê ku jı bavê xwe cıhê dıbe, dıçe dı Gomıkê da bı cih dıbe, paşê lı wıra wefat dıke. İja jı hınek kesan wetrê ewê ku lı Gomıkê wefat kırye, kurê Evdal nine, ew Evdal bı xwe ye.

Wexta Şerê Hemûdunyayê Yekemin derdıkeve, Ûrız davêje ser welat, kalkê mını Mıhê û zarên bırayê wi bı hevra dırevın, hetani serê Pıra Seyda bı hevra dıçın. Lı wêderê jı hev dıqetın û hevdu wunda dıkın. Pıştı şer ji kalkê mın jı wana tu xebereki hılnade. Navê kurên Hamê Akıf, Sıdiq û Qerebalıx bûne. Lı gor salıxan ew çûne lı kêşa Bıdlisê bı cih bûne.

Em hertım pırs dıkın, belki rojeki emê jı wana xebereki hıldın.

............

Evdal mala xwe bar dıke, dıçe Dedewêrana Xınûse. Du sala lı wır dımine, jı ehlê wê kêşê acız dıbe, carke dın bar dıke tê Qanciya.

Institut kurde de Paris

............

Kalkê mın Mıhê lı gundê Koşk a Xınûsê wefat dıke. Emrê wi jı sedi zêdetır bû. Ew wê çaxê lı cem kurê xwe yê pıçûk Zeynel bû.

............

Evdal, sed û pazde sali emır kırye.


Temo kurê wi bı xwe nebûye, ewi Temo dı dema revê da lı kêleka rê ditye, bırye mezın kırye. Evdal jı kurên xwe yên rasti bêtır jı Temo hezkırye. Temo ku êtim û bı kes bûye, ewi mêla xwe daye ser wi û ew jı xwe ra kırye sembol. Jı ber vê yekê ewi hemmû kılamên xwe lı ser navê Temo gotine.

Temo wi qulıngê baskşıkesti lı çolê dıbine û jê ra tine.

Evdal ku kuda dıçe, Temo ji davêje terkiya xwe, bı xwe ra dıbe. Du-sê salan pişti vebûna çavên Evdal, Temo dımıre. Temo wê çaxê 16-17 sali bûye.

Institut kurde de Paris

# Heyder Berke:



*Heyder Berke Kurê nebyê Evdal e. Nıha mala wi Istenbolê ye. Mın dı sala 1967 û 1992'ya da pê ra xeberda.*

Institut kurde de Paris

Heyder awha got:

- Ehmed Efendi, tu ser serê mın, ser çavên mın hati, tu bı xêr û sılamet hatı. Tu hatiyi pırsa Evdal jı mın dıki. Ez kurê nebyê Evdalı ım, kurê İsmail ım, İsmail kurê Mıhê ye, Mıhê ji kurê Evdal e. Eşira me Memani ye, qebila me ji Pazûki ye.

Kalkê me yê heri pêşin jı Hemzıkayê Elazgırê ye.

Evdal bûye dengbêj, paşê çûye cem Surmeli Memed Paşa.

Pıştì wefata Memed Paşa, kurên wi û Çerkez lı hev dıxın, hev dukujın, peyra Evdal mala xwe bar dıke dıçe Cemalvêrdi (Gundê Intabê).

............

Waye tu dıbêji ku Emerê apê mın gotiye Evdal lı Cemalvêrdi hatye dûnê, ez baş nızanım, herhal gotına apê

mın rast e.

............

Lı Cemalvêrdi Evdal çend salan maye, êdi ez nızanım, jı wır ji bar kırye hatiye Qanciya (Gundê Gelyê Beraza).

Evdal hetani wefata xwe lı Qanciye maye; sê sal, yan ji dû sal berya Şerê Hemudunyayê Yekemin wefat kırye, merzelê wi lı Qanciya ye. Anıha çavên mın tunın, nabinın, heke yeki mina te bı mın ra be, ez herım wır, ez dıkarım merzelê wi nişandım. Merzelê wi, dı nav mexberê gund da lı yalê jor ê. Rıhmetyê bavê mın rayi mın dabû. Lı serdesti merzelê wi merzelek heye, kêlıka wê sor e, dırri lı ser e û kêlık ji qul e.

Merzelê Evdal hema dı bınê wi da ye.

............

Ça ku kalkê mın jı mınra got, Evdal hetani ku dıbe 30 sali kılam,mılaman nabêje.

Kalkê mın go: "Mın lı Berdava Intabê dıxwend, feqiti dıkır. Go: "Jı mın ra xeber şandın ku bavê mın nexweş e. Ez ji rabûm hatım mal."

Go: "Bavê mın şeş mehan dı nav cida ma. Şeveki berbe sıbê diya mın gazi mın kır, got: "Feqi Mıhê hela rabe, bavê te din bûye."

Go: "Ez rabûm, mın bala xwe dayê ku bavê mın dengê xwe hıldaye, hema jı hundırê xwe da dıkelıce. Ça dizıka bulgur dıkele û dıkelıce, bavê mın ji usa. Mın dızanıbû ew deng mina dengê kıman e, lê heta wê demê mın tışteki usa jê nebıhistıbû.

Go: "Mın got bavo, çı bı te bû ku tu waha dıki?"

Go: "Wi got lawo mın xewın dit, dı xewnê da kaleki serê mın bılınd kır, hebanek garısê hûr beri qırıka mın da."

Kalkê mın go: "Pışti wê şevê Xudê dayê û wi dest bı dengbejyê kır."

............

Wexta ku Evdal lı cem Surmeli Memed Paşa bûye, havin havinan jê izna xwe dıstinê, dıçe dı nav xelkê da çıl şevi, du

mehan dıgere û paşê vedıgere Kelê.

Careki Evdal ku disa dıçe gerê, dengbêjeki beredayi ji wê çaxê dıçe İranê, lı mala Tarxanê Qelenyê dıbe mêvan.

Tarxanê Qelenyê jê dıpırse dıbê: "Xorto tu jı kiderê yi?"

Ew merıv dıbê: "Ez xelkê Elajgırê me."

Tarxan Beg dıbê: "Mın bıhıstiye ku dengbêjeki Surmeli Memed Paşa heye, navê wi Evdalê Zeynıkê ye, gelo ev çıto dengbêj e?"

Ew dıbêje: "Welle Evdalê Zeynıkê hema ez bı xwe me."

Dıbe êvar, cımaet ku kom dıbe, Tarxanê Qelenyê dıbê: "De waye rınd lı hev hatye, işev şeva Şêx Sılê û Evdalê Zeynıkê ye."

Pey ra vedıgere ser Şêx Sılê dıbê: "De tu kılameki bêje, bıra şerma dengbêjê xerib bıreve û em ji wê guhdari kın!"

Şêx Sılê dengbêjeki pır bı nav û deng bûye.

Şêx Sılê dest pê dıke, kılameki dıbêje. Pey ra ku ew merıv dest pê dıke kılam dıbêje, camêrna bala xwe dıdınê ku wayê ew qet nızane bıstırê. Kelimeki lı vır dıxe, ya dınê ta lı Muşê dıxe.

Ew cımaeta Tarxanê Qelenyê şaş û me'tel dımine, pê tıranê xwe dıkın.

Lı ser wê bûyerê Tarhxaanê Qelenyê jı Memed Paşa ra nameki dışine. Dı namê da dıbêje: "Ne tu, ne ji navê te... Tu çıto Surmeli Memed Paşa yi ku dengbêjê waha beredayi xweyi dıki... Dengbêjê te Evdalê Zeynıkê hate vır, bı dengbêjê mın ra kılam got, lê qe nızanıbû bıstırê."

Wextê ku Surmeli Memed Paşa wê namê hıldıde, Evdal hê jı gera xwe venegeryayi bûye. Çendeki şûnda wexta ku Evdal vedıgere tê, Memed Paşa jê dıpırse, dıbê: "Evdal tu vê carê çûbûyi kiderê?"

Evdal dıbê: "Ez çûbûm kêşa Mılazgırê, nav Hesenan."

Dıbê: "Tu dı yalê İranê da neçûyi?"

Evdal dıbê: "Na welle, ez neçûme İranê"

Memed Paşa dıbê: "Hela were rûnê, ezê tışteki jı tera

Institut kurde de Paris

bêjım"

Ev ku rûdınê, Memed Paşa jı bêrıka xwe nama Tarxanê Qelenyê derdıxe dıde destê katıbê xwe û jı Evdal ra dıde xwendınê.

Memed Paşa pır hêrs dıkeve, dıbê: "Heyran qoce Tarxanê Qlenyê çıma wê vırra bıke?.. Tu dı fılan wexti da çûyi İranê, te bı dengbêjê wi ra straye û dengbêjê wi beri te daye, tu ija inkar dıki?.."

Evdal dıbê: "Bıra Paşa xweş be, ev xebera derew e, ne rast e û ez neçûme İranê... Yeqin yeki beredayi çûye wıra, ewi xwe bı navê mın daye naskırın û tıştеki waha bûye. Tu yeki mina Emerê Heci İso bıde, bıra bı mın ra bê em tev herın İranê. Emê herın, bıra ew bıbe şahıd, ezê bı dengbêjê Tarxan ra bıkevım lecê, dıbe ji ku mêrık jı mın zêde be, dest ser desta ra ye hetani erşê ezmanan."

Lı ser wê gotına Evdal, Surmeli Memed Paşa nameki dınıvisine dıde Emerê Heci İso, wi û Evdal dışine İranê, cem Tarxan Begê Qelenyê.

Ew ku dıçın İranê, lı mala Tarxanê qelenyê dıbın mêvan, ew ewılі xwe beyan nakın.

Êvarê ku cımaet dı diwana Tarxan da kom dıbe, Şêx Sılê dest pê dıke dıstırê. Dema ku Şêx Sılê dıstırê, -de mêrkê dengbêj usanın- tebati nakevê û Evdal dı ciyê xwe da dıqılqıle. Jı cemaetê yeki mina te jê ra dıbê: "Mêvanê teze du çıma dıqıl-qıli, dıbe ku tu ji denbêji?"

Evdal dıbê: "Êê... welle herge ku cemaet destûrê bıde, ezê ji kılameki bêjım."

Belgiki tinın datinin, Evdal lı ser balgi rûdınê -de ev hıneki hurık bûye- dest pê dıke, dıqire û dı kılamê da xwe beyan dıke dıbê: "Evdalê Zeynıkê ez ım."

Êdi ew û Şêx Sılê dıkevın lecê, heft roj û heft şevan bı hevra dıstırên. Her tenê jı bo nanxwarınê û ferza Xudê, ew radıwestın.

Dawyê da dengê Şêx Sılê dıkeve, qırıka wi dıxıtıme û Şêx

Sılê dest lı ber Evdal datine. Şêx Sılê jı Evdal ne kemtır bûye, ew ji denbêjeki pır xurt bûye.

Şêx Sılê serdestiya Evdal dı kılamê da waha tine zıman. dıbê:

"Bejna Evdalê Zeynıkê ne kın e, ne dırêj e
Minani tak-rıhanê lı devê şax û mesilan şax davêje
Bıra Tarxanê Qelenyê û Emerê Heci İso lı mın şehed bın
Ew cımaeta ku lawê Zeynê lê be, kes nebêje Şêx Sılê dengbêje."

Wê demê Tarxanê Qelenyê ku hêrs dıkeve û lı Şêx Sılê tê xezebê, Evdal davêje ber û waha dıbêje:

"Belê rast e, bejna Evdalê Zeynıkê ne kıne, nı dırêje
Minani tak-rıhanê lı devê şax û mesilan şax davêje
Ancax şaıreki minani Şêx Sılê ye ku iro heft ro û heft şev e,
Sıngê xwe kutaye sıngê Evdalê Zeynıkê pê ra kılama dıbêje"

Lı ser wê gotına Evdal, hêrsa Tarxanê Qelenyê datine û jı Surmeli Memed Paşa ra nameki dınıvisine, hespeki pêşkeşi Evdal dıke, xelateki ji dıde Emerê Heci İso, û wana bı rê dıxe. Dı namê da dıbê: "Haza ku Evdalê Zeynıkê şaır e û dengbêjeki pır mezın e, ew ancax layiqi navê te ye."

Institut kurde de Paris

## Suheyla Koç:

*Jı Gomıka Mılazgırê. Mın dı sala 1982'ya da pê ra xeberda. Salên wê lı dor 80 yi bûn.*

- Mın Evdal dit, ez wê çaxê zar bûm. Berê halê wi xweş bûye, pışti korbûnê ew feqir dıkeve.

............

Wexta ku çavên wi kor bûne, qulungek bı xwe tê dı deri da dıkeve hundur û dıçe xwe dıke taldê Evdal û dısekıne. Evdal qulung dıgrê, hıldıde hemêza xwe. Dema ku destê xwe lê dıgerine, ferq dıke ku baskê wi şıkestiye. İja jê ra dıbê: "Qulıngo malxırabo, tu ji dızani ku ez bırindar ım, lema tu hati cem mın."

Evdal tine baskê qulung gırêdıde, êdi jê ra dıstırê û dıbêje.

Rojeki, wextê berbanga sıbê, qulıng dıke qırte-qırt û qireqir, Evdal hışyar dıke. Evdal jı jına xwe ra dıbê: "Hela rabe kulekê veke, çırê vêxe, ev qulung ku usa bêhedûr e, nasekıne, yeqin tıştek heye!"

Jınık lê hêrs dıbe, dıbê: "Emê çawa bıkın jı destê te û qulıngê te!.. Welle ez ranabım."

Jınık ku ranabe, Evdal bı xwe radıbe, destên xwe lı diwêr dıpeline, dıçe deri vedıke. Bı vekırına deri ra ber çavên wi rohni dıbe û çavên wi dıbinın Qulıng ji lı pey wi derdıkeve derva, baskên xwe lı hev dıxe û dıçe.

............

Pışti Surmeli Memed Paşa, Evdal bı dengbêji lı cem keseki nemaye. Lê jı axawatê yên ku jê hez kırıne, gazi kırınê û ew bı mêvanti bırıne cem xwe. Evdılmecit Begê, Sılaman Begê bavê Evla Begê, xezûrê mın Seidê Sılam û Eli Begê Mala Sêrxhun ku jê hez kırıne ê qedrê wi gırtıne, Evdal hertım çûye cem wana. Ew kılama ku lı ser Mıhemedê Eli Begê tê

Institut kurde de Paris

gotın, Evdal ew derxıstiye. De dı Meter da ku (gundê Intabê) şer çêbûye, Mıhemedê Eli Begê lê xıstye mêrê meta xwe û du kurên wê kuştiye, paşê ji meta wi gazi wi kırye bırye mala xwe û bı destê xwe lê xıstiye ew kuştiye, ew kılama e.

## Hıdoya Hespreş (Hediye Kamiş):

*Mın bı Hıdoya Hespreş sala 1967'a da xeberda. Ew 110 sali bû jı gundê Qereyazyê Hespreş bû.*

Meta Hedo jı mın ra got:

Mın Evdalê Zeynıkê dit. Mala bavê mın lı gundê Kopala yê Elajgırê bû. Ez qiz bûm, xama bûm, Evdal hatıbû mala bavê mın. Evdal dı husnê dunê da yeki usa bedew nebû. Bejna wi kınık bû, rûyê wi ji gırûz bû, bı xuri bû. Lê ew dengbêjeki pır mezın bû, dengê wi ji pır xweş bû. Evdal lı der-dora xwe mêze dıkır, çı ku ber çavên wi dıket, kılam lı ser dogot. Mın bı çavê xwe dit. Ez lı ber derê mala bavê xwe bûm, ew ji lı ber sıvderê bû. Lı pêşya mala bavê mın axpineke me ya mezın hebû, ceh avıtıbûnê. Cehê axpinê hêşin bıbû, rûyê zevyê gırtıbû. Ewi lı mın mêze kır, lı axpinê mêze kır, dı bın lêva da kenya, dest pê kır û sıtra .

Go:

*"Lê lê keçkê zevya ber derê mala bavê te bı ce ye.*
*Ceh rabûye lı rûyê zevyê gırt pençe ye."*

Ewi usa pêda-peda got û çû. Gellek zeman ser da derbas bû, ew gotınên dın dı bira mın da nemane.

# Lı ser bûyera Behlûl Paşa

*Tarihi Cevdet, Ahmed Cevdet Paşa Cilt 12, sayfa 8-15, dı bınê sernava "Bûyerên Salên 1236-1237 (1820-1821)" da.*

Ahmed Cevdet Paşa dı derheqê bûyera Behlûl Paşa da dıbêje:

Lı gor gotına Şanizade, mutesenfê Bazidê Mirêmiran Behlûl Paşa ku jı wezifê hat avêtın, ew bû sedemeki xıravbûna navbera İranê û Osmaniyan. Waliyê Erzurumê bı mexseteke dızi va hukmê Sancaqa Bazidê jı Behlûl Paşa sıtand û da destê İbrahim Axa. Ew ji pêştahatiki Topraqelê bû.

Behlûl Paşa jı Istenbolê ra namek şand, got: "Bırayê İbrahim Axa casûsê İranê ye." û fermana wali qebûl nekır.

Lı ser wi, paşê waliyê Erzurumê Husrev Paşa rutba Mirimirantiyê da Evdılhemid Begê û ew şande Bazidê. Evdılhemid Beg ji pêştahatiki Bazidê bû û meryê wali bû.

Evdılhemid Paşa bı rê ket ku here Bazidê. Dema ku wi xwe gihande Qerekılisê, eşira Sebka seri hılda û pê ra şer kır. Behlûl Paşa nav dı wan dabû.

Kurda ku leşker vegerandın, pêştahatyên wê keşê pêşniyazek imze kırın û ew bı silahdarê wali ra şandın Erzurumê.

Waliyê Erzurumê ku xebera vê serhıldanê şande Istenbolê, Dewletê ji jı wi ra ferman şand û got: "Bıra leşkereki gumrah here ser Bazidê û bajêr hılde muhesarayê!"

Dawyê da leşker çû ser Bazidê, bajar gırt, wezife kıre destê Evdılhemid Paşa û Behlûl Paşa ji gırt ani Erzurumê û avête hepsê.

............

Bı sedemê şêlandına Bazırgan û heciyên İranê, wê demê navbera İranê û Osmaniyan pır nebaş bıbû. Wê çaxê jı Kurdên İranê gellek dız û rêbır hatıbûn jı vi yalê sinor terş û

heywanên xelkê talan kırıbûn û bırıbûn.

............

Lı wi yalê İranê, lı hêla ber sinorê me ji Mirza Abbas hukum dajot. Dı bınê fermandarya Abbas Mirza da leşkerê İranê erışi erdê Osmaniyan kır û dı çend ciyi da ji erd zeft kır. Dawyê da Abbas Mirza Bazid ji zeft kır.

Wê demê Behlûl Paşa ji jı gırtigeha Erzurumê revi çû Bazidê û kete bınê hukmê Abbas Mirza. Wi ji hukmê Sancaqa Bazidê da destê Behlûl Paşa.

Pışti van bûyeran, Celaleddin Paşa bı leşkereki gumrah va êrış bır ser Topraqelê û kele hılda muhasarê. Abbas Mirza ji bı leşkerê xwe va jı Tebrêzê bı rê ket û êrış ani ser Celaleddin Paşa. Abbas Mirza eşiretên Kurdên İranê topi dora xwe kırıbû û anibû. Ewi, eşiretên Kurda yên ku dı bınê bandora Osmaniyan da ji welgerandıbûn alyê xwe.

Lı Topraqelê şereki bê eman dı nav wan da çêbû.

Musatarıfê Mûşê Selim Paşa ji bı 8000 siyarên Kurd va qaşo hatıbû hewarya Celaleddin Paşa. Wi 8000 Kurdi lı perê meydana şer, destên xwe danin ser mızraqên xwe, jı xwe ra temaşe kırın. Lewra Selim Paşa mêldarya İranê dıkır. Leşkerê Celaleddin Paşa şıkest û berbe Erzurumê paşta kışya.

Lê roja pışti şer tışteki xerib bû, nexweşya kolerayê dı nav leşkerê Abbas Mirza da derket. Hetani wê çaxê tu cari nexweşya kolelayê lı wan kêşan nehatıbû ditın. İraniyan pır tırsiyan û hemmû tıştên xwe dı ci da hiştın, vegeryan çûne İranê.

Pışti vegera Abbas Mirza, dı zemaneki kurt da pêwendiyên İranê û Osmaniyan baş bûn û her tışt disa hat ser rewşa berê. Behlûl Paşa ji disa minani berê lı ser wezifa xwe ma.

# Dilaver Sarayhanoğlu:



*Kurê nebyê Surmeli Mehmed Paşa ye. Dilaver beg kurê Mehmed begê ye, Mehmed beg kurê Eli Paşa ye, Eli paşa ji kurê Surmeli Mehmed paşa ye. Mın pê ra dı salên 1990 û 1992 ya da xeberda:*

Institut kurde de Paris

- Surmeli Memed paşa pışti şerê Urız û Romê hatye lı Kela Elajgırê bı cih bûye. Esıl navê wê Topraqele ye. Pışti şer ku Bazid dıkeve destê Urız, malbata me ji jı wır bar dıke. Hukmê kêşa Elajgırê, Qerekılisê, Qaqızmanê û Parsina jêrın dı destê Memed paşa da bûye.

Sultanê Osmani jı Memed paşa ra fermaneki dışine, dıbê: "Lı kêşa Edenê, lı Xozanê, Turkmanan seri hıldane. Ez leşker dışinım ser wana, tu ji leşker top ke, were ser wan."

Ew fermana hetani wan salên hanê lı mala me bû, lê mıxabe dı mala me da şewat derket û ew ferman ji şewıti.

Kalkê mın 300-400 siyari jı nav eşiretan dıjmêre, radıbe dıçe ser Xozanê. Evdalê Zeynıkê ji pê ra dıçe.

............

Derê Seraya Bazidê, ango Seraya İshaq paşa jı zêr bûye. Pışti şer, Ûrız wi deri hıldıdın dıbın Ûrısêtê.

............

Ew kılama ku tu dıbêji, ya "Lo Miro" lı ser evindarya keçıkeki û Memed paşa hatye gotın, ew rast e. Bı qasi ku mın jı mezınan bıhisti bû, ew keçık jı Torına mala Kosa bûye. De mala Kosa lı İdırê ye. Ew keçık yan xûşka Guli Cewer axa bûye, yan ji qiza wi bûye. Memed paşa wê keçkê jı xwe ra dıstine. Mala Kosa xalanên me nın.

............

Kalkê me yê heri pêşin Heci Ehmed paşa ye, Çolax Evdi kurê wiye. Wextê ku Sultanê Osmani Yavuz Selim dıçe ser Şah İsmail şer, ew Çolax Evdi begê dıke fermendarê leşkerê xwe yê pêşeng, Çolax Evdi ku bı 300 eskeri va jı bo kefşê dıçe, ew û leşkerê Şah İsmail hema seqe-seq nasti hevd tên. Leşkerê Şah pır bûye, 15-20 cari bı qasi leşkerê wi bûye. Ew bı hevra dıkevın şer, Çolax Evdi bı çalakya xwe va bı ser dıkeve û wi leşkeri tûr û tela dıke. Ango ew dı serketın a Sultan Selim ya Çaldıranê da roleke mezın dıleyize. Dı wi şeri da Çolax Evdi ji jı mılê xwe bırindar dıbe. Jı leşkerê dıjmın ku yek şûr davêjê, destê wi dı ber zendê da qut dıbe. Çolax Evdi wi destê xwe yê qutbûyi dı sitıla rûnê qıjılandi da dıke, dıkewine.

Pey serketına Çaldıranê ra Yavuz Selim gazi fermendar û lehengên xwe dıke ku xelatan bıde wan. Dema ku gazi Evdi Begê dıkın û ew dıkewe hızûra Sultan, ew destê xwe yê rastê dıde pışt quna xwe, destê xwe yê çepê dırêji Padışah dıke. Sultan Selim dıqehıre, pır hêrs dıkeve, dıbê: "Ev çı hal e ku begeki Kurda lı pêşberi mın waha dıke!..."

Wê demê berdevkê Sultan hema pêşta tê, dıbê: "Sultanê mın, destê Evdi Begê dı şer da qut bûye, jı bo siyaneta te nexwast rayi tede, lema waha kır."

Wê çaxê Sultan pır kêfxweş dıbė, xelatên gıranbuha dıde

Evdi Begê, rutba paşatyê dıdê û wi dıke Mirê Kela Bazidê. Paşê fermen dıke, jı Evdi Paşa ra desteki zêr dıde çêkırın û wi destê zêr bı mılê wi va dıke.

Jı bo wê yekê jê ra gotıne "Çolax Evdi Paşa."

Pışti mırına Çolax Evdi paşa, dewleta Osmani destê wi yê zêr dıbe dı Mûzexana İstenbolê da dıparêze.

Eşiren Kurda yên wê hêlê jı kalkê mın pır hez dıkın. Gellek merıvên mêrxas bı daxwaza xwe tên pê ra dıçıne Xozanê. Mesela Kalkê van Kılıçaslanên Qerekılisi, Çerkez Begê Şamya, jı Dıharê Sultanê Alo jı wana Çend kes ın, yên ku tên bira mın.

Mesela wi û ziya û mırına wi ji waha ye: Pıştı ku Turkman lı ber dewletê dest datının, Memed paşa dı bınya Xozanê da lı ber kaniyeki çadıra xwe vedıgrê. Dı çiyayê serfêza çadıra wi da Ziya (ejderha) hebûne. Ew ziyana her şev jı çiyê dıkışın tên ser kanyê, avê veduxwun. Jê ra dıbêjın: "paşa, çadıra xwe jı vır rake bıbe lı ciki dınê vegrê, ew ziyayên çiyê wê lı te xın."

Kalkê mın dıbê : "Ziya çı teba ne, welle ez çadıra xwe jı vır ranakım."

De wê çaxê ew bı cul'et û mêrxasya xwe va hatye naskırın, naxwaze navê tırsê bıne ser xwe. Dıbê: "Ez ku çadırê jı vır rakım, paşê wê bêjın Memed Paşa jı maran tırsiya."

Kalkê mın dıçe lı ser rê ya wi ziyayi hendeqeki vedıde, êvarê şûrê xwe hıldıde dıkeve hendeqê û lı ziya dıpê.

Eşayê Memed paşa dınhêre ku wayê qije-qij û fize-fiza ziya ye, jı jor da tê, herdu çavên wi ji minani du fenera dıçırûsın. Ew ji wê demê şûrê xwe dıkşine, rıkêfi ser ziya dıke, lê dıxe serê wi dıpekine û carke dın xwe davêje hendeqê. Ew ziyayê serjêbûyi poçıka xwe rasto-çepo dıhejine, çıqas dar û berên ku lı wıra bûne, bı poçıka xwe va minani tapaneki rêş dıke tine xarê. Paşê poçıka xwe lı darên çamê yên mezıni bılınd dıxe, jı kokê va dıqetine davêje. Kalkê mın ku xwe avêtye nav hendeqê, poçıka ziya jê negırtiye û tıştek pé

nebûye.

Pey ra disa pêştahatyên wêderê dıçın bı kalkê mın ra xeberdıdın, jê ra dıbên: "Paşa, tu were çadıra xwe jı vır rake, ziyayên vi çiyayii hertım cot ın, tolsıtandına maran heye, hevalê wi yê muheqeq wê bê û lı texe."

Kakê mın disa guh nade pırsa wana û çadıra xwe jı wır ranake.

Çend rojan pey ra, dı wexteke şevê da kalkê mın bı ewteewta bonci ya xwe ya lı pêş çadırê ra jı ciyê xwe radıbe û xwe dıreji şûrê xwe dıke. Şûrê wi dı hıstûna bın çadırê da dardayi bûye. Dema ku ew destê xwe davêje şûr, birden dıbe şirqini, ziya xwe lê dıxe, wi û çadıra wi û hıstûnê dıke nav xwe û lê dıale. Şûr ji jı destê wi dıpeke, dıçe lı pêşya çadırê dıkeve.

Bı dengê wê xıleportê ra jına wi ku jı çadıra xwe derdıkeve tê, wê newşê dıbine. Kalkê mın dıbê: "Viyayi parxanên mın dı hevra derbas kır, zû şûrê mın jı vêderê hılde bine!"

Jına wi şûr tine dıde desta, lê mılê wi jı pêçandına ziya naxebıte. Kalkê mın, jı jına xwe ra dıbê: "Ha tu şûr hılde, lexê fıtlên Ziya bıbıre, mın xılas ke!"

Jına wi şûr hıldıde, lê dıxe fıtlên ziya qet-qeti dıke û wi xılas dıke. Lê wexta ku Ziya xwe lê gıvaştiye, parxanên wi dı hevra derbas bûne, hesınê hıstûna çadırê ji dı sıngê wi ra çûye, sıngê wi qul kırye.

Paşê doxtor tên bırinên wi derman dıkın û kalkê mın hıneki pak dıbe. Lê belê demeki şûnda karmendên dewletê doktoran jê dûr dıxın û wi dı wi hali da dıhêlın. Çendeki şûnda ji bırina wi xeder dıbe û ew wefat dıke.

Ango lı gor gotınan, hukumeta Sultan nexwastiye ku emrê kalkê mın dırêj bıbe.

............

Çendeki pışti mırına Memed Paşa, lı taxa Çerkezan şêhnayê çêdıbe. Çerkez lı def û zırnê dıxın û şa dıbın. Kurê Memed Paşa yê mezın Evla Beg dıçe cem Çerkez Omer

gazınê xwe dıke, dıbê: "Bavê mın teze wefat kırye, lı taxa Çerkezan ji lı def û zırnê dıxın."

Çerkez Omer poside dıbe, dı ber dılê Evla Begê dıde, dıbê: "Tu xwe acız neke, ezê hema nıha herım def û zurna wana bıdım terıkandın."

Çerkez Omer Evla Begê dıde rûnıştandın, bı destê xwe jê ra qehvê dıkeline, dıdê û jê ra xızmet dıke.

Evla Beg dıbê: "Heyran tu mêrkê mezıni, xızmeta te jı mın ra nabe."

Camêr dıbê: "Evla Beg, Memed Paşa ça bavê te bû usa ji bavê meye. Tu iro dı şûna wi da runıştiyi, xızmeta jı te ra jı boy mın şeref e."

Dema ku Evla Beg û Çerkez Omer qehvê veduxın û xeberdıdın, bûkeke Çerkezan dıreve taxa Çerkezan, dıbê: "Hun çı sekınine, Evla Begê êrış bıre ser Çerkez Omer û lê xıst ew kuşt."

Bı hewarya wê jınıkê va bırayê Çerekez Omer Husên Beg û Çerkezên dın dıbezın dıçın diwana Çerkez Omer. Husên Beg qumandarê cendırman bûye, Omer Beg ji qeymeqam.

Wexta ku jı diwanê derdıkevın, Evla Beg lı pêşyê bûye, Çerkez Omer ji lı dû bûye. Dema ku Husên Beg xwe dıghine wır, lı pêşya xwe Evla Begê dıbine, lê bırayê xwe nabine, jı wi wetrê ji Evla Begê bırayê wi kuştiye.

Hûsen Beg hema qema xwe dıkşine û lı serê Evla Begê dıxe, çermê serê wi dı ser ınyê da rêş dıke tina xarê. Evla Beg, desteki xwe dıde ser bırina xwe, bı destê dın qemê dıkşine, lı Husên Begê dıxe, dı ci da wi dıkuje. Pey ra vedıgere ser Omer Begê, herdu bı qeman lı hev dıxın, Evla Beg wi ji dıkuje. Lê wê demê Çerkezên dın xwe dıgıhinenê, lê dıxın Evla Begê dıkujın. Du debancên qerebina dı berıka wi da bûne, lê ku xwe şaş dıke, ew tebancan nayên bira wi.

Wê demê ku xeber dıçe mala Evla Begê, bırayên wi Teyar Beg û Dıla Beg dıçın hewaryê. Ew ji lê dıxın çand cendırmên Çerkezan dıkujın, lê ew bı xwe ji têne kuştın.

Wexta ku xebera wê hevkuştunê dı nav Kurda da tê bıhistın, jı kêşa Bazidê bıgrê hetani Elajgır, Intab û Qerekilisê, gıre-gırên Kurda kom dıbın, têne Toprakqalê. Ew tên ku heyfa kurên Memed Paşa hıldın.

Çerkez ji ku xebera hatına vana hıldının, hertıştên xwe dıhılên, dıçın dıgelyê Qopızê ra, dı Koçoxli ra derbasi Sariqamişê dıbın. Lewra qewmê wan lı wır bûne, ew bı xwe ji jıvır hatıbûne Kelê.

Kure Memed paşa yê pıçûk Dıla Beg delalyê malê bûye. Jı ber wê yekê bavê mın navê wi lı mın kırye. Mervên malbate me gellek caran jı mın ra "Dilo" dıbêjın.

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

# Dr. Muzafer Demir

*Jı Bılanıxê, Parlamenê Mûşê yê kewın.*
*Mın pê ra dı sala 1993'ya da xeberda.*
*Salên wi lı dor 45'a bûn.*

## Temoyê Egit û Evdalê Zeynıkê

Temoyê Egit kalkê kalkê mın e. Ew ji bı 30 siyarên xwe va bı Surmeli Memed Paşa ra çûye Xozanê û sax vegeryaye hatiye.

Malbata me Torına Hesena ye, lı gor Şerefnamê peşiyên me jı Hesenkeyfê hatıne, lı kêşa Avran a Mûşê bı cih bûne. Farıs Axa serokê eşira me bûye. Walyê Mûşê Aladin Paşa xerc û xeracê û leşker dıxwaze, Farıs Axa nadê. Aladin Paşa ji Farıs Axa dıgrê, mil dıkşine çavên wi û wi dıkuje. Peyra eşira me jı wır bar dıke, tê lı der-dorê Mılazgırê bı cih dıbe.

Farıs Axa apê Egit bûye.

Aladin Paşa disa nasekıne, leşker dışine ser wana. Lı bınya Kara Sıpi ew û leşker şer dıkın, gelek merıv têne kuştın. Dı wi şeri da Xelef Begê kurê Farıs, Reşit paşayê bırayê Aladin Paşa dıkuje. Leşkerê Xelef Begê geleki ber xwe dıde, lê dawyê da Aladin Paşa bı ser dıkeve. Xelef Beg, beşeki eşira xwe jı leşkerê Aladin Paşa xılas dıke, dıreve dıçe xwe davêje İranê. Herçi yên ku dıkevın destê Dewleta Osmani, yan têne kuştın, yan ji têne sırgûnkırın. Dewlet, Egit ji dıgrê davêje gırtigeha Sinopê. Kalkê kalkê mın Temo ji wê çaxê 14-15 sali bûye.

Temo bırayê xwe yê pıçûk bı xwe ra hıldıde, dıçe Sinopê ditına bavê xwe. Temo êdi venagere, lı wır dıxebıte, hemalyê dıke, lı bavê xwe û bırayê xwe mêze dıke. Temo demeke dırêj lı wır dımine û pır zelûlyê dıkşine. Çend salan şûnda ku bavê Temo dı gırtigeha Sinopê da dımıre, ew ji bırayê xwe hıldıde tê Mılazgırê. Wê çaxê efû ji ku derdıkeve, Xelef Beg

û wanên dın ji jı İranê vedıgerın. Pey ra Temo dıbe serokê eşiretê.

Pêwendiyên Temo û Surmeli Memed Paşa pır baş bûne. Wexta ku Memed Paşa dıçe ser Xozanê, gazi Temo ji dıke. Temo bı 30 siyarên xwe va tevi Memed Paşa dıçe Xozanê. Temo hım zılameki jêhati û mêrxas bûye, hım ji dengbêjeki gelek baş bûye. Dı wê rewityê da ew û Evdalê Zeynıkê bı hevra dostiyê saz dıkın û bı hevra dıstırên hetani ku dıçın xwe dıghinın Xozanê.

Evdal jı Temoyê Egit pır hezkırye, bı texmina mın jı ber wê yeke Evdal Paşê navê wi lı kurê xwe kırye û hemmû kılamên xwe lı ser navê wi gotiye.

Lı Xozanê ku nexweşi derdıkeve, nivê siyarên Temo ji dımırın.

Wexta ku Temo dıçe Xozanê, dı navbera Heyderan û Hesenan da lı ser zozanên Qetewin şer derdıkeve, kurapê Temo Xalıtê Rızga tê kuştın. Xalıtê Rızga bavê Fetulla Begê û Rızayê Xalıt e.


Temo ku jı Xozanê vedıgere tê welat, bı wan siyarên xwe va dıçe Ercişê, êrışi gundê serokên Heyderan dıke, jı wana gellekan dıkuje û heyfa Xalıtê Rızga hıldıde.

Lê de tu lı wê bêbextiyê mêzeke, pey wexta ra Rızayê Xalıt û bırayê wi Fetulla Beg dıçın, bı xayinti rêya du kurên Temo dıbırın, lê dıxın wana dıkujın.

Temo emreki dırêj derbas kırye û wi nebiçırên xwe ji ditıne.

Wexta ku Sultan Evdılhemid gazi axa û begên Kurda dıke, dıbe Istenbolê, wana xelat dıke, qutike tıtûnê ya zêr ji xelata Temo dıdê. Paşê ew qutya wi tê dızin, yan ji wunda dıbe. Mesela qutyê pır mezın dıbe, dı navbera Cıbran û Hesenan da dıbe sedemê şer. Pışti mırına Temo, jı boy qutyê dı gundê Maselayê da Cıbran û Hesenan lı hev dıxın û gelek mêr têne kuştın. Ew kılama "Şerê Meselayê", ya ku Reso û Şakıro dıbêjın, lı ser wê bûyerê hatiye gotın.

## Secera Temoyê Egit




* *Xalıt Begê Heseni Serokê Serhıldana Şêx Seid, yê kêşa Mûş û Mılazgırê*

Institut kurde de Paris

# Heci Mecit Mısırci:

*Lı kêşa Qaqızmanê hatye dunê, mala wi nıha lı Istenbolê ye. Mın bı Heci Mecit ra dı 1992'ya da xeberda. Ew wê çaxê 75 sali bû.*

Heci Mecit awha got:

- Wexteki lı kela Elajgırê Zor Surmeli Memed Paşa hebûye. Ça ku dıbejın, lı pêşya Dewletê xetake wi çêbûye. Dewletê jê ra gotye lı Xozanê ziyayek (ejderhak) heye, te ku çû ew kuşt, tuyê bêyi efûkırın; te ku nekuşt, tuyê bêyi cezakırın.

Surmeli Memed Paşa wi şertê Dewletê qebûl dıke, leşkerê xwe berhev dıke. Lê ew leşkerê wi gışk merıvên bıjare bûne.

Kijan ku dıxwazın bıbın leşkerê wi, ew wana lı hespan siyar dıke, mızraqan dıde destên wan û lı meydana ber Kelê da dıcerıbine. Mêze dıke, çıka siyarıya wana çawa ye, lı ser pışta hespan bı bayê bezê ra mızraqên xwe baş bıkartinın yan naynın, dı bezê da hespên xwe ça dıçerıxinın. Dı wê cerıbandınê da Memed paşa kê ku begem dıke, wi dıjbêre.

Evdalê Zeynıkê dengbêjê Memed Paşa bûye û ew ji pê ra çûye Xozanê.

Wexta ku bı rêdıkevın, zar û zêrç û şêni lı hev kom dıdın, dest bı gıri dıkın. Memed Paşa deng lı Evdalê Zeynıkê dıke, dıbê: "Were bıstırê, bıra şêni negri ku em ji herın."

Evdal dest pê dıke dıstırê, lê bı şewat dıstırê. Bı wê sıtrana wi ra zêwe-zêw dıkeve nav şêni, zar û zêrç, gıryê wana hingi dıçe gurr dıbe. Memed Paşa jı Evdal ra dıbê: "Xudê jı te razi be, mın go bıstırê wana aşbıke, mın nego bıstırê gıryê wana gur ke!.."

Evdal qaide dıguherine, bı tehereki dın dıstırê, ew şêni gıryê xwe dıterıkine. ew ji bı rêdıkevın.

Institut kurde de Paris

...........

Wexta ku Surmeli Memed Paşa bı siyarên xwe va dıghije Erzurumê, wali wi teklif dıke dıbe qonaxa xwe. Wali jı boy Memed Paşa şênayiki tertib dıke, paşê nan dıxûn û sohbet dıkın. Rewşa şûrê Memed Paşa bala wali dıkşine, wali jê ra dıbê: "Paşa çı şûreki teyi rınd heye, heta nıha qe çavên mın bı şûreki waha neketıbû."

Memed Paşa jê ra dıbê: "Wali Paşa, de şûr ji lı gor mıl û zendên meryane." û mılê xwe bılınd dıke, dıbê: "Ancax ev mıla dıkare vi şûri ragrê. Yeqin te mılên waha ji neditıne."

...........

Surmeli Memed Paşa ku dıçe Xozanê, şûrê xwe hıldıde dıçe pêşya ziya. Wexta ku ziya jı delê derdıkeve û xwe davejê, Memed Paşa şûr davêjê dı derbeki da serê wi dıpekine. Lê ziyayê ser-pekandi poçka xwe lı Memed Paşa dıaline bedena wi dıgwêşe û parsûyên wi dı hevra derbas dıke, Memed Paşa dıkuje.

...........

Hewa Xozanê pır germ bûye. Dıbêjın ku bayê wê yê samê ku lı merya dıxıst, merıv qırom dıkır. Ew merıvên bıjare yên ku bı Surmeli Memed Paşa ra çûne Xozanê, jı ber germê gışk qır bûne.

Institut kurde de Paris

# Faruk Çamlıbel

*F.Çamlıbel xelkê nav Bazidê bû, mala xwe anibû İzmirê. Mın pê ra sala 1993'ya da xeberda û ew wê çaxhe 50 sali bû. Wi dı sala 1995'a da wefat kır.*

Surmeli Memed Paşa hemwelatyê mın e. Ew nebyê İshaq Paşa bûye, ew ji nebyê Çolaq Evdi Paşa bûye.

Navê Bazidê berê Vazgal bûye. Lı Bazıda jorin baxçek heye, jê ra dıbên "Baxçê Şewêş Efendi". Şewêş Efendi kalkı vi Celal Yardımci ye. Dı eslê xwe da navê wi baxi "Baxçê Keşiş" e.

Malbata Surmeli Memed Paşa malbateke zor û zurbe bûye. Her tıştê wê kêşê dı destê wan da bûye. Dıbêjın kê ku dızewıci bûk dıani, ewıli bûk dıbırın mala Paşayê Bazidê, şeva ewıl bûk lı cem wan dıma, paşê dıanin mala mêre wê.

Dı zemanê İshaq Paşa da qizek ku mêr dıke, deweta wê dıkın û wê dıbın mala wi, ji bo ku paşa şeva ewıl pê ra razê. Keçık, qizeke mêrani û baqıl bûye. Ew bûk tine bist hêki dıkeline, her yeki bı rengeki boyax dıke, dıde ser sınyê û jê Paşê ra dışine. Dıbê: "Bıra Paşa lı te'ma gışka mêzeke, paşê ezê herım cem."

İshaq Paşa ku lı te'ma hêkan mêze dıke û sınyê paşta dışine, bûk lı derê wi dıxe, dıkeve hurdur û jê ra dıbê: "Paşa xweş be, herge tu ku destûrê bıdi, ezê jı te tışteki pırs kım."

Paşa dıbê: "Bêje!.."

Bûk dıbê: "Paşa, te ku lı te'ma wan hêkên reng-cuda mêze kır, çı ferq dı nav wan da dit?"

Paşa dıbê: "Welle gışk mina hev bûn, tu ferq dı nav wan da tunebû"

Bûk dıbê: "Ew bûkên xelkê yên reng bı reng ji minani wan

Institut kurde de Paris

hêka nın, xêra vi kari jı te ra tune. Herge dı dılê te da tırsa Xudê heye, dev jı vi kari berde, xelk gune ye!"

Lı ser pırsa wê bûkê ishaq Paşa wi edeti dıterıkine.

.........................

Tu dızani jı Memed Paşa ra çıma gotıne Surmeli Memed Paşa? Ez jı te ra bêjım. Ewi per û pesirên qeftanê xwe bı gulavdinê zer va qeytan kırye, lema navê "Surmeli" lê kırıne. Ango jê ra gotıne "Surmeli Memed Paşa."

Institut kurde de Paris

# Ahmet Cevdet Paşa:

*Xozan , Ahmet Cevdet Paşa, Tezakir 27,*
*rûpel : 107-134-135-156-164-184-187*

Nıviskarê Osmani yê bı nav û deng Ahmed Cevdet Paşa dı "Tezakirê" da, lı ser bûyera Xozanê waha dınıvise:

- Dı navbera pêştahatyên dewletê yên heri bılınd da cıvineke gıring çêbû. Ez ji dı wê cıvinê da hazır bûm. Dema ku pırs hate ser kêmbûna nıfûsê İslamê, mın dest bı xeberdanê kır û awha got: "Jı dewra fethê (1515) vır da Gawırdax, ango Cebeli Bereket, dı halê asêbûnê da ye. Hukumetên Dewleta Bılınd lı çiyayê Xozanê hukumferma nebûne. Kêşa Hısni Mansur (Adıyaman), Akçadax û Dêrsım ji mina Gawırdaxê dı rewşa serhıldanê da ne. Ew deveran bûne hêlina rêbır, dız û firaran. Qetil û rêbırên der û doran ji ku jı destê hukumetê xılas dıbın, dıçın xwe davêjın wan deran.

Dı wan çiyan da gellek eşiret ji serbıxwe dıjin. Dewlet ku wan eşiretan bine rê, wê jı wana gellek leşker bı dest xe.

............

Lı çiyayên Xozanê ji hukmê dewletê tu cari saz nebıbû. Jı zemanê berê da bıgrê hetani roja me, dewletê çend caran leşker şandiye ser Xozanê, lê ew leşker hertım şıkiyaye, bıserneketiye û paşta kışyaye.

............

Dawyê da jı boy sefera Xozanê qerar derket. Jı bo wi kari Dewrêş paşa bû serleşker, ez ji bûm kazazker (serokê idara mulki).

Em dı meha Zilhica 1281'i da (1865) lı pênç vaporên Seltenetê siyar bûn û jı "Dersaadetê" bı rê ketın. Me bı xwe ra Alayeke siyari, 7 taxbûrên peya û karmendên xwe bırın.

............

Mirliva Kurt İsmail Paşa ji wê jı ordi ya çaran leşker hılda

Institut kurde de Paris

û bıhata bıgıhişta me. Ewê bı Alayeke siyari û bı çar taxbûrên peya va jı yalê Sêwazê bıhata.

Kurt İsmail Paşa, jı sê paşayên ku lı Anadolyê bı lehengiyên xwe va deng dabûn, yek jı wan bû.

Jı wan herdûyên dın, yek begê Gurciyan Aslan Beg bû, yê dın ji Mehmed Begê Elajgiri yê bı nav û deng bû. Aslan Beg, paşê rutba Mirimirantiye jê ra hat dayin bû Aslan Paşa.

Mehmed Beg ji disa mina Aslan Begê paşê jê ra rutba Mirimirantiyê hat dayin, bû Mehmed Paşa. Paşê Mehmed paşa jı bo nûneriya Şûra Dewletê hat tayin kırın.

Aslan Beg wê bı 200 siyarê Gurci û Çerkez va jı kêşa Sariqamişê bıhata, Mehmed Beg ji wê bı 300 siyarê Kurd va jı Elajgırê bıhata.

Xênci wana, Hasan Paşa, Seyid Paşa û Husni Paşa ji wê jı Giridê, Edenê, Meraş û Helebê bı leşkerên xwe va bıhatana, tevi me bıbûyana.

Bı vi teheri leşkerê "Fırka Islahiyê" dıbû 15 taxbûrên peya, 2 alayên siyari yên nizami, 500-600 ji leşkerê siyari yê Gurci, Çerkez û Kurdên bıjar e.

...........

Pıranya siyarên Kurda, axa û begên eşirên Kurda bûn û gışk merıvên bıjare bûn.

...........

Tebieta Çukurovayê pır hov bû. Heke me pêşta beşek leşker neşanda, rê neda vekırın, paşê leşkerê meyi gıran nıkarıbû dı wır da derbas bıbûya û bıçûya.

Wexta ku leşker dı nav wê tebieta hov da dımeşya, bı temami tê da wunda dıbû, tenê serê mızraqên siyarên Kurda xûya dıbûn.

...........

Derviş Paşa jı nav heft taxbûrên bıjare beşek leşker derxıst, çarıx kır lıngên wan, û êrış bıre ser çiyayê Xozanê. Ewi siyarên Mehmed Begê yên Kurd bı xwe ra nebır, lewra ew bı mızraq bûn. Lê wi siyarên Aslan Begê, yên Gurci û Çerkez bı

xwe ra bır çımki ew bı tıving bûn.

............

Nexweşya kolerayê ku derket, jı leşker gellek kes qır bûn.

Jı leşkerê Aslan Paşa beşek qır bû, beşa dın ji nexweş bû, jı hev bela bıbû.

Pıranya leşkerê Mehmed Begê qır bıbûn, yên mayi ji jê qetyabûn û çûbun. Lı cem Mehmed Begê tenê 15 zılamên wi mabûn.

............

Pışti wê felaketê meydan jı Begê Xozanê Yusuf Axa ra vala ma û ewi ji çû eşiretên Xozana Rojhılat lı pêşya me rakırın, paşê ew ku derbasi Xozana Rojava bû, xelkê wêderê ji seri hılda.

Lı ser vê yekê me jı Fuad Paşa ra têlgıraf şand û leşkerê nû xwest.

............

Yusuf Axa rewşa xwe zexım kırıbû û merıvên wi gellek ci dabûn ber zefta xwe. Wê çaxê lı yalê Xozana Rojava qeweta me tunebû. Me bı lez û bez jı eşir û qebileyên der-dorê Sisê (Xozanê) bı qasi 1000 neferê amê top kır û dı bınê fermandarya Mehmed Paşa da (Surmeli Meled Paşa) dı wi yali da şand. Bawerya me bı wan kesan tunebû, lewra wana Begên Xozanê bêtır neziki xwe dıdit û herdem dıkarıbûn tıvıngên xwe rasti ser me bıkın.

Memed Begê bı wê rewşê dızanıbû, lê jı bêçaretyê ewi herweki xwe kırıbû fedayi û ew wezife qebûl kır.

............

Yusuf Axa, dı fermandarya kurê xwe Ali Begê da, jı pêxasên xwe beşek şandıbû ku rê ya sisê (Xozanê) jı yalê Bakûr da bıde bırrin.

Wexta ku Mehmed Beg jı Sisê derdıkeve berbe çiyê dıçe, jı bêsıhudya me ra pıranya leşkerê wi jê dıqetın, dırevın dıçın. Ewên ku lı cem dımının ji gava ku çavên wan bı leşkerê Ali Begê dıkeve, dıbêjın: "Welle em tıvıng navêjın Kozanox-

Institut kurde de Paris

luyan!"

Wê demê Mehmed Beg bı şarazati dıbê: "Helbet heqê we heye, hıquqê bav û kalan, heqê merıvtiyê ji wi dıxwaze. Hûn nekevın şer, hûn xwe bıdın herdu yalên çiyê, lê rêz bın û tenê temaşe bıkın.

Ew ji mina gotana Memed Begê lı herdu yalên çiyê rêz dıbın û temaşe dıkın.

Heke Ali Begê ku pêşta bajota bıhata, wi yê muheqeq Mehmed Beg û merıvên wi gışk dil bıgırta. Lê weki wê pırsa kewın "dujmın jı halê dujmın nızane" Eli Beg ku ewqas leşker lı pêşberi xwe dıbine, cul'et nake ku êrış bıke, vedıgere û paşta dıçe.

Wexta ku Ali Beg paşta dıçe, seqe-seq rasti leşkerê İsmail Paşa tê. İsmail Paşa ji jı paş va wi dıde ber gullan, leşkerê Ali Begê dıreve, jı hev tûr û tela dıbe.

Paşê Yusuf Axa dıçe kêşa pıra Goysûyê, qasıdên xwe dışine nav xelkê ku leşker berhevke.

Wê çaxê Misli Hasan Kahya jı xelkê taxımeki bı xwe ra hıldıde dıçe cem Yusuf Axa. Hasan Kahya ku dı rewşa dosti û hevkaryê da dıçe, Yusuf Axa jê nakeve şıkê. Ew ji bı wi teheri Yusuf Axa dıgrê û tine teslimi zabıtên me dıke.

Dawiya serhıldana Xozanê bı wi kari hat.

Institut kurde de Paris

# Halıs Özdemir

*Jı Gundê Aleqıça. Mın pê ra dı salê 1983 û 1996'a da xeberda. Saên wı neziki 70'yi bûn (1996).*

Ezê jı te ra salıxê mala Surmeli Memed Paşa, Evdalê Zeynıkê û mesela Xozanê bıdım. Dı derheqê vana da mın hım gotınên mezınan guhdari kır, hım ji Beşirê Muso guhdari kır. Beşirê Muso zılameki dirokzan bû. Ez bawer nakım ku pısporeki usa hatıbe dunê. Beşir jı Qopızê bû û ewi 120 sali emır kırıbû. Ew dı zıkmaki da kor bû. Ewi ku dest bı xeberdanê dıkır, dı derbeki da secera heft bavên eşirê rêz dıkır. Te ku jê ra bıgota ez jı fılan derê, kurê fılankesê me, ewi sırsıleta malbata te hetani bavê dozdeha dıxwend.

Kopız û Goma Kelereşê gundên mala kalkê mın bûne. Qopız û Topraqele nêziki hev ın, ango mala kalkê mın û mala Surmeli Memed Paşa cinarên hev bûne.

Cewerê bırayê kalkê mın xorteki çeleng û jêhati bûye. Kurê Memed Paşa yê mezın Evla Beg û Cewer destebırakê hev bûne û jı hev pır hez kırıne. Hewesa Evla Begê jı nêçirê ra pır hebûye. Cewer, dı Kelereşê da jı bo Evla Begê odeke taybeti dıde çêkırın, dı demê payizan da Evla Beg dıçe wır, bist rojan, meheki nêçirê dıke. Jı Kelereşê ra nıha dıbêjın "Goma Elyê Seydo". Gom lı rojava Kosedaxê ye û wê çaxê gellek pezkûvi û bızınkûvi lê hebûne.

Kalkê mıni Huso ji dengbêj bûye û ewi Evdalê Zeynıkê ditiye û yeqin pê ra sıtraye ji.

Elyê apê mın ji dengbêjeki bı nav û deng bû. Ewi kılam pır xweş dıgotın û bı texmina mın ewi qaide û meqamên kılamên xwe jı Evdal hıldabûn.

Wexta ku Surmeli Memed Paşa hazırya sefera Xozanê dıke, usa herkesi bı xwe ra nabe, merıvên jêhati û mêrxas dıjbêr

Institut kurde de Paris

e dıbe. Dıpırse, dıde pırskırın, kijan ku jêhati bûne, xalên kijanan ku mêrxas bûne, wana hıldıjbêre. De ewi zanibûye ku jı merıvên xal-pis mêrani nayê.

Dema ku Memed Paşa dıxwaze Cewer ji bıbe Xozanê, Evla Beg nahêle. Jı pêş wi va Huso yê pısmamê me dıbın. Axırê kalkê mın pere ji dıde Huso û wi razi dıke. Huso, kalkê Reşitê Heci Fetê ye, ango kalkê bavê vi Burhan Çaçanê kılambêj e. Em û mala Reşit Çaçan dı bavê çara-pênca da dıghijın hev. Jı mala me ra dıbêjın mala "Eyşê", jı mala Reşitê Heci Fetê ra ji dıbêjın mala "Çaçê". Jı ber wê yekê wana paşnavê xwe kırıne "Çaçan".

Usoyê kalkê Reşit ji jı Xozanê sax fılitye û hatiye.

Çarsıd siyar bı Memed Paşa ra çûne Xozanê, jı wana tenê 50-60 kes sax vegeryane. Lı wır nexweşi derketye û gışk dı wê nexweşyê da qır bûne. Evdalê Zeynıkê jı bo wana kılama "Wey Xozanê" gotiye.

Lı ser hevkuştına kurên Memed Paşa û Çerkezan ji Evdal kılam derxıstiye. Kılama "Evla Begê Mirê Zırav". Te ew kılama rayi mın da. Dı kılamê da ça ku tê gotın, ew bûyera hema usa ye, rast e.

Wexta ku xebera mırına Memed Paşa jı Xozanê tê, Çerkez şêhnayê dıkın, şadıbın û lı def û zurnê dıxın. De jı tırsa Memed Paşa wana newêrıbûne xwe tevdın. Lı ser wê lı hev xıstıne.

Dı wi şeri da Çerkez Omer û du bırayên wi, şeş-heft cendırmên Çerkez û sê kurên Memed Paşa tên kuştın. Evla Beg dı şer da xedar bırindar dıbe; Sılêman Beg, Teyar Beg û Dılo Begê bırayên wi têne kuştın. Dılo Beg kurê Memed Paşa yê heri pıçûk bûye û 15 sali bûye. Çerkez Omer û ew Çerkezên dın jı kêşa Sariqamışê, jı Gundê İslamsorê hatıne Topraqelê. Dewletê wezife daye wana û ew şandıne. Çerkez Omer qaymeqam bûye, Husên Begê bırayê wi ji qumandarê cendırman bûye û cendırme ji gışk Çerkez bûne.

Dı Kelê da keseki mala Memed Paşa tunebûye. Çerkez

Institut kurde de Paris

gışk pêva ku hıldışın ser kurên Memed Paşa, ehlê kelê ji bı jın û zaran va derdıkevın ser sûrê, dı ser Çerkezan da kevıran dıbarinın.

Çerkez Omer bı destê Evla Begê nehatye kuştın. Evla Beg ku bı qemê va lê dıxe Çerkez Omer bırindar dıke, ew ji derdıkeve ber deri û xwe davêje ber sûrê. Jıneke jêhati hebûye, navê wê Zorê bûye. Dema ku Çerkez Omer tê ber Sûrê, tê tanga wê, Zorê hiteki hıldıde, lı nav çavê wi dıxe û wi dıkuje.

Pışti şer, Çerkez her tıştên xwe dı ci da dıhêlın, tenê cınazên xwe hıldıdın, dırevın dıçıne Sariqamişê nava qewmê xwe. Pır dıtırsın, dıbêjın Kurdên wan der û doran wê werın me gışka qır kın. Kurda jı mala Memed Paşa pır hez kırye.

Evla Beg dı şer da xedar bırindar dıbe, lê namıre. Merıvên wana Evla Begê dıbın, bırinên wi derman dıkın, dıpêçın û wi dıkın nav ci. Du-sê roj pışti şer, refek siyar ku jı jêr va tên, jınek dıçe xeberê dıde Evla Begê, dıbê: "Çerkezan dı ser me da gırtın".


Evla Beg ji jı nav ci radıbe, bı wi halê xwe yê bırindar va dıxwaze lı hespê xwe siyar be û bı Çerkezan ra bıkeve şer. Lê dema ku ew lı hespê siyar dıbe, jı ser hespê da tê xarê û lı wıra dımıre. Paşê pê dıhısın ku ew siyaran ne Çerkez ın, Kurd ın û bo hevarya wana hatıne.

Lı Xozanê Memed Paşa dı çadıra xwe da bûye, êvar bûye, yekten Ziya tê xwe lê dıxe û xwe lê dıpêçe. Aliki da ji lıngê wi dıke devê xwe, gez dıke û jara xwe dıdê. Dema ku jına wi dıbeze tê, Memed Paşa deng lê dıke, dıbê: "Şêra qiza şêran, xwe şaş neke, şûrê mın hılde, lı Ziya xe, mın jı pêça wi xılas ke!"

Jınek şûr hıldıde, lê dıxe Ziya qet-qeti dıke û Memed Paşa jı pêça wi xılas dıke.

Bırinên Memed Paşa pır xedar nebûne, lê karmendên Dewleta Osmani ku guh nedanê, lê mêze nekırıne, demeki şûnda Memed Paşa emrê xwedê bı ci aniye.

## Secera Qulixan Begê




Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# Münir Binici:

*Jı gundê Soylemeza jorine (Qereyazi)*
*Nebyê Qulixan Begê ye.*
*Mın sala 1992'ya da pê ra xeberda.*
*Ew wê çaxê 72 sali bû.*

- Evdalê Zeynıkê dı dawya emrê xwe da pır feqir ketye. Evdal dıçe dı nav xelkê da dıgere. Merıvên ku xwe zanıbûne disa mina berê gedrê wi gırtıne, lê merıvên ku xwe nızanıbûne qedrê wi negırtıne. Ew hatye yalê Tekman û Qereyazyê ji. Ew ku dıçe mala axaki yalê me, ew merıw gazi jına xwe dıke, dıbê: "Horê, rabe jı wi mêvanê meyi eziz ra tasek xuê û hınek bulgur bine!"

Jına wi ji çûye jı Evdal ra tasek xuê û ferek çarıx aniye. Ez navê wi nabêjım, paşê zarên wi yê ber xwe bıkevın. Ez navê gundê wi ji nabêjım, lê ew jı eşira me ye, Zırki ye, gund ji lı ser Tekmanê ye.

Helbet Evdal qebûl nekırye û deng lı kurê xwe kırye, awha gotiye:

"Temo lawo deşta Heneş bı çayır û bı ormıx e
Qeda bê lı dunyayê, lı kaliyê, lı halê feqiriye.
Fılan axayi baxşêşa bavê te daye tasek xuê, ferek çarıx e."

Evdal hatye Kulyê bûye mêvanê Elyê Temo.

Camêri qedrê wi gırtiye, jê ra hurmet kırye û zêrek baxşêş dayê. Evdal lı ser wi ji kılam gotiye:

"Temo lawo Kulli xweş e Erez lı ber e.
Elyê Temo baxşêşa bavê te daye zêrê zere."

Evdal pışti Kulyê hatiye Soylemeza Jêrin mala Evdal Axa, jı wır ji hatiye Soylemeza Jorin û bûye mevanê Qulixan Begê. Qulixan Begê jı Evdal pır hez kırye. berya wexta ji ew gellek caran hatıbûye mala wi.

Qulixan Beg çend rojan izna Evdal nade, jê ra xızmet dıke,

Institut kurde de Paris

ber dılê wi dıde. Jê ra dıbê: "Evdal tu dı axırya emrê xwe da ketiyi vi halê hanê, jı boy feqirya dunyayê ber xwe nekeve! Her çıqas tu iro dı halê dunê da feqir bi ji, tu lı cem Xudê pır dewlemend i. Xudê tu mezın kiri. Xudê dewlemendiyeke usa daye te, ku nebûye nesibê tu kesi. Qet xemgin nebe!"

Wexta ku Evdal bı rê dıkın, Qulixan Beg dıgrê pênc zêrê zer baxşêşa wi dıdê. Paşê disa dılê wi rıhet nabe, gazi kurê xwe dıke, dıbê: "Lawo here dı nav gayên me da yeki baş bıjbêre bine bıde Evdalê apê xwe!"

Kurê wi dıçe dı nav gayên wan da yeki beleki bedew hıldıde tine, bı cıl û werıs dıke û dıde Evdal.

Evdal pır dılxweş dıbe û dıçe.

............

Ew rê ya ku tu dıbêji, ya ku Evdalê Zeynıkê bı kawrani tê ra çûye Erzurumê û hatiye: Ew rê jı Qanciya dıhat dı Gelyê Beraza ra, dı textê Qereyazyê ra derbasi Paywêranê-Çulyê dıbû, -heke bıhar bûya, av pır bûya- dı bınya Mescitliyê da dı Pıra Qereqoçê ra derbas dıbû, -heke av hındık bûya- dı buhırê bınya Eyiba ra dıçû, dı Aşê Avzıhêrê ra, dı çiyayê Ketwanê da dıbuhuri, dı Alvarê-Qaricıxê ra xwe dıgihande Erzurumê.

Institut Kurde de Paris

# Ehmed Mırazi:

*Biranided Mın, Neşriyata Hayestan, Erivan, 1966.*

Ehmed Mırazi dı derheqê Xozan û Memed Paşa û Evdalê Zeynıkê da jı deve pirejıneki neqıl dıke û waha dıbêje:

- Surmeli Memed Paşa mêreki zori zor bû, Meta Emê dest pê kır, ewi hesabê mırınê jı xwe ra nedıkır. Çaxa ku wi kela xwe çêkır, merıv hıldan bırne temaşê û pırsi: "Ev kela mın wê çend sala emır bıke?"

Ew merıvana dıbêjın: "Qet na wê sed sali emır bıke."

Ew dıbêje: "Pışti sed sali ezê disa çêkım."

Dêmek jı nemıra bûye, Metê got. Erê, kurê xwe yi delal ra bêjım, Xozan welateki qume, germıstan e. Mıletê Xozanê mıleteki mêrxas û usa ji sersax (serhışk) bû, ber dewleta Ali Osman asê dıbû, xerc û vêrgi nedıda dewletê. Dewlet neçar ma, esker şande ser wana, disa tıştek pê nekır. Dıgotın ewana dıbûne du desta, xwe xişi nav qumê dıkırın. Esker ku dıhat, rê da tıştek nedıdit û derbas dıbû, pêşta dıçû. Ewana destek jı pêşyê jı bın qumê derdıket, destek ji jı paşyê, esker dıkırne orta xwe û lêdıxıstın, kok lı eskerê Romê dıanin. De yê qenc ew bû ku jı mala xwe nehatıbû.

............

Yek ji dıgotın wana lı pêşya siyara bazdıdan, esker dıda ser, ça dıkır xwe nedıgihande wana, çımki textıkêd çokêd wan tunebûne.

Sultanê Romê neçar ma, gazi Surmeli Memed Paşa kır, bıre Sıtembolê û jê ra got: "Çare bı Xozanê nabe. Gerek tu eskerê eşira berevki heri ser Xozanê, wana altki, xerc û xeracê wan ji topki bini, ezê rutba te bılınd kım."

Aha, wi jı bona rutba xwe, bı hezaran eskerê nefiamê berev kır bır... Nivi jê şûnda nehat, lê wi ew welata alt kır û xe-

Institut kurde de Paris

raca hefta sala jê top kır ani.

............

İja jı kurê xwe yi delal ra bêjım, jı germê nexweşiyeke gıran dıkeve nav eskerê Memed Paşa. kê ku dımır çal dıkırın, heta dıhatne êvara dın, desteke dın nexweş dıket, hınek ji wê êvarê çal dıkırın. Usa bı wi teheri tên derdıkevıne welatê Serhedê.

............

Kurê xwe ra bêjım, dı Topraqelê da Çerkez hebûn. Dıgotın wexteki padışê Urız ew sırgûn kırıne. Hukumeta Topraqelê dı destê wan da bûye. Surmeli Memed Paşa roj nedıda serê Çerkeza. Wexta ku Çerkez caba mırına Memed Paşa dıbhên. Omer Çerkez, mezınê Çerkeza qaymeqamê Topraqelê jı ınyata ra dışine def û zûrnê tine û dı hewşa xwe da lêdıxe. Ayhay ewi nemerdike zor kırıbû.

Deh kurê Memed Paşa hebûn, Evdulah Beg yê mezın bû. Ew hêvya bırayên xwe nasekıne, dıçe diwana Omer Çerkez dıbêje:

Ev çı def e, çı zurne ye?

Omer Çerkez dıbêje: "Çıma tu nızani? Ew deweta mın û Cewahır Xanıma diya te ye."

Kurê xwe ra bêjım, Evdulah Beg rıkêf dıke, qet nahêle jı ci bıpırpıte. Qemeki dı serê dılê Omer Çerkez da dıke xar, wi dıkuje. Çerkezêd odê da rıkêfi ser Evdulah Begê dıkın, bırêd Evdulah Begê ji xwe pêra dıghinın, jı herdu aliyan ji mêr têne kuştınê. Evdulah Beg lı ber deri, ku qemeki davêje Çerkezeki, qema wi dı serdera odê da qut dıbe. Kurê xwe ra bêjım. Çerkezeki bılınd qemeki lı serê Evdulah Begê dıde, çermê tepê seri paqıj dıke, tine ser ınyê da dıke xar. Lê bı gotınên gotiya ehliyê Kelê jı ser Sûrê bı kevır û kersekan va lı Çerkeza dıxın û bırek tên kuştın jı bo wê nemerdiya wan kıri.

............

Kurê xwe ra bêjım, Evdalê Zeynıkê dengbêj bû, qonax-qonax ewi avête ser siyara û nexweşa, heta hatın. Bayê samê

Institut kurde de Paris

axır lı Evdal ji dabû, ew jı nexweşyê nemır, jı herdu çava ew noxsan bû.

Rojeki rêncber jı deştê qulıngeki qaneteki wi şıkesti dıgrın, tinın gund. Evdal lavayi rêncbera dıke, dıbê: "Wi qulıngi bıdne mın, ew ji mina mın bırindar e. Bıdın, ez qanatê wi gırêdım, belki qenc be, here bıghije hevalêd xwe, ew ji bıra mina mın heta-hetayê jı hevala nemine, jı refê xwe neqete."

Rêncber heyfê lı Evdal tinın û dıbêjın: "Keremke, hanê jı te ra apê Evdal."

Evdal qulıngê xwe tine, perê wi dı ciyê şıkesti da gırêdıde, dı wedeki kın da qanatê qulıng dıcebıre, ew hini Evdal dıbe û ew bı hevra dıbıne heval û hogır.

Bahar hatıbû... Evdal lı hêviya qulınga bû, ew roj hat. Bû qirê-qira qulınga, hatın ser gund ra derbas bûn, hıstûyên xwe dırêj kırıbûn, per dıkutan, derbas bûn çûn lı mêrg û çimaned gunda da danin. Lê merıv kıvş dıkır, ku jı wêlatê dûr hatıbûn, weki ser gund ra ji derbas dıbûn û dıkırne qire-qir, te dıgo qey ew dıbêjın: "Selama şırin ji we ra, em disa hatne zozanê we, paizê ji dua lı oxıra me bıkın."

Wê şevê Evdal raneza, ewi dıxwast zû sıbe safi be, ku ew qulıngê xwe bıbe bıghine refê wi, weki ew ji bıghije hevala. Sıbê Evdal bı çend xorta va, bırek ji zarên gund va çûne çimana, weki qulıng jı wan nesılıkın. Qulıng dane destê cahıleki sıvık, weki bı tele-tel qulıng berda nava refê qulınga. Ewi ku berda qulıng çû nava qulınga. Kurê xwe ra bêjım, qulıng lı wi qulıngi hatne hev û ew dane ber dındıka, weki qulıng nefırya, berbe merva nehata, wê ber dındıka da bıkuştana.

Evdal ku pê hısya çı behs e, got: "Binın, binın, kıvş e ewi pêşkêşi mın dıkın, bıra ew ji bı mın ra bımine heval."

Evdal û qulıng usa hini hevdu bûn, yek bê yeki tehemul nedıkır. Şeva ku Evdal derengi bıketa, qulıng dıkıre qireqir, deng lê dıkır; helbet dıgot: "Rabe bıstırê!"

............

Heft salê Evdal temam dıbe, tu hekim tu çarê lı çavê wi nakın. Şeveki qulıng dıqire, Evdal mina cara radıbe ku bıstırê, sıtran devê wi da ew kulekê dıbine, çavêd xwe mızdıde. Usa dızane ku qereperene têne ber çavê wi, carke dınê dınhêre, ne ku kulek, hela sıtêrkêd ezman ji dı kulekê ra tên xuyan. Evdal zarêd xwe hışyar dıke, dıbêje: "Mızginya mın jı we ra, rabıne ser xwe, çavêd mın vebûne."

Berê kesek bawer nake, ewana çırê vêdıxın. Evdal dıbêje: "Hun bawer nakın? Aha kıncê te vi rengi, êd wi vi rengi ye. Eger bawer nakın, têl û derziyê jı mın ra binın, ez derziyê jı we ra têlkım."

Aha lawo. kurê mın, Xudê usa lı wi evdi hate rıhmê.

Institut kurde de Paris

## Mıhemedê Qanciya (M.Biliz):

*Mıhemedê Qanciya pısmamê Evdalê Zeynıkê ye. Mala wi lı Qanciya ye (gundê Qereyazyê.) Mın dı 1985 û 1992'ya da pê ra xeberda û ew wê çaxê 76 sali bû (1992).*

- Malbata me dı wexta bavê mınê penca da hatye Qanciya. Mala Evdal paşê hatye. Evdal pıştı mırına surmeli Memed Paşa hatye Qanciya û lı wır wefat kırye.

............

Evdal dengbêjê Surmeli Memed Paşa bûye. Memed Paşa kuda dıçe wi ji bı xwe ra dıbe. Wexta ku Memed Paşa dıçe Nexşiwanê teklifatyê, Evdal ji pê ra çûye. Memed Paşa lı wır bı jıneki ra bûye û zemaneki dırej dımine. Jına Memed Paşa jı bın va jı Evdal ra xeberê dışine, dıbê: "Tu çı dıki bıke, wi jı wır rake bine!"

Evdal jê ra kılaman dıbêje, pırsên tûj davêje ber û wi jı wır radıke tine. De dengbêjên wê çaxê lı cem axa û began destûrdayi bûne.

............

Evdal bı Surmeli Memed Paşa ra dıçe Xozanê ji. Ew merıvên ku pê ra dıçın, pıranya wana jı germê nexweş dıkevın dımırın. Gışk ji mêrên bıjare û mêrxas bûne. De dı kılama Xozanê da navê Qeymezê Êzdi tê gotın. Qeymezê Êzdi jı Êzdiyên Intabê bûye û merveki jêhati û mêrxas bûye.

Intab wê çaxê Êzdixane bûye. Pêşiyên van Sipkan ji Êzdi ne. Gundên Intabê Dêrık, Xanık, Esmer, Melle Şemdin, Tetıka, Bedborya û çend hebên dın gundên Êzdiyan bûne.

Mezınê Sipka Heci usıv Paşa û mezınê Tırkên Aqısqayê ku dıbın destebırakê hev, Heci usıv Paşa Êzdiyan derdıxe, Tırka tine dı wan gundan da bı cih dıke.

# Yaşar Kemal:

*Nıviskar Yaşar Kemal, "Yer Demir-Gök Bakır" Rupel 125-129.*

Nıviskar Yaşar Kemal dı vê Romana xwe da awha qala Evdalê Zeynıkê dıke:

- Aşıqê Keçel saza xwe hêdika hılda hemêza xwe, demeke dırêj lı sazê xıst, paşê sekıni. Pey ra çavên xwe lı guhdaran gerand û got: "İro ezê jı we ra qala Evdalê Zeynıkê bıkım. Evdalê Zeynıkê aşıqeki mezın bû û ew jı herdu çavan kor bû. Ewi jı çiya û banya ra, jı teyr û tûyan ra, jı rewılên çolan ra kılam dıgot. Ew ne weki aşıqên dın bû, ewi jı sıbê hetani êvarê, jı êvarê hetani sıbê bê rawest dıstıra. Ça ku ava çemeki qet naweste, qet nasekıne dıkışe, kılama Evdal ji usa, minani ava çem nedısekıni, dıherıki û dom dıkır. Ewi, dı mal da rudınıştı dıstıra, dı rê da dıçû dıstıra, derdıkete serê çiya dıstıra, dıkete deştan dıstıra. Heke ewi insan nedita, jı daran ra, jı avê ra, jı rê ra, jı kulilkên çav-kanyan ra, jı mhuriyên rû erd ê ra dıstıra."

"Sıtrana wi pır dırêj bû, ewi çıl roj û çıl şevi dıstıra, disa ji dawya kılama wi nedıhat, pıştî wi ra kijan dengbêji ku dest bı kılama wi kırye, ewi tucari kılama wi xılas nekırye."

"Ewi bı Kurdi dıgot, lê Tırka ji, Ereb û Ecema ji, Urıs û İngıliza ji sıtrana wi fehm dıkır. Ew hikmeteke sırri bû û tu keseki nızanibû ku ew çi ye."

"Wexta ku ro dıçû ava, Evdal jı êvarê da dest pê dıkır, hetani serê sıbê dıstıra, bı zereqa tavê ra ji wi dengê xwe dıbırri."

"Evdal dı nav şevereşeki da bû. Şevereşeke minani kevıreki mezini gıran. Sermılkên wi dı bınê wê tariya gıran da tewyabûn. Ewi bı tariyê dıgırt û dı rê ya xwe da dıçû. Rêya wi minani çolıstaneke xık û xali bû û ew dı wê taribanê da

Institut kurde de Paris

bêkes û tenê bû."

"Rojeki dema ku Evdal dı rê da dıçe, lıngê wi lı tışteki nerm dıkeve, kûz dıbe, wi hıldıde hemêza xwe. Wexta ku destê xwe lê dıgerine, dınhêre ku ew rewıleki bı bask e. Evdal wi hıldıde tê nava gund, cinar tên lı dora wi dıcıvın. Evdal jı wana dıpırse, dıbê: "Ev çı teba ye?"

Gundi dıbêjın: "Ew qulıng e, baskeki wi şıkesti ye, serê baskê wi yê dın ji qut bûye."

"Evdal lı ser wê gotına gundiyan pır dıqehıre, dıbê: " Ez çıbkım, çavên mın korın ez nabinım, baskê wi ji şıkestiye û ew nıkara bıfıre, gelo wê çawa be!.. Heke dı vê dunya têr û tıji da çavên mın biditana, mınê perên kulilkan bıda vekırın, mınê pêlên behran bıda rakırın û jı wana şıli bıda barandın. Mınê rohniya sıtêrkan bıda bırıqandın û roj derxısta ser erdê. Û Mınê tirêjên rojê bavêta ser berfa çıyayên bılınd. Û mınê jı çıvikên çolê ra hêlin çêkıra û qût bıda cûcıkên wana. Lê ez çıbkım ku ez ketıme bın vê tari ya gıran û jı destê mın tıştek nayê.

"Heke baskên qulıng hebyana, ewê dı ser avên dûrê mezın da bıfırya, derbas bıbûya û bıçûya. Wiyê dı ezmanê bajarên mezın da baskên xwe bıhejanda û bıçûya. Behra wanê wê jê ra bıbûya per û bask, ewê bıçûya lı ser çıyayê Çaqmaqa danya..."

"Jiyana qulıngan herdem bıhar e, ew tucari zıvıstanê nabinın. Lı kiderê bıhar be, ew koçdıkın dıçın wır. Jı ber vê yekê, herdem bihna baharê jı baskên wan tê."

"Lê nıha, qulıgê wê cara ewılin zıvıstanê bıbine, wê berfê û sermayê nas bıke."

Êdi qedera wan herdûyan bıbû yek.

Evdal qulıngê xwe hıldıde, dıçe derdıkeve serê çıyaki, jı serê bıharê hetani dawya havinê lı wır dımine. Dı destpêka payizê da refên qulıngan dı ser wan ra derbas dıbın, berbe

Institut kurde de Paris

welatên bıharê dıfırın. Çavên Evdal nabinın, lê ew jı ezmanan qirina qulıngan dıbıhize.

Evdal, qulıng dıde pêşberi xwe, û jı wi ra dıstırê. Ew, êdi bı şev û ro tenê kılaman davêje ser qulıngê xwe. Qulıng ji lı ber wi dısekıne û wi guhdari dıke. Rojeki, pênc roja, meheki, du meha, Evdal bê rawest dıstırê. Bı sıtrana wi ra çiya û bani, dar û ber, erd û ezman bı zıman dıkevın.

Rojeki serê sıbê ku roj derdıkeve, Evdal ku sıtrana xwe xılas dıke, tışteki ecêb dıbe. Yekten lı ber çavên wi çırûskên ronkayiyê bırq vedıdın. Tari ya ku bı salan ew hıldabû nav xwe dıçıre, perçe perçeyi dıbe. Evdal lı ber zerpa ronkayiyê tamiş nabe û xwe deverû davêje erdê. Jı tırsa demeki çavên xwe venake, usa deverû lı ser erdê dımine. Paşê hêdi, hêdi xwe rast dıke, radıbe pê û çavên xwe vedıke. Dunyake fıreh û mezın lı pêş wi dırêj dıbe; ew, ezmanê hêşinê bêbıni dıbine û bı hewes û heyran lê mêze dıke, pey na serê xwe xar dıke, lı pêşya xwe, lı erdê mêze dıke. Giha û kulilkên cur be cur û meşa mûriyên ser erdê dıbine, paşê xari erdê dıbe û ronkayiyê maç dıke.

Qulıngê wi ji lı wır bûye, lê ew lı ferqa wi da nin e. Demeki şûnda ku Evdal qulıng lı pêşberi xwe dıbine, destê xwe dırêj dıke, dıxwaze ku wi bıgrê, bıde hemêza xwe, pê şa be û wi maçke. Dema ku Evdal destê xwe dırêji qulıng dıke, qulıng baskên xwe lı hev dıxe, bı hewa dıkeve, derdıkeve bılındahiya ezman, dıfıre û dıçe.

Evdal ji dı pey qulıngê xwe da mêze dıke, hetani ku ew dıçe dı ezmanê bê bıni da wunda dıbe.

Institut kurde de Paris

**İbrahim Aksoy**





DENG
Yayınları




Tüm kitabevlerinde
ve temsilciliklerimizde...

**DENG Yayınları**




Tüm kitabevlerinde
ve temsilciliklerimizde...

**DENG Yayınları**

# DENG YAYINLARI

Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer (*Baskısı bitti)*
**Kamuran Ali Bedirxan**

Dersên Zmanê Kurdi (2. Baskı)
**Baran**

Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi
**Rohat**

Dawiya Dehaq
**Kemal Burkay**

Diwana Yekan- Diwana Duduyan Sewra Azadi
**Cigerxwin**

Ferheng (Sözlük) Kürtçe-Türkçe/Türkçe-Kürtçe
**D. İzoli**

Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan
Coğrafya-Tarih-Edebiyat Cilt -1
**Kemal Burkay**

Kürtler 1-2 Cilt (Sosyolojik ve tarihi inceleme)
**Bazil Nikitin**

Ferheng (Sözlük) Zazaca-Türkçe
**Malmisanıj**

Yakılan şiirin Türküsü
**Kemal Burkay**

Azadi û Jiyan-Özgürlük ve Yaşam
**Kemal Burkay**

Diwana Sıseyan Kime Ez- Diwana Çaran Ronak (*Toplatıldı)*
**Cigerxwin**

Em Bınıvisın
Em Bıxwinın -1-
Em Bıxwinın -2-

Jiyana Bextewar
**Ereb Şemo**

Şıvanê Kurd
**Ereb Şemo**

Kürt sorunu barış, demokrasi (*Toplatıldı)*
**Ali Dicleli**

Institut Kurde de Paris

# DENG YAYINLARI

Kürtler (*Toplatıldı*)
**Zahoodi-El Dahoodi**

Berf Fedi Dıke (Şıêr)
**Kemal Burkay**

Seçme yazılar - 1 - (*Toplatıldı*)
**Kemal Burkay**

Gula Çıle
**Ferhad Can**

Seçme Yazılar - 2 -
**Kemal Burkay**

Gülümse Ey Dersin - Cilt - 1 - (*Toplatıldı*)
**Munzur Çem**

PSK 3 ve 4. Kongre Belgeleri (*Toplatıldı*)

Mem û Zîn (*Toplatıldı*)
**Ehmedê Xanî**

Broşür Dizisi (**Gençlik Sorunu**) (*Toplatıldı*)
**Celal Özgür**

Broşür Dizisi (**Kadın Sorunu**) (*Toplatıldı*)
**Kemal Burkay**

Broşür Dizisi (**Sendikal Hareket ve..**) (*Toplatıldı*)
**İbrahim Metin**

Hükümlü Yazılar
**İbrahim Aksoy**

Evdalê Zeynıkê
**Ahmet Aras**

Çarin
**Kemal Burkay**

Broşür Dizisi (**Din ve Siyaset**)
**Kemal Burkay**


Broşür Dizisi (**Alevilik, Kurmanci -Kırmancki....**)
**Munzur Çem**

Broşür Dizisi (**Kırd, Kırmanc, Dımıli veya Zaza Kürtleri**)
**Malmısanıj**

Institut kurde de Paris

# MEM û ZÎN

EHMEDÊ XANÎ



Kürdçeden Türkçeye Çeviren

M. EMİN BOZARSLAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Mezelê Evdal



## AHMET ARAS

Ahmet Aras dı sala 1944'a da lı gundê Qereyazyê Melle Osman hatye dunê. 1970'i da Fakulta Ekonomi qedand. Dı salên 1965-66'a da bı sedemên siyasi hate gırtın.
Pışti 12 Adar a 1971'i da jı ber idara eskeri çû derveyi welat û lı Swêd bı cih bû. Hetani sala 1978'a lı wır mamosteti kır.
Berya 1980'yi demeki dı DISK'e da (Konfederasyona Sendikayên Karkerên Şoreşger) xebıti.
Dı sala 1979'a da lı Izmirê bı cih bû û mala wi nıha lı wıra ye.
Pışti 1980'yi, jı yalê rejima eskeri da carke dın hate gırtın.
Dı kovarên ANT, EMEK, YÜRÜYÜŞ, AZADİ Û RONAHI'da nıvisên wi hatın weşandın.
Jı mêj va lı ser zargotına Kurdi dıxebıte.
Jı wan xebatên wi Destana "Ker û Kulık" û ya "Siyabend û Xecê" dı sala 1993'ya da hatıne çapkırın.
"Ker û Kulık" dı 1995'a da lı Swisê bı zımanê Almani hatiye weşandın.

Institut kurde de Paris

Weşanên DENG

K.L
2